# RIYA ŞOREŞA KURDISTANÊ

Abdullah ÖCALAN

Abdullah ÖCALAN
Riya Şoreşa Kurdistanê (Manîfesto)
Weşanên Komîteya Ziman  û Perwerdeya KCK'ê

Çapa yekemîn: Nîsana  2013
Cihê Çapê: Çapxaneya Azadî

## Naverok:

DESTPÊK ........................................................................ 8

Beşa Yekemîn ................................................................ 21

DÎROKA MÊTİNGERİYÊ û CİVAKA ÇÎNDAR ............................. 21

I– Civata Komînal A Seretayî .............................................. 22

III- Civaka Feodal û Mêtingerî............................................... 27

Di Navbera Her Du Şerên Parvekirinê Yên Emperyalîst De Rewşa Cîhanê ............................................................................... 40

Ji Şerê Emperyalîst ê Duyemîn Heya Roja Me Ya Îro Rewşa Cîhanê........................................................................................... 42

Rewşa Emperyalîzmê: ....................................................... 42

Rewşa Welatên Sosyalîst:................................................... 44

Li Welatên Kapîtalîst Rewşa Tevgera Çîna Karker: ................... 45

Rewşa Mêtingeh û Tevgerên Rizgariya Neteweyî: ................... 46

Di Nav Tevgerên Rizgariya Neteweyî, Çîna Karker û Komînîst De Rewş ................................................................................. 50

Beşa Duyemîn.................................................................. 53

CİVAKA KURDİSTANÊ........................................................ 53

I-Dîroka Mêtigehbûna Kurdistanê.......................................... 54

A)Di Serdema Koledar De Med ............................................. 54

B) Di Serdema Feodal De Kurd û Kurdistan ............................ 56

1-Pêvajoya Hegomonyaya Ereban ........................................ 56

2- Serdema Ku Hegomonyaya Biyanî Zeîf Bûye ....................... 57

3-Di HegomonyayaTirk û Îraniyan De Kurdistan ...................... 60

C-Di Nav Sîstema Emperyalîst De Kurdistan............................ 65

1- Şerê Parvekirinê Yê I. Ê Emperyalîst û Ji Nû Ve Parçekirina Kurdistanê ................................................................................ 65

Mêtingehkirina Kurdistanê Ji Aliyê KomaraTirkiyê Ve ............ 69

Mêtingehkirina Başûrê Kurdistanê......................................... 73

Mêtingehkirina Rojhilata Kurdistanê ..................................... 76

ll-Taybetmendiyên Civaka Bakurê Kurdistanê ........................ 78

Pêkhateya Ekonomîk .............................................................. 78

Pêkhateya (yapı) Civakî ........................................................... 83

Maketa Li KurdistanêYa Burjuwaziya Tirk A Dagirker: ............ 84

Çîna Komprador-Feodal: ........................................................ 85

Burjuwaziya Biçûk a Bajaran: ................................................ 85

Gundîtî:.................................................................................... 86

Proletarya:.............................................................................. 87

Perwerde û Pêkhateya Çandî .................................................. 91

Pêkhateya Neteweyî: ............................................................. 94

Beşa Seyemîn ........................................................................ 103

ŞOREŞA KURDİSTANÊ ........................................................... 103

Mîrateya Dîrokî Ku Şoreşa Kurdistanê Xwe Dispêrê ............ 103

ll-Şert û Mercên Objektîf û Subjektîf Ên Şoreşa Kurdistanê . 105

lll- Taybetmendî, Hedef û Wezîfeyên Şoreşa Kurdistanê ...... 107

lV-Rêbaz û Taktîka Şoreşa Kurdistanê .................................... 110

V- Quwet û Îtifaqên Esasî Yên Şoreşa Kurdistanê .................. 113

Vl-Cihê Şoreşa Kurdistanê Di Şoreşa Rojhilata Navîn û Cîhanê De ..................................................................................... 118

## DESTPÊK

Ji destpêka civaka çîndar heya roja me ya îro du cur rêbazên mêtingeriyê darbasdar in. Ya yekemîn, kedxwariya li ser nirxa zêde ya li ser keda mirov e ku hê di merhaleya xebatê de ji kesan yek bi yek tê dizîn. Ya duyemîn, kedxwariya nirxa zêde ye ku xwe dispêre xespa keda ku gelan bi şiklê amûrên hilberînê, naqît, berhem û wekî serwetê di berdêla keda xwe de dane hev.

Têkoşîna di navbera çînên hakim ku dixwazin van her du şiklên mêtingeriyan pêk bînin û pêş bixin û çîn û gelên ku dixwazin ji van her du şiklên mêtigeriyan rizgar bin de dîroka civaka çînayetiyê pêk aniye. Li gorî şiklê kedxwariya tê bikaranîn, ya yekemîn tenê bi şiklê têkoşîna çînî, ya duyemîn jî bi şiklê têkoşînên ku gel dimeşînin û bi şiklê têkoşîna azadiyê derdikeve meydanê. Di tehlîla dawî de, ji ber ku her du şiklên têkoşînê jî dikare were daxistin asta têkoşîna di navbera xwediyên nirxên kedê û yên ku dixwazin van nirxên kedê xesp bikin de, her yek ji van awayekî têkoşînê ye.

Kedxwariya bi şiklê yekemîn, dibe sedem da ku li ser şexs (takekes) hakîmiyeta çînî ku xwe dispêre zora navxweyî were avakirin; lê mêtingeriya bi şiklê duyemîn, dibe sedem da ku li ser gelan hakîmiyeta biyanî ku xwe dispêre zora ji der ve were avakirin. Armanca esasîya hakîmiyeta çînî, mêtina keda şexs e. Ev, di aliyê ziman û çandî de roleke texrîpkar nalîze. Berevajî, ji bo kombûna nirxa zêde û hewldanên di mijarên wekî zanist, huner, siyaset û hwd. ya beşeke (qisim) diyar de derfet di afirîne û  herwiha civaka ku şexs jî di nav de ye hê jî pêş dixe. Lê belê hakîmiyeta biyanî jî, tenê bi xespkirina nirxên madî yên gelan namîne; hewl dide destkeftên ku gelan di qadên ziman, çand û rêxistinbûnê de bi dest xistine jî ji holê rabike. Dema ku serweta gelan talan dike, ji bo ku berxwedana wan tine bike û wan pasîfîze bike û ji bo ku wan ji dagirkeriya ku wekî talanê lêhatiye bîne rewşa amade û vekirî, neçar e vê bike. Ji ber vê yekê hakîmiyeta biyanî, li ser civaka ku tê pêkanîn roleke jihevbelavkirinê û texrîbkirinê dilîze.

Ya rast, hegomonya (hakîmiyet) navxweyî di civaka ku di nav de derdikeve de pêşketina civakî bilez dike. Yekeyên (birim) şexs pêve girêdayî ku xwe dispêrin têkîliya xwînê yên wekî klan, qebîle, eşîr, malbatê parçe dike û ji bo derketina holê ya yekeyên ku asta rêxistinbûneke hê bilind in ên wekî gel, miliyet, netewe dibe faktoreke alîkar. Di civakên ku ji ber pêşketinên navxweyî, dewlet derketiye holê de yekeyên kuxwe dispêrin têkîliyên xwînê hê zûtir ji holê radibin. Civakên ku têde li şuna girêdana eşîrî, girêdana çînî (sınıfsal) û girêdana hemwelatiyê derketiye holê, di qadên ziman, çand û siyasî de hê jî bihêztir dibin.Tesîra hakîmiyeta navxweyî li ser pêşketina neteweyî û civakî, heya ku şert û mercên civaka çîndar ji holê rabin, ê berdewam bike. Diyardeya dewleta neteweyî ku şiklê herî dawî û herî pêşketî yê hegomonyaya navxweyî ye di dîrokê de roleke pêşver û

lîstiye. Civakên ku xwe gihandine dewletên xwe yên neteweyî, hê hêsan peresana (evrim) xwe ya ber bi civaka bêçîn ve pêk tînin. Civakên nekarîne xwe bigihînin asta dewleta neteweyî jî, berê xwe digihînin diyardeyeke bi vî şiklî û tenê dikarin li ser vê bingehê xwe bigihînin şensa ber bi civaka bê çînayetî ve meşînê. Dema ku şert û mercên madî yên civaka çîndar ji holê radibin, amûra hegomonyayê ya jê re dewlet tê gotin jî ti rola wê namîne. Civakên ku diyardeya siyasî tê de diqede, ji bo ku di navbera hev de di her aliyê de têkîlî pêş bixin dibin xwediyê derfet. Ev, ji bo ku tenê yek civakeke cîhanî çêbe, dibe yek ji gavên destpêkê.

Tevî vê tesîra erênî ya hakîmiyeta navxweyî ya li ser civakîbûn û netewebûnê, hakîmiyeta biyanî bi piranî di her du aliyan de jî tesîreke nerênî dike. Hakîmiyeta biyanî, di aliyê civakî û neteweyî de pêşketina civaka ku li ser tê bikaranîn asteng dike. Hakîmiyeta ji derve ku di aliyê civakî de xwe dispêre civakek asta wê bilindtir, civaka ku xistiye bin kontrola xwe di çarçoveyeke civakî ya paşde mayî de radigire û ji bo pêşketinê derfetê nade wê. Dema ku dide jî, ji bo ku wê civakê di bin hakîmiyeta xwe de ragire dikeve zehmetiyê. Hakîmiyeta biyanî, wekî mînak di aliyê neteweyî de xwe dispêre asta rêxistinbûneke hê bilindtir, li ber pêşketina aliyê neteweyî ya civatên eşîr û gelan ên ku di asteke hê jêr ê rêxistinbûnê de ne astengên cur bi cur datîne. Eger van astengan daneyne, ji bo ku civakeke wekî wê ketiye ser riya pêşketina neteweyî dagir bike derfet kêm dibe.

Hegomonyaya (hakîmiyet) biyanî, timî di civaka ku tê bikaranîn de têkîliyên civakî û neteweyî parçe dike. Pêşketina yekeyên (birim) ku gelekî di seransera dîrokê de di qadên ziman, çand, ax û ekonomîk de pêş xistine û veguherîna diyardeya neteweyê asteng dike û mekanîzmayên cur bi cur ên çewisîner, asîmîlasyonîst û belavkirinê diafirîne û di encam de hewl dide da ku wî gelî tine bike. Di roja me ya îro de ku pêvajoya ji kapîtalîzmê derbasî sosyalîzmê bûyîn tê jiyîn, hegomonyaya biyanî bi şiklekî bê eman gelan di nav mekanîzmaya çewisînê (baskı) de radigire û wekî astenga herî mezin li ber pêşketina wan dibe kelem. Di vê qonaxê de, hegomonên biyanî bi nokerên navxweyî ve bi şiklekî pir baş dibin yek û bi temamî rê li ber çûna ber bi civakek ku têde çewisîna neteweyî û çîndar tineye digirin, û dixwazin da ku gelan di gêrava civaka çîndar de bixeniqînin. Gelên di

van şert û mercan de dijîn, bi dayina şerê herî dirêj û xwînavî yê dîroka xwe, xwe dixwazin rizgar bibin.

Hakîmiyeta navxweyî, di dîrokê de, li gorî civakên ku di nav de pêk hatiye bi şiklê dewleta koledar, feodal û kapîtalîst û wekî varyasyonên cuda yên van şiklên dewletan derdikeve pêşberê me. Her awayê dewletê, eger civaka kevin temsîl bike roleke paşver û dilîze; eger civaka nû jî temsîl bike roleke pêşver û dilîze. Tevî vê, hakîmiyeta biyanî, girêdayî şiklê civaka ku xwe dispêrê, bi şiklê dagirî û talana koledar, feodal, kapîtalîst, îlhaq û dagirkeriya kapîtalîst derdikeve meydanê. Her civaka çîndar, li gorî berjewendiyên xwe yên sosyo-ekonomîk û hêza xwe, pêwîstî pê dibîne da ku xweber bi derve berfireh bike. Eger fetih di aliyê talan û xenîmet bidestxistinê de bûyibin amûreke destdayî, ti xwedan kole, feodal û patron tinene da ku serî li vê amûrê nedin. Her şiklê çewisînê (baskı-zor) yê ji bo derve ne mêtingerî ye. Ji bo ku şiklekî çewisîna ji bo derve bibe mêtingerî, divê ev çewisîn, li ser civaka ku tê pêkanîn çewisîn û kedxwariyê bigihîne asteke bi sazîbûyî û timî. Şiklên çewisînên biyanî yên ku di merhaleya dagirî, îstila û îlhaqê de mayine û jê derbas nebûne ne mêtingerî ne. Armanca diyardeya (olgu) mêtingeriyê ew e ku civaka li ser tê pêkanîn bihelîne, jihev bixe û di encam de an di aliyê fîzîkî de an jî bi rêbaza wekî xwe lê kirinê ji holê rabike. Bi van taybetmendiyên xwe şiklê herî xeternek ê çewisîn û kedxwariya biyanî ye. Eger hem li pêşberê pêşketina civakî, hem li pêşberê pêşketina neteweyî wekî astenga herî mezin mêtingerî hebe, ji bo civakekê wezîfeya acîl tasfiyekirina mêtingeriyê ye.

Diyardeya mêtingeriyê, di her civaka çîndar de, bi taybet di merhaleya emperyalîzmê ku merhaleya dawî ya vê civakê ye de dema xwe ya herî bihêz dijî. Emperyalîzm ji ber ku temsîla paşverûtiyê dike, karektera talanker a paşverûtiyê jî, dibe sedem ku ji neçarî serî li mêtingeriyê bide. Emperyalîzma ku nikare di hundur de hêzên hilberîne pêş bixe û pêşketina hêzên hilberînê asteng dike, ji ber vê yekê jî nikare ku derfetên zêdekirina kedxwariya li ser nirxa zêde peyda bike; ji bo ku hilneweşe û temana xwe dirêj bike, ji pêşxistina mêtingeriyê cudatir nikare ti reyên din peyda bike.

Her civaka çîndar, sîstema çewisînê ya ku pêş xistiye, di vê navê de sîstema mêtingeriyê dewrî civaka ku li pey wê tê dike. Mêtingerî ku şiklê herî giran êv ê çewisîna biyanî û kedxwariyê ye û ji aliyê her civaka çîndar ve tê pêşxistin, bi şiklekî xwezayî, di merhaleya herî dawî

ya civaka çîndar a herî dawî de pêşketina xwe ya herî mezin nîşan dide. Di heman demê de ev mêtingerî, ku dema xwe ya herî bihêz û herî dawî dijî, awayê herî paşverû û herî texribkar e. Êdî di vê qonaxê de xelasbûn û ber bi civaka bêçînayetî ve peresîna gelan, girêdayî bi tasfiyekirina sîstema mêtingeriyê ve ye. Ji ber vê yekê, îro riya ku diçe sosyalîzmê, di têkoşîna gelan a rizgariya neteweyî û demokrasiyê ku li dijî emperyalîzm û mêtingeriyê didin re derbas dibe.

Di seransera dîroka civaka çîndar de, gel, di asta civakî û neteweyî de di şert û mercên newekheviyeke mezin de jiyîne. Şert û mercên civakî yên newekhev ku ji zilm û zora biyanî û kedxwariyê re rê vekiriye, bûye sedem da ku piraniya gelan an bi rêbaza îmhaya fîzîkî an jî bi rêbaza asîmîlasyonê tinebin. Hin gel jî, di asteke diyar a pêşketina xwe de hatin sekinandin û bûne amûra esasî (ham madde) ya hakîmiyeta biyanîya ku li ser wan hakim bû. Di hêjmareke kêm de gel jî, di aliyê civakî û neteweyî de pêş ketin û di roja me ya îro de bûn neteweyên herî bihêz. Gelên ku şêniya wan gihiştibû hejmareke mezin, di destpêka civaka çîndar de ji ber astengên coxrafîk ên derbaskirina wan ne mumkînê ku di navbera civatên mirovan de û ji ber asta pêşketinê ya hêzên hilberînê ya zêde sînordar, ji ber sedemên li jor, bi şiklekî hê kêmbûyî ketin serdema me ya ku êdî civaka çîndar ji holê radibe. Di merhaleya sosyalîzmê ku dema destpêkê ya civaka bêçîn e de, ji bo ku gelên paşde mayî tenê di nav yek civaka cîhanê de bi şiklekî xwezayî bihelin, şert û merca pêşîn ew e ku; di qadên ekonomîk, civakî û çandî de pêşbikevin, di aliyê jiyana neteweyî de bigihên asteke bihêz û dema xwe ya herî kamil. Bêyî ku ev pêvajo were jiyîn, gel, bi şiklê netewe ji holê ranabin. Ji holê rabûna çînan, ji bo ku netewe jî tine bin zemîneke madî ya destdayî diafirîne. Lê ev nabe sedem da ku netewe tavilê bihelin û ji holê rabin. Dibe ku gel û netewe, ji asta ku di civaka çîndar de jiyîne hê zêdetir hebûna xwe di merhaleya sosyalîzm û komînîzmê de berdewam bikin û demên xwe yên herî kamil di van qonaxan de bijîn. Çawa ku di roja me ya îro de têkîlî û girêdayinên eşîrî li pêşberê têkîlî û girêdayinên neteweyî ketine rewşa têkîlî û girêdayinên ku pêwîst e ji holê rabin, wê rojekê di civaka komînîst de jî têkîlî û girêdayinên neteweyî jî li pêşberê rêxistinbûneke raser, (üstün) bikevin rewşeke paşverû û pêwîst bike ku ji holê rabin.

Di civaka çîndar de rê û rêbazên kedxwariyê û fikrên (soyutlama) ku di mijarên wekî kedxwarî, gel, netewe, emperyalîzm û mêtingerî de

li jor hatine pêşxistin, di mijara dîroka Kurd û Kurdistanê de riya ku pêwîst e were şopandin ronî dikin.

Kurd jî, wekî hem û gelan, di dema berbangê ya dîrokê de merhaleya dawî ya civaka komînal a seretayî dijiyan. Di vê merhaleya ku em karibin jê re hovitî jî bêjin de gelek qewmên ji gruba Hind-Ewrûpayê, wekî lehiyekê dest pê kirin ji Bakûrê Ewrûpayê biherikin Asya û Ewrûpaya Navîn. Orjîna Kurdan, dikare bi Medên ku di nav vê gruba qewman de cihê xwe digirtin û di encama koçên salên 1000'î B. Z. de di navbera golên Wan û Ûrmiyeyê de bi cih bûne ve were girêdayîn. Têkîliya di navbera Kurd û Medan de dema ku belavbûna li ser coxrafyayê, ziman û bûyerên dîrokî werin pêşberê hevkirin wekî ku misoger e xuya dike.

B.Z. salên hezarî, salên ku gelên Rojhilata Navîn di bin desthilatiya Aşûriyan de nikaribûn nefes jî bistandana bûn. Di vê demê de eger qewmekî bixwesta pêş bikeve, an wê Aşûrî hilweşandana an jî wê li bendê bimana da ku Aşûrî ji holê rabûna. Reîsên qebîle û eşîrên Medan xwediyê vê zanebûnê bûn. Ji bo wan, li ser cîhanê belavbûn û bûn gelekî, bi jiholêrabûna Aşûriyan ve girêdayî bû. Medan, wekî astengeke duyemîn a li ber pêşketina xwe jî, Persên bi wan re ji heman nijadê bûn didîtin. Surgîna Persan heya Rojhilatê Başûrê Îranê û xwesteka Medan a ji bo rojavayê ku hê zêde berhemdar e bicih bûnê, dihîşt ku xetereya Persan bikeve planê duyemîn. Wê demê diviyabû Aşûriyên ku deriyê rojava digirtin, wekî dijminê sereke bihatana dîtin û li dijî Aşûr şerekî dem dirêj, yê wekî gelekî hebûnê û berxwedanê bihatana dayin. Wiha jî bû. Di pêvajoya navbera salên 1000'î B.Z. û heya salên 612'yên B.Z. ku payîtexta Aşûr hat xirakirin de, Medan îtifaqên cur bi cur pêş xistin û li dijî Aşûriyan şerê pîroz ê hebûnê û ji xwe re cih û war girtinê, wekî şiklekî jiyanê qebûl kirin. Dema ku Aşûr hilweşiya, hema bêje li ser erdên Kurdistana îro ku Medan li ser hikum dikir bi şiklê ku careke din ji dîrokê ranebe gelek derket meydanê.

Gelê ku nû derketiye, bi îxtîmaleke mezin, bi gelên ku pir ji beriya wan li ser van axan bi cih û war bûne re bûn yek û têkil hev bûn, ji wan tesîr bûn û hê zêde li ser wan bi tesîr bûn û ji qebîle û eşîrên destpêkê yên Medan her ku çûyî cuda bûn. Civatên qebîle û eşîrên ku dema xwe ya gelbûnê dijîn, piştî ku dibin gel naşibin orjînên xwe yên destpêkê. Ev, rastiyek ku materyalîzma diyalektîkî fêrî me kirî ye.

Persan, piştî demeke kurt a peşketineke serbixwe, dest pêkirin bi darê zorê, fêlbazî û entrîkayan Med û welatê wan Medyayê dagir bikin. Di dîrokê de salên 550-330'î B. Z. serdema ku împaratoriya Persan a bi nav û deng hikum dikirî bû. Medan, ji ber ku bi Persan ve ji heman nijadî dihatin û ji ber kêrhatinên (yetenek) xwe yên leşkerî, di nav împaratoriyê de wekî gelê mezin ê di rêza duyemîn de hebûna xwe parastin. Bi îxtîmaleke mezin di vê demê de jî, axên ku li ser bi cih û war bûne hê zêde ji bo zîraetê û lawirvaniyê (hayvancılık) vekirin û tevgera ji xwe re kirina war ya van axan domandin. Ziman û çanda gelên ku berê li van deveran bi cih û war bibûn helandin, di ziman û çanda xwe ya Hind-Ewrûpa hakim kirinêde xwe gihandin merheleyeke pêş. Ev demeke wiha bû ku, di van salan de çand û ziman ne bi darê zorê, bi şiklekî xwezayî di nav hev de dihelîn. Hegemonyaya Persan her çendî pêşketina ziman û çanda Medan asteng nedikir jî, lê ji bo ku Med ji xetereyên dema pêş xwe biparêzin, pêşketinên siyasî asteng dikir. Pêşneketina di aliyê siyasî de jî, dibû sedem da ku organîzasyona eşîr û qebîleyan dubare bihêz bibe. Gelek, ji bo ku xwe ji îstilayên derve biparêze pêwîstî pê dibîne ku xwe birêxistin bike. Ev birêxistinbûn, dema veguhere rêxistinbûnên siyasî dibe ku encamên biserkeftî bide. Lê ev paşde vegera li gel Medan a bi şiklê qebîle û eşîr, xetereyên ku tesîrên wan li ser îro jî çêbibin bi xwe re dianî. Lê, Medan, li şuna şiklê rêxistinbûna seretayî ya qebîle û eşîran, bi afirandina şiklê rêxistinbûna konfedarasyona eşîran ku aliyê wê yê siyasî li pêş bû, li pêşberê Aşûr bi ser keftibûn. Ya rast ew e ku, di vê demê de birêxistinbûnên seretayî yên gelê Kurd li dijî îstîla, dagirî û hegemonyaya biyanî nekariye ku xwe bi şiklê siyasî rêxistin bike têkoşînê, bimeşîne û bi ser bikeve. Wekî encameke vê ya xwezayî, şiklê rêxistinî yê eşîrî ji nû ve pêş xistin û xwe kişandin herêmên çiyayî û li van deveran bi cih bûn. Her ku şaristanî pêş ket berê xwe dan vê feraseta serxwebûnê û têkoşînê ku du rûbûn û valabûna wê hatiye fêmkirin. Heta îro jî, ev feraseta (anlayış) dûr û ya serxwebûnê ya malbat, qebîle û eşîrê, pevçûn û xwe lihev rakişandinên ku ev feraset jê re bûye sedem, yek ji astengên herî mezin ê ku li ber Tevgera Rizgariyê Ya Kurdistanê ye.

Di serdema koledar de yên ku welatê Kurdan timî dagir kiribûn û di navbera hev de kiribûn qadeke şer, qewmên Yewnan-Makedon, Ermen, Romî, Part û Sasanî bûn. Di Serdema Seretayî de ji bo ku hêzek karibe împaratoriyeke koledar a herî mezin ava bike, diviyabû riyên

tîcaretê yên di Rojhilata Navîn re derbas dibûn bixistana bin hakîmiyeta xwe. Di vê serdemê de karê destpêkê û girîng ê ku nirxa zêde bikira an jî neçar bû ku bike ev bû. Hem û bêşensiya Kurdan ew bû ku, nikaribûn van riyên tîcaretê yên bi şiklekî çepe-rast di welatê wan re derbas dibûn bixin bin kontrola xwe ya siyasî. Têkîliyên di navbera bakur-başûr, rojhilat-rojava de di ser vî welatî re dihatin çêkirin. Cuda ji vê, Mezopatamya, ku çendek şaristanî bi xwedî kiribûn, di Serdema Seretayî de wekî "bihuşta li ser rûyê erdê" dihate hesibandin, bibû welatê Kurdan. Aşkere ye ku welatekî evqas stratejîk û bi behrem (verimli), eger nikaribe ji aliyê xwedanên xwe ve were parastin wê bi îşgalê re rû bi rû bimîne. Dîsa, aşkere ye ku qadeke wiha berhemdar û stratejîk, her hêza ku nû derdikeve wê dilê xwe bibijinê û  ji ber vê yekê timî bibe qadeke şer. Ev rewş û cihê coxrafîk ji me re pir baş vedibêje kuji ber çi Kurdan nekariye di aliyê siyasî de pêş bikeve; dema yên li çiyê ruhê xwe yê azadiyê parastine ji ber çi li gel yên li deştê teslîmkarî pêş ketiye, ji ber çi wekî gelekî ku nekarîne rêxistinbûna qebîle û eşîrên biçûk derbas bikin mayîne. Li şuna ku di nav şaristaniyên biyanî de wenda bibe û biçe, m ji bo parastina hebûna xwe, jiyana xwe ya seretayî (qebîle û eşîrî) dan berdewamkirin riya yekane ya ku di destê Kurdan de mayî ye.

Ji Serdema Koledar heya sed sala XVI. ku feodalîzma Rojhilata Navîn raseriya (üstünlük) xwe ya li pêşberê kapîtalîzma Rojava wenda kiribû, ev sedemên îşgal, îstîla û şiklên hegemonyaya biyanî yên li Kurdistanê nehatine guherîn. Heya ku sedem neyên guherîn, dîroka Kurd û Kurdistanê ku ji îşgal, îstîla û jiyîna di bin hegemonyaya biyanî decudatir ne tiştekî din e jî, wê zêde neyê guherîn. Tenê ya ku were guherîn ew e ku, wê kîyê bibe talanker, hegemon û mêtingerê nû. Di hêjmareke neyê zanîn de efendî, despot hatine û  çûne; lê dîroka Kurd û Kurdistan e pir kêm hatiye guherîn. Ji ber vê yekê, dema mijar dibe nîqaşa li ser Kurdan, timî Serdema Seretayî bi bîr anîn, divê ecêb neyê dîtin.

Hakîmiyeta biyanî ji ber xwezaya xwe, li bajêr û  deştê tê avakirin. Kurd li dijî bajêr e û  dijminê bajêr e. Pir baş dizane ku bajar cinewirekî şaristaniyê ye û  xwe amade dike da ku Kurdan daqurtîne. Li ber çavê Kurdan maneyê "bajêr" biyanitî û xerîbî ye. Di dîrokê de gelekî din ê ku bi qasî Kurdan ji "bajêr" û  "bajariyan" kişandiye kêm tê dîtin. Heta

îro jî, dişibe hicamek (vantuzek) ku di aliyê nirxên neteweyî, ziman, çand û kedê de Kurd û Kurdîniyê dadiqurtîne.

Kurdistan ê di dema dawî ya Serdema Koletiyê de, ji bo Bîzans û Sasaniyan bibûna qadeke şerê timî ku îstîlaya Ereban ew “rizgar kir”. Lê fetihê nû jî, ji yên kevin ne kêmtir bû. Êdî wekî berdevkê dîneke nû, Ereb, li Rojhilata Navîn qewmê efendîyê nû ye. Ji bo Ereban salên 650-850’yî, bûn salên ku li Rojhilata Navîn herî zêde belavbûn û bi şiklekî bihêz mêtingeriya ku xwe dispart feodalîzmê pêk anîn. Eger kapîtalîzmê di destê Îngîlîzan de wekî amûra belavbûn û mêtingeriyê roleke çiqas mezin lîstibe, feodalîzmê jî di destên Ereban deji Fas’ê heya Hidistan’ê, ji Qefqasya’yê heya Hebeşîstan’ê heman rola belavbûn û mêtingehkirinê lîst. Îslamperestî ku ji îdeolojiyên burjuwaziyê hezar qat hê tevizînker (uyuşturucu) bû, ji bo gelan dihat maneya ketin bin xizmeta hegemonyaya Ereban û înkarkirina ekonomiya xwe ya milî*[1].

Kurd, di serdema feodal de ketin bin hakîmiyeta Ereban. Di vê serdemê de jîhê kêmtir bin îşgal, îstîla û şiklên hegemonyayên biyanî re rû bi rû neman. Di serdema koledariyê de, dîna Zerdeşt qet nebe di aliyê îdeolojîk de bi şiklê xwe yê resen û orjînal mabû û wekî îdeolojiyeke berxwedanê ya gel rol lîstibû. Lêji ber ku bi hatina Ereban dîna “Zerdeştî” ji holê hate rakirin, Kurd di qada manewî de jî bi dagiriyê re rû bi rû man. Îslamê di mejî û dilê Kurdan de wekî“Hespekî Truwa” yê ku înkara milî amade kiriye û ji hundir ve fetihkirina kelê lîstiye. Îslama ku di aliyê fikir û hestan de heya roja me ya îro tesîra xwe daye hîskirin, di destê her hêza ku Kurdistan dagir kiriye de bi heman rolê rabûye. Bi mezhebû terîqetên xwe, di destên feodalên herêmî û biyanî de bûye amûra nuxumandina kedxwariyê, pêşxistina malperestiyê û nirxên milî dan jibîrkirinê; bûye amûra îdeolojîk a herî mezin ku ji Serdema Navîn heya roja me ya îro di nav Kurdan de ruhê berxwedanê dikuje.

Di serdema feodal de “Hespekî Truwa” yê ku wekî Îslamê hatiye xistin nav dîroka Kurdan jî, reîsên eşîran û feodalên ku bûne xaîn in. Ev qerebalixa feodal ku navên wekî “şêx”, “seyîd”, “mîr”, “emîr” li wan

---

[1] (*) *Bi peyva milîya ku tê xwestin were gotin, sazî û nirxên behsa wan tên kirin nirxên Kurdan bi xwe ne.*

dihat kirin ku temsîla hegemonyaya Ereban dikir û ji Ereb û Kurdan dihat pêkanîn, di dîroka Kurdistanê de ji nifşên herî xaîn yek e. Ev qerebelixa feodalan a Kurdistanê ku bi hezaran benikî xwe bi feodalên Ereb ve girêdidin, koletî û xizmeta Ereban ayan-beyan wekî payeyeke şeref û rumetêqebûl dike. Miliyeta xwe înkar dike, lêwekî qewmê necip, yanî qewmê pak Ereban serbilin dike. Ev tebeqaya feodal a hegemon, ku ji destpêka serdema feodal heya roja me ya îro li ber pêşketina gelê Kurd bûye asteng û wekî dawetkarekî ji dil ê dagirkerên ji der ve rol lîstiye, di aliyê milî de sedema civakî ya herî girîng a pêşneketina me ye.

Sed salên X-XVI. merhaleya civaka fodal a stewyayî ye. Di vê dema dîroka Kurdistanê de tevgerên dagirî, îstîla û hegemonîk ên biyaniyan hinekê kêm bûne. Ev dema ku tê de împaratoriya Ebasî ya Ereb zeîf bûye û belav bûye, Bîzans ji ber hevrikiyên navxweyî riziyaye û hê jî eşîrên Oğuz ên Tirk hegemonyayeke siyasî ya bihêz û timî nekariya ava bike, bûye sedem da ku Kurd hinekê bi ser xwe ve werin û nefeseke rehet bistînin. Qismekî feodalên Kurd quweta xwe ya siyasî zêde dikin û hewl didin ku bibin qral. Kapîtalîzmê, ku di merhaleya xwe ya çêbûnê de bû, têkîliyên eşîrî ji hev dixist û pêşketina civakî bilez dikir. Di van salan de girêdayî bi pêşketina civakî ve pêşketina milî jî bilez dibe. Çanda Kurd di wê astê de ye ku dikare di destpêka qonaxê de ozanên wekî Feqiyê Teyran, di dawiyê de jî Ehmedê Xanî û destanên wekî Mem û Zînê biafirîne. Tevî hem û îstîla û dagiriyan, Kurd di riya bûn miliyeteke modern de ne û li Rojhilata Navînti aliyên wan ên ku ji miliyetên din paşde mayîne nîne.

Di sed salên X-XVI. de, ne ku ti quwet derneketine da ku li Kurdistanê hakîmiyeta xwe ava bikin. Bi taybet eşîrên Oğuz ên Tirk ku merhaleya jor a barbartiyê dijiyan û xwediyê pêkhateyeke (yapı) leşkerî bûn, wekî hêza talanker a nû ya Rojhilata Navîn her ku diçe êrîşên xwe zêde dikirin û amadekarî dikirin da ku bibin qewmê efendî. Hê di sed sala XI. de ketibûn Kurdistanê. Lê, nekaribûn li hemberê qebîle û eşîrên Kurdan xwe ragirin. Begên Kurdan jî, di vê qonaxê de xwe gihandibûn zîrveya quweta xwe ya siyasî û leşkerî. Di van sed salan de Kurd û Tirkan nekaribûn ku li beramberê hev raseriya (üstünlük) siyasî ava bikin. Begên Tirkên ku li Kurdistanê hin begitî bi dest xistibûn, piştî bi demeke kurt di nav pêkhateya civakî ya Kurd de heliyane. Kurd, di aliyê civakî de li gorî Tirkan hê pêşdetir bûn. Îstîlayên Moxolan ên ku ji

aliyê Cengîz û Timûr ve hatibûn lidarxistin jî, tevî ku hem û Kurdistan dabûn ber xwe, ji ber ku nekaribûn vê veguhezînin hakîmiyeteke mayînde di demeke kurt de tesîra xwe wenda kirin.

Sed salên XVI-XIX. bûne pêvajoya ku hegemonên biyanî li ser Kurdistanê dûbare bihêz bûne û li beranberê hev ketine nav têkoşîneke giran a hegemonya avakirinê. Li aliyekî Îraniyan, li aliyekî Osmaniyan, bi vê têkoşîna hegomonyayê ku nakokiya mezhebî jî li serzêde kirine, hem wekî welatekî û hem jî wekî gelekî, Kurd û Kurdistan kirine du parçe. Feodalên ku di sed sala XVI. de nekarîne dewleteke feodal a navendî çêbikin û bûne piyonên her du aliyan, ji vê sed salê pêde di qada siyasî û leşkerî de gav bi gav hêza xwe wenda kirine û ber bi roja me ya îro bûne tebeqeyeke ajanên sosyal (civakî)*[2].

Berovajiya vê, eger di sed sala XVI. li cihê ku hev tine bikirana, karîbana dewleteke feodal merkezî ava bikin, wê ne ji dîrokek ku ser bi jêr diçe re, ji dîrokek ku her bi serkeftinê encam dibe re rê vekirana. Dema ku sed sala XIX. bi dawî dibû Kurd heya asta dawîji hêzê hatibûn xistin. Ji ber ku quweta siyasî û leşkerî di destên Îranî û Osmaniyan de kom bibû, rêxistinbûna sexte ya qebîle û eşîran hê jî hatiye pêşxistin. Êdî, ji vê pêde bi riya van rêxistinbûnên li ser esasê sexte û feodal –mînak Alayên Eşîran ên ku Ebdulhemîde II. ava kirine- Kurd bi şiklê bi hev dan qirkirinê rêvebirin lîstokeke zarokan e.

Ji sed sala XIX. pêde li dîroka Kurdan faktora ku rola "Hespê Truwa" yê sêyemîn bilîstana jî, hatiye zêdekirin: leşkertiya mecburî û qanûna vergiyê û li ser vî esasî tebeqeya ku wê hê paşê pêş biketana ya xizmetkar û rewşenbîrên ku înkara netewê dikin –bi taybet di dîroka nêzî me de-. Burukrasiya Osmanî, ji ber vê yekê Kurdistan ê kavil bikira û leşkeriya mecbûrî û qanûna vergiyê bidana qebûlkirin. Seransera sed sala XIX. wê bibûna sed sala serhildanan, lê belê wê bihatana çewisandin (bastırmak). Di sed salên XIX-XX. ku tevgerên rizgariya neteweyî zêde dibûn de, Kurdê nekariyana bi ser xwe ve werin.

---

[2] *(*) Ajanên sosyal: Kes, sazî, tebeqe, çînû hwd. ku ji bo berjewendiya neteweya hakim, li berpêşketina civaka xwe dibe asteng.*

Ji nêviya sed sala XIX. pêde Kapîtalîzm di asta cîhanî de bûye şiklekî hilberînê yê hakim. Dîroka Kurd û Kurdistanê di serdema hegemonyaya kapîtalîzmê de, ji ya kevin ê baştir nebûna. Împaratoriyên Osmanî û Îran ku ji hêzê ketibûn, êdî amadekarî dikirin da ku terka dîka (sahne) dîrokê bikin. Pêşketina kapîtalîzmê ya newekhev, her aliyê cihanê bi şiklekî newekhev bi tesîr dikir û ji ber vê yekê hêzên emperyalîst pêwîstî pê dîtin da ku cîhanê veguherînin qadên hegemonîk. Ti gel, ti welat ê nikarîbûna da kuji bûn mêtingeha kulmeke “neteweya şarezaya Rojava” ku ji aliyê kapîtalîzmê ve hatibûn pêşxistin, xwe rizgar bikirana. Bi kurtahî vê carêjî, ji destpêka sed sala XX. pêde jênerev (kaçınılmaz) bû ku Kurd û Kurdistanê derbeyeke mirinê ji destê mêtingeriya kapîtalîst bixwera. Ti quweta Kurdan a leşkerî û siyasî nebû. Bi rêxistinbûna qebîle û eşîran ku hatibû xistin warê pêlîstokekê, gelê Kurd li hemberê artêşên burjuwa yên modern dikare çi bikira?

Ya rast ew e ku, gelek tiştên bikira hebû. Ji ber ku destpêka sed sala XX. dişibe destpêka sed sala dehemîn. Hegemonyaya Tirk û Îran hema li ber belavbûnê bû. Ew bi xwe, pêvajoya bûn mêtingehên emperyalîzma kapîtalîst dijîn. Dewletên emperyalîst hê jî dagiriyeke vekirî nedane destpêkirin. Pirsgirêk hemû, ji van mercên navdewletî yên destdayî sûd wergirtin, ji bo vê jî li şuna rêxistinbûna eşîrî ku pêşketina siyasî asteng dike, avakirina rêxistinbûnên siyasî yên modern e. Lê, pêkhateya civakî rê nade vê derfetê. Feodalîzma ku di halê xwe de hatiye sekinandin, reîsên eşîran û şêxên feodal ên xizmetkar ku berdevkiya vê feodalîzmê dikirin astengeke mezin bûn. Çîneke burjuwazî û proletaryayê ya modern nebû. Tirkên ku di van mercan de ji nû ve xwe birêxistinkiribûn, rizgariya xwe ya neteweyî bi ser xistin û bi emparyalîstan re jî, careke din Kurdistan razandin li ser masaya amaliyatê.

Parçebûna Kurdistanê ya vê carê, bi şiklekî wiha bû ku wê hem hê zêde encam û hem jî encamên (di aliyê naverok de) hê xirab derxistana meydanê. Kurdên nekarîne ku taybetmendiyeke herî biçûk a pêşver û ya kapîtalîzmê tevlî bunyeya xwe bikin, bi şiklên mêtingeriya kapîtalîst ên herî hovane re rû bi rû dimînin. Hêzên ku bi rêbazên herî xeter û herî zirav ên metîngeriyê jehra Kapîtalîzma ku di merhaleya xwe ya emperyalîst de bûye paşver û li Kurdistanê belav kirine, vê carê bi biryar dan ku bi temamî Kurd û Kurdistanê ji nav rûpelên dîrokê

rakin. Çand û kesayetiya Kurd, ji hezaran sal vir de di qadeke ji bo çanda mirovahiyê herî zêde bi berhem e de pêş ketiye; Ji bo ku ev kesayetî û çand were tinekirin û tebeqeyeke rewşenbîr ku înkara neteweyî dike, di xizmeta hêzên hakim de ye û temsîla civakê dike were afirandîn, eger çi pêwîst bûye ew tê kirin. Di qadên siyasî, leşkerî, ekonomîk û çandî de heya asta dawîher curê hakîmiyetê tê bikaranîn. Nijad ku jîtimî di rojevê de ye. Hêza kar a Kurd wekî ku pênc pere neke bêkar hatiye hiştin. Zarokên ji hembêzê dayikên wan tên girtin, bi asîmilasyonê re r û bi r û tên hiştin û ji keseyatiya neteweya xwe cuda tên mezinkirin. Leşkertiya mecbûrî, di meseleyên namûs, merdî û welatparêziyê de hema bêje zilamê Kurd xesandiye. Jixwe, çînên hakimji sed salan pêde xizmetkarî û koletî anîne warekî fêlbaziya feodal. Ji ber ku li ser hatiye ferzkirin hema bêje ti kesê ku li xwe, li keda xwe, li welatê xwe û li mirovahiyê îxanet nekiriye nemaye. Beşa civakî ya ku hegemonyaya biyanîne kariye rasterast lê tesîr bike, tenê jin mayine. Lê jin jî, ji aliyê civaka çîndar ve hê di destpêka xwe (civaka çîndar) de hatiye kolekirin.

Bi kurtasî, di seransera dîroka civaka çîndar de, ji aliyê qewm û neteweyên cur bi cur ve dagirî, îstîla û mêtingeriya li ser Kurdan hatiye pêşxistin, gelo wê bigihîje armanca xwe ya xwazayî? Yanî, ma Kurdê ji nav rûpelên dîrokê bi misogerî werin rakirin?

Civaka çîndar, emperyalîzma kapîtalîst ku merhaleya herî dawî ya vê civakê ye û mêtingerî, dema xwe ya hilweşînê dijîn. Gel, di roja me ya îro de bêyî ku li mezin û biçûkbûn, li çekdar û bêçekbûna xwe binêrîn li ber xwe didin û digihîjin serkeftinê. Di bin ala sosyalîzma ku wekî sîstemekê kapîtalîzmê derbas dike de, gelek gel nû nû pêş dikevin. Mirovahiya pêşver û ku civaka çîndar qederekê ew paş xistiye, ber bi civaka bêçîn ve dimeşe. Gelekî ku –gelê Kurd- ji rejîmên dagirker ên hem û civakên çîndar re bûye şahid û tevî vê kariye hebûna xwe ya milî, her çendî bi şiklê herî pêşneketî jî be, heya vê merhaleya mirovahiyê bîne nayê tinekirin.

Emperyalîzm û mêtingeriya ku li pêşberê me ye, wê ne ku ji ber xwe hilweşe. Ti rejîmên zilm û zorê di dîrokê de, di demên xwe yên herî paşver û de jî ji ber xwe hilneweşiyane. Bi ser de jî eger em rejîmên zordar ên xwe dispêrin civaka çîndar, ku di roja me ya îro de ji hem û derfetên zanist û teknolojiyê sûd werdigirin û hewl didin bi rêbazên nehatine dîtin ên êşkenceyê jiyana xwe bidomînin li ber çavan

bigirin, wê were dîtin ku ji pêşxistina tevgereke nû ya Medan cudatir ti çareyên me yên din nemane.

Aşûrî, ku dixwestin asteng bikinda ku Medên ku pêşiyên me yên destpêkê bûn wekî gelekî dernenekevin meydanê, nebin xwediyê welatekî û Medan tine bikin, emperyalîstên koledar ên herî hilweşîner (yıkıcı) ên serdemê bûn. Li dijî dijminekî di vê astê de dîn û har bûyî, Medan, xwe wekî gelê “aryen”(ji agir) îlan kirin û biryar dan ku li ber xwe bidin. Eger teslîmiyet qebûl bikirana, wê di cihê ku têde ne tengav bûna û bi îxtîmaleke mezin wê nebûna gelekî. Wekî hesinê di bin çakûçê Kawa de hatiye lêdan, Med jî, li dijî Aşûr di nav şerê 300 salan berdewam kiriye yê wekî gelekî hebûn û ji xwe re warek avakiririnê de bûn ji pola û Aşûr hilweşandin, danîna bingehên çêbûna gelê Kurd bi ser xistin. Medan bi xwe re gelên Rojhilata Navîn jî rizgar kirin û ev rojên xelasbûnê her sal bi navê “Newrozê” bi dadana agiran pîroz kirin. Gelên Rojhilata Navîn hê ev roj ji bîr nekirine û bi dadana agir pîroz dikin.

Li beramberê vê rewşa Medan ku beriya bikevin civaka çîndar dihat xwestin werin tinekirin, Kurd jî îro beriya ku ji civaka çîndar derkevin bi xetereya hatin tinekirinê re rû bi rû ne. Dijmin ji Aşûr ne kêmtir e. Kurdên ku bi qetandina berbanga civaka çîndar gelbûn bi ser xistine, bi kîna li dijî civaka çîndar ku bi êşên mezin ew borandine, wê berbanga civaka çîndar biqetînin û vê carê hebûna xwe ya neteweyî bi şiklekî hê serbixwe û azad, di asteke hê bilindtir de ji nû ve ava bikin. Ev jî bi pêhesîna zanebûna ji gelê “aryen” bûnê û bi dayina şerê pîroz ê serxwebûn û azadiyê, bi kurtasî bi destpêkirina tevgereke Med a nû ku li gorî mercên roja me ya îro ye mumkîne.

## Beşa Yekemîn:

## DÎROKA MÊTİNGERİYÊ û CİVAKA ÇÎNDAR

Tê xwestin ku di şert û mercên giran ên kedxwariyeke ekonomîk a giran de rêxistinbûna civakî ya Kurdistanê ku li ser zilm û zoreke

mezin heye, were belavkirin; li şuna wê bi neteweya hakim ve were yekirin. Ev yeka toreke diyardeyên (olgu) civakî ya kompleks a wiha derdixe meydanê ku pêwîstiya wê bi îzahkirinê heye. Bêyî ku ev diyarde werin aşkerekirin, di mijara rastiya civakî de xwe gihandina nêrînên ber bi çav, li ber ronahiya van nêrînan di riya rizgariya civakî û neteweyî de birêxistinbûn û dest bi têkoşînê kirin ne mumkîn e. Cuda ji vê, bêyî ku were dîtin ku hem û ev diyardeyên civakî di dîrokê de çawa çêbûne, di kîjan merhaleyan re derbas bûne, di navberê de têkîliyên bi çi şiklî çêbûne, bêyî ku were nîşandan da ku ev diyardeyên civakî di roja me ya îro de di encama têkîliyên ber bi çav ên bi kîjan dorhêlên (ortam) biyanî re şikil girtine, ji bo rewşa wan a îro, agahiyeke têrê dike dayin ne mumkîn e. Ev rêbaz dike ku em hê ji nêz ve berê xwe bidin peresana (evrim) civaka mirovahiyê, di vê peresanê de pêşketina mêtingeriyê û têkoşînên serxwebûnê yên li dijî vê pêşketinê; dîsa, neçardike ku li ber ronahiya vê peresanê dîroka me ya welat û gel were lêkolînkirin.

## I– Civata Komînal A Seretayî

Civak, şiklê hebûna mirov e. Diyardeya civakê, ji kêliya ku qirika mirov ji bo derxistina deng hatiye asteke destdayî û mejî gihiştiye qebîliyeta fikirînê pê de dest bi pêkhatinê kiriye. Di destpêkê de dinavbera mirov û curên heywanan ên ku nêzî wan e de zêde cudahî nîne. Tiştê li xwezayê amade dîtiye xwariye, li ser daran û di berqefan de bi şiklekî bê rêxistin jiyaye. Lê qezenckirina qebîliyeta fikirîn û axaftinê, bûye sedem ku di mijarên wekî komkirina tiştên xwerinê, parastina xwe ya li hemberê heywanên din û ji karasatên (afet) xwezayî parastinê de hin amûrên seretayî û hevkariya bi mirovên din rewere pêş xistin. Heya vê qonaxê, hikuma qanûnên peresanê yên biyolojiyê ku di nav heywanan de derbas dibûn berdewam dikirin.

Bi çêbûna şiklê yekemîn ê rêxistinbûna civakî re, di navbera mirovan de qanûnên civakî ketin dewreyê. Ev jî di esasê xwe de qanûna di navbera hêzên hilberînê û têkîliyên hilberînê deye ku dipêvajoya

hilberînê de mirovan bi hev re çêkiriye. Rêxistinbûna civakî ya her pêvajoyê, çarçove û berfirehiya vê rêxistinbûnê, bi pêşketina ku di hêzên hilberînê de derdikeve meydanê re girêdaye. Mirovên di sîstema civata komînal a seretayî de dijiyan, bi komkirinê û nêçîrvaniyê debara xwe dikirin. Kevir û şivên bi vê armancê bi kar anîne, bûn sedem da ku lingên pêş wekî destan pêş bikevin. Ji ber ku nêçîra heywanên mezin û ji heywanên dirende xwe parastin hêza takekes (birey) derbas dikir, bi şiklê civat jiyîn hêsaniyên mezin afirand. Pêwîstiya ji hev fêm kirinê, bû sedem da ku hin dengên ji qirikê derdikevin bi şiklê peyv werin fêrbûn. Bi vî awayî şikla herî seretayî ya zimên derket meydanê.

Ziman û civak yekparetiyeke wisa ye ku, her du jî ji bo hebûnê neçarî hev in û bêyî ku yek hebe jiyîna ya din jîne mumkîn e. Dîroka ziman, bi qasî dîroka civakê kevin e. Pêşketina ziman û li pey hev pêşketina şiklên civakî bi hev re dimeşe. Ziman, ne saziyeke serxan (üst yapı) e, ji bo her civak û ji bo her çîna civakê, amûreke birêxistinbûnêya jêneger e. Hem û diyardeyên civakî, bêyî bikaranîna amûra ziman çawa ku nikarin xwe birêxistin bikin, nikarin bibin rastiyekê jî. Li beranberê vê, cur bi cur bûna diyardeyên civakî û pêşketina diyardeyên civakî dibe sedema dewlemendbûna zimên. Belavkirina civakekê û ew ji bo kedxwariyêanîn warê herî vekirî, bi tinekirin û bêkêrkirina zimanê wê civakê dibe.

Bi ziman re qebiliyeta fikirînê ya mejî jî ji rewşa bûn hêzeke potansiyel derketiye û bûye rastiyekê. Fikir, bêyî hebûna ziman nikare pêk were.

Diyardeyek ku di civata komînal a seretayî de derketiye holê jî ked e. Bi civakîbûnê re parçeyeke girîng ji xebata mirov dibe ked. Ji bo ku xebeta serasera bibe ked, pêwîst e mejî plan çêbike û di çarçoveya vê planê de jî organên laş bikevin nav hewldanê. Dîroka kedê jî, li gel dîroka civakê dest pê kiriye. Xebata kedê ya mirov, bingeha pêşketina civakî ya bi her şiklê pêk tîne. Di maneyekê de, dîroka peresana (evrim) mirov bi dîroka kedê re wekhev e.

Di civata komînal a seratayî de di encama tesîra li ser hev a ziman, fikir û kedê de yekeya (birim) rêxistinbûnê ya civakî ku destpêkê derdikeve meydanê klan e. Yekeya klanê, berhema dorhêleke (ortam) pir sînordar e. Di civatên klanan de hem û endam, bi navginiya têkîliyên xwînê bi hev ve girêdayîbûn û tenê karbeşiyeke li ser esasê cinsiyetê hebû. Civatên klan ku xwe dispartin zewaca komî, ji hev qut

bûn. Ne di nava klanê bi xwe de û ne jî di navbera klanên cuda de derfetên kedxwariyê nebûn. Mirovan, tenê dikarîbûn ku tiştên pê jiyana xwe bidomînin kom bikin. Hê jî asta kedê ya hilberînê negihîştibû asta berhema zêde. Ax, hê nebi bû amûreke (araç-gereç) hilberînê. Li cihekî diyar bicihbûna klanan jî, ne mijara axaftinê bû.

Van taybetmendiyên civaka komînal a seretayî, derfetên li ser hev serdestî çêkirinê yên klanan jî ji holê radikirin. Divê, çêkirina hakîmiyetê, nirxekê bide qezenckirin û sûd û feydeyekê bide. Lêbelê yekeyan (birim) nedikarîn ku berhema zêde kom bikin. Ji bo ku li ser klanan hakîmiyet bihata çêkirin, tenê yek rê dima: bê par hîştina klanan ji amûrên jiyanî. Ji bo vê jî pêwîst bû ku di aliyê fîzîkî de bi temamî ji holê bihatana rakirin. Klanan, ji ber vê yekê ne hakîmiyeta biyanî li ser xwe nas kirin û ne jî li ser klanên din û endamên wan hakîmiyeta xwe çêkirin. Klanek tinekirin mumkun bû, lê ji azadiya wê kirin ti car ne mumkun bû.

Beşeke mezin a civaka komînal a seretayî, bi sîstema hovitiyê borî. Ev serdema ku bi komkirin û neçîrvaniyê tê karekterîzekirin, dema ku şuna amûrên ji kevirên verotî û keritandî hatiye çêkirin girt, bi dawî bû. Pêşketina di amûran de çêbûye di aliyê pêşketina hilberînê de jî tesîra xwe nîşan da. Bi kedîkirina heywanan û çandina şînatiyan re, berhemdariya keda mirov zêde bû. Ekonomiya şivantî û zîraetê ku ketiye şuna ekonomiya komkirinê û nêçîrvaniyê, di dîroka mirovahiyê de tesîreke mezin a şoreşgerî çêkir. Komên mirovan, li pey keriyên hewyanan û li ser axên berhemdar derbasî sîstemeke civakî ya hê pêşketî bûn. Bi hatina gel hev û yekbûna klanan, yekeyên (birim) eşîr û qebîleyên ku hem di aliyê çendanî û hem jî di aliyê çawaniyê de hê cuda û pêşketî bûn çêbûn.

Asteke diyar a di pêşketina amûrên hilberînê de bû sedem ku ji bo rêxistinbûna yekeyên qebîle û eşîran, derfet peyda bin. Ekonomiya şivantî û çandiniyê, li şuna klanan, pêwîstiya bi yekeyên mirovan ên hê berfireh derdixist pêş. Di vê merhaleya ku jê re sîstema barbartiyê ya civata komînal a seretayî tê gotin de jî derfetên kedxwariyê nebûn. Di navbera eşîrên şivan û bi çandiniyê re mijul dibin de, her çiqas kêm be jî, karbeşiyek derketibû holê. Her çiqas di astek ku bi demên borî ve neyê beranberê hev kirin de zêdebûneke hilberîne jî hebû, şêniya zêde dibû derfet nedida ku berhema zêde çêbe.

Ji ber ku yekeyên qebîle û eşîran di nava xwe bi xwe û navbera xwe de ji bo kedxwariyê derfet nas nekirine, di vê qonaxê de jî derfet peyda nebûn da ku di navbera komên mirovan de têkîliyên serdestiyê çêbin. Hê ji ber ku berhemeke zêde ya xwe dispêre axê derneketibû holê, ji bo ku qadên civak lê bi cih dibe were dagirkirin zemîn ne amadebû. Komên mirovan ên zêde dibûn, koçî qadên vala dikir û li wan deran dibûn sedem da ku ekonomiya şivantî û çandiniyê hê jî zêde pêş bikeve. Di vê qonaxê de belavbûn û berfirebûneke bi şiklê, axên vala ji bo hilberîne vekirin hebû ku vê zordestî û kedxwarî nedihewand. Di navbera civatên qebîle û eşîran de serxwebûneke temam hebû. Kes, di vê serdemê de bi şiklekî pir şidiyayî bi civatê ve girêdayî bû û koletî çiye nedizanî. Disa, di vê serdemê de dibe ku yekeyên qebîle û eşîran bihatana tinekirin lê ti car nedikarîbû ku dîl bihatana girtin.

Heya dawiya civata komînal a seretayî, tesbîtkirina belavbûna komên mirovan, di nav dem û cih de hema bêje ne mumkîn e. Hê zêde, di vê serdemê de belavbûn û dîroka grubên nijadan ên mezin ku di encama faktorên coxrafîk de çêbûne, bi xetên xwe yê stûr diyar e.

## II-Civaka Koledar û Mêtingerî

Dema ku pêşketina di hêzên hilberînker (üretici) de, ji bo ku jiyana xwe bidomîne bû sedem ku kesek hê zêdetir berhem bi afirîne, zemîna madî ya çêbûna civaka çînî jî pêş ket. Beşeke biçûk a di nav civakê de, bi rêbazên weke darê zorê, sextekarî û fêlbaziyê hewl da ku berhema zêde ya ku derdikeve holê bi dest bixe.

Ji ber ku di derketina meydanê ya berhema zêde de keda mirov bi roleke diyarker radibe, koledariya ku tê de mirov weke milkekî hatiye lê kirin, bû şiklê civakê yê çîndar yê destpêkê. Tiştê di koledariyê de esas ew e ku, mirov bi temamî weke mal û milk tê dîtîn. Asta dewlemendiya koledarekî, bi hejmara koleyên ku di xizmeta wî de ne dihate pîvan.

Xwediyên koleyan, ji bo ku li ser koleyên xwe çewisîn û dagirî pêk bînin û hejmara koleyên xwe zêde bikin, dewleta ku amûra zorê bû afirandin. Dewlet, ji bo ku kedxwarî were pêkanîn, amûra herî biquweta ku çînên kedxwar xwe dispêrinê ye. Cewhera esas a dewletê, ku bi qilifên cur bi cur ên îdeolojîk tê xemilandin ev e.

Rêxistinbûna eşîrî ya ku di civaka komînal a seretayî de xwe dispart girêdana xwînê, di civaka koledar de ji hev ket. Pêşketina di hêzên hilberînker de ev şiklê rêxistinbûnê weke asteng dît. Civaka çîndar û dewlet, li ser parçeyeke ax ku sînorên wê diyar e xwe bi rêxistin dike. Li ser parçeyeke axa diyar xwe birêxistinkirin, ji bo pêkanîna kedxwariyê şert e. Keda koleyan, hê zêde bi şiklê xwe bi parçeyeke axê ve girêdanê, berhema zêde diafirîne. Mirov, êdî ne bi girêdana xwînê, bi girêdana hemwelatiyê ku li parçeyeke axa diyar hatin girêdanê îfade dike, girêdayî dewletê ye.

Di bin hegomonyaya dewleta koledar de û li ser parçeyeke axa diyar –bi jihevketina rêxistinbûna eşîrî re- mirov derbasî şiklekî nû yê rêxistinbûna ku jêre gel tê gotin bûn.

Di pêvajoya gelbûnê de, tevî ku girêdanên-têkîliyên eşîrî berdewam dikirin, bi riya girêdayina-têkîliya ziman û çanda şîrîk girêdayina- têkiliya ji bo parçeyeke axa diyar jî dest bi pêşketinê kir. Di vê pêvajoyê de, sedemên girîng ên ku şexs bi axêve tên girêdan hene. Bidestpêkirina bikaranîna amûrên metal jî, axa ku ji çandiniyê re hatiye vekirin, bû amûreke girîng a hilberînê. Ax dişibe dayikek ku mirov bixwedî dike. Di navbera kevneşopiyên (gelenek) gelan, ku bêyî van nikare jiyana xwe bidomîne û jiyana bicih û warbûyî de girêdayinên-têkiliyên pir qeyim çêbûne. Dîroka gelan, bi belavbûna li ser parçeyeke axa diyar û ev dever ji xwe re kirine war dest pê kiriye. Dîroka gelek civakên ku di roja me ya îro de bi şiklê netewe birêxistin bûne, di serdema koledariyê de dema li ser axê bi cih bûne û ev dever ji xwe re kirine war dest pê kiriye. Dîroka wan a beriya vê nediyar e.

Axên herî berhemdar ên dinê kirin war, zêdebûna berhemdariya (verimlilik) keda mirov û pir zêde derketina holê ya berhema zêde, bû sedem da ku li hundir koletî pêş bikeve. Ev jî bû bingeha madîya mêtingeriya koledar. Dîroka mêtingeriyê, bi derbasbûna civaka koledar re dest pê kiriye. Çîna xwediyê kole, li şuna ku axên nû ji bo çandiniyê vebike, dest bi fetihkirina axên ku gel li ser bi cih û war bûne û kirine çavkaniyeke hilberînê ya berhemdar kir. Armanca bingehîn a fetihan ew bû ku, kesên azad bike kole û dewlemendiyên di destê wan de talan bike. Mêtingeriya koledar ku di encama fetihan de xwe gihandiye şiklekî bi sazîbûyî, hê bêhtir bû amûra esasîya kolekirina gelan. Derbasbûna koletiyê ya civakekê, li hundir çîndarî kûr kir û ji derve jî kolekirin kir armanca xwe ya esasî. Dewletê, di vê pêvajoyê de roleke

diyarker lîst. Qewmê ku dewlet di nav de çêbûye, bû xwediyêhê zêdetir cih û gelên din hatin xistin bin statûyeke dîlgirtî.

Civaka koledar û mêtingeriya ku xwe dispart vê civakê, bi demê re û li gorî cih berbelav bû; ji dîroka gelan a ku gel herî zêde bi çewisandin û kedxwariyê re rû bi r û mayine ev dem e.

Koledarî ku B.Z. di salên 4000'an de li Mezopatamyaya jêr dest pê kiribû, P.Z. di sedsala IV. de bi parçebûna împaratoriya Romayê re tesîra xwe ya di dîrokê de wenda kir. Awayê hilberînê (üretim tarzı) yê koledar ku di vê pêvajoyê de li Misir, Hindistan, Çîn, hem û Mezopatamya, Anatolî, Yewnanîstan û nîvgiravên Îtalyê, hem û peravên Behra Spî bi cih bibû, her çiqas destpêkê di pêşketina amûrên hilberînê, ziman, çand û zanîstê de bi roleke girîng rabû jî, di pêvajoya belavbûnê de karektereke emperyalîst qezenç kir.

Gelan, pêşketina civaka koledar bi şiklekî bêdeng pêşwazî nekirin. Dîroka koledariyê, di heman demê de ji bo gelan dîroka têkoşînê ya azadiya xwe parastin û pêşî li xirabûna nirxên neteweyî girtinê ye. Beşeke mezin a gelên ku li dijî qewmên talanker şer kirine û hebûna xwe parastine karîne heya bi roja me ya îro werin. Di vê pêvajoyê de piraniya qebîle û eşîrên ku hakîmiyeta koledar nas nekerine û li dijî derketine, xwe sipartine çiyan û di dan domandina jiyana xwe ya serbixwe de bi ser keftine. Têkoşîna ku kole û gelên kole li dijî hegomonên koledar û nokerên bi van re dixebitin dayine, hêza tevger û guherînê ya dîroka serdema seretayî ye.

Împaratoriya Roma ku di merhaleya dawî ya civaka koledar de hatiye avakirin, sîstema çewisînê û kedxwariyê ya ku li ser gelan bisazîbûyî (kurumlaşmış) bû hê jî pêş xistiye û bûye dewleteke mêtinger a bê hempa. Emperyalîzma Romayê, ku hewl dida têkiliyên hilberîna koledar ên ku despêkiribûn li ber pêşketina hêzên hilberîne bibin asteng bi darê zorê li ser piyan bigire, di hundir de ji ber têkoşînên çînî û ji der ve jî di encama têkoşînên azadiyê yên gelan de belav bû û cihê xwe ji şiklê hilberînê yê feodal ku pêşketina hêzên hilberînê hê jî bilez dikirin re berda.

## III- Civaka Feodal û Mêtingerî

Koledarî ku di bingeha xwe de şexs dike mijara mal û milk, di serî de li pêşiya keda mirov, dema li pêşiya hêz û quwetên hilberînê bû asteng, di civakê de di cihê xwe de sekinînek pêşket. Di aliyê dîrokî de neçar bû ku têkîliyên koledar ji holê rabin. Bi rastî jî, dema ku di hundir de ji ber serhildanên koleyan û ji derve serhildanên gelan împaratoriya Romayê hilweşiya, mirovahî ber bi şiklekî civakê yê nû veguherî. Civaka çîndar, vê carê jî li ser esasên feodal xwe birêxistin kir.

Di serdema feodal de axa ku amûra hilberînêya esasî bû, ya begên feodal bû. Şexsê ku bi têkîliyên serfîtiyê bi axê ve girêdayî bû, li ser beşeke amûrên hilberînê xwediyê heqê milkiyetê bû. Ev rewş, dibe sedem ku serf li gorî kole hê zêdetir bi hilberînê re eleqedar be. Di civaka feodal de ekonomiyeke zîraeta (çandinî) xwezayî ku têra xwe bi xwe dike hakim e û di vê pêvajoyê de di hilberîna ku hê zêdetir ji bo ku nirxa bikaranînê biafirîne tê çêkirin de jî, pêşketina têkîliya meta sînordar e.Tevî ku li bajaran zeneatkar di loncayan de xwe birêxistin dikin, têkîliya meta û girêdayî bi vê re jî bajar û tîcarî pêş dikeve, civak hê jî di rewşa xwe ya weke yekeyên (birim) ekonomî yên ku bi derve re têkîliya wan nîne de mayinê didomîne.

Çînên hegomon, di civaka feodal de saziyên çewisînê û kedxwariyê yên ku civaka koledar li ser mirovahiyê pêk anîbûn wergirtin û hê jî pêş xistin. Saziyên nû yên çewisîn û kedxwariyê pêş xistin. Dewleta feodal ku bilez xwe bi rêxistin kir, çawa ku li ser hem û qadên şaristaniyê serdestiya xwe ava kir, şaristanî gihand qadên nû jî. Bakûrê Ewrupa û Ewrûpaya Navîn, di serdema feodal de bûn şaraza (uygar). Dewlet, bû amûra ku ji çêbûn û pêşketina civaka feodal herî zêde sûd wergirtiye.

Di serdema feodal de jî jihevketina rêxistinbûna qebîle û eşîrî, her ku çûyî zêde bû û berdewam kir. Di vê jihevketinê de, rewşa axê ku ax amûra bingehîn a debaraya civakê bû, roleke diyarker û sereke lîst. Tabetmendiyên eşîrî, herçiqas di civaka bicihûwar bûyî de berdewam kir jî, ev têkîlî weke di serdema komînal de ne wekhevîparêz bûn, hê zêdetir ji bo veşartin û nuxumandina kedxwariya feodal dihatin jiyandin.

Dema ku hejmara gelên li ser qadên berhemdar ên cîhanê her ku çûyî zêde bû, bû sedem ku tevgera ji xwe re cih û wargirtinê bigihîje sînorên xwe yên xwezayî. Ev parçeyên axê, ku timî li ser cur bi cur tişt

hilberandine û hejmara xwe zêde kirine, ji bo her gelî bûn welat. Qada ku ziman û çanda gelekî li wir hakim bû –sînorê miliyetê- ji bo sînorên siyasî-neteweyî yên ku piştre pêkbihatana bû bingeh.

Di serdema civaka feodal de, keda mirov li gorî civaka koledar ji axê hê zêde berhema zêde bi dest dixist, hê zêde mirov li ser axê bi cih dibûn û dibûn serf. Ev yek jî, ji bo mêtingeriya feodal bûye bingeha madî. Armanca mêtingeriya feodal ew bû ku; gelên bi cihûwarbûyî bixe bin destê xwe û hilberînkerên azad bike serf. Hê zêde ax û serf, tê maneya kedxwariya hê zêde. Dewlet, di mêtingeriya feodal de jî, amûra ku herî zêde jê sûd tê wergirtin e. Gelê ku mohra xwe li dewletê daye, raser (üstün) û xwediyê heqên cuda ye. Saziyên mêtinger ku li ser pêkhateya hilberînê, ziman û çanda gelên ku dîl hatine girtin hatine avakirin, di peresan û pêşketina gelan de bûne asteng. Ev sazî, di encama peresana navxweyîde pêşketin û bûn quweteke siyasî û çandîya civakê asteng dikin. Dîsa, dibin sedema hatin parastina taybetmendiyên eşîrî û bi afirandina pevçûnên feodal ên kûr, yekbûna gel asteng dikin. Ji bo vê yekê jîhewl têdan ku kulmeke serok eşîr û begê feodal werin kirin noker û bi piranî jî ev kar tê biserxistin.

Pêşketina civaka feodal û kedxwariya ku xwe dispêre vê civakê hema ji ber xwe ve û hêsan nebû. Qebîle û eşîr ji bo ku çewisîna dewletê nas nekin, gel ji bo ku serxwebûna welatê xwe biparêzin, gundiyên azad ji bo ku nebin serf, serf ji bo ku azad bin timî li ber xwe dane. Ev berxwedan, di nermkirina kedxwariya feodal de, di azadmayina eşîran de, ji bo hin gelan di parastina serxwebûna welatê xwe de, bûn xwediyê tesîr.

Serdema hakîmiyeta feodal, di navbera sedsalên V-X. de merhaleya xwe ya avabûnê, di navbera sedsalên X-XV. de merhaleya xwe ya kamilbûnê û di navbera sedsalên XV-XVI. de merhaleya xwe ya hilweşînê jiya (lêbelê, di bin hakîmiyeta emperyalîzma kapîtalîst de temenê feodalîzmê li hin qadan heya dawiya sedsala XX. hat dirêjkirin).

Civaka feodal li ser coxrafyayeke pir berfireh belav bû. Axên ku di serdema koledariyê de ji şaristaniyê re nehatibûn vekirin, di vê serdemê de hatin kirin milk. Temamê Asya û Ewrûpayê, beşeke mezin a Afrîqayê, di serî de bakûrê wê, civaka feodal nas kir.

Salên destpêkê yên vê serdemê, di serî de amûrên hilberînê yên ji hesin û metalên din hatine çêkirin, di pêşketina amûrên hilberîn û

teknîkê de bi roleke girîng rabûn. Weke di hemû merhaleyên dawî yên hem û civakên çîndar de tê dîtin, di merhaleya dawî ya feodalîzmê de jî di hundir de paşverûtî û ji derve jî mêtingerî heya asta herî bilind hat pêşxistin û hat xwestin temena vê şiklê hilberînê jî were dirêjkirin. Bi taybet Rûsyaya Çartiyê, Împaratoriya Osmanî û Împaratoriya Awûsturya-Macarîstan di dîrokê de roleke paşver û lîstin.

Feodalîzm ku li Ewrûpaya Rojava bi têkoşîna şoreşgerî ya burjuwaziyê hatiye tasfiyekirin, di roja me ya îro de li herêmên ku hakîmiyeta emperyalîst û mêtingerî heyî de bi darê zorê tê jiyandin.

### IV-Civaka Kapîtalîst, Mêtingerî û Serxwebûna Neteweyî

Rawesteka herî dawî ya civaka çîndar kapîtalîzm e.

Civaka kapîtalîst ku li ser esasê belav û berfirehbûna ekonomiya meta çêbûye, di nav xwe de du çînên bingehîn dihewîne: Kapîtalîstên ku hem û amûrên hilberînê xesp dikin û ji xwe re dikin sermaye, proletarên ku hêza xwe ya kar bêyî ku bi astengiyekê re rû bi rû bimînin difiroşin.

Kapîtalîzm ku yekeyên ekonomîk ên civaka feodal ên ku girtîbûn û tenê têra xwe dikirin, parçe kir û ji pêşketina ekonomiyeke di asta neteweyî re rê vekir, di serî de di pêşketina amûrên hilberînê, zanist, teknîk û çandê de bi roleke girîng rabû. Burjuwaziya ku li dijî feodalîzmê weke çîneke şoreşger derket meydanê, piştî ku li ser civakê serdestiya xwe çêkir, her tiştê ku li dijî berjewendiyên wê yên çînî bû da ber xwe û tine kir hem û nirxên mirovî, kirin mijara kirîn-firotinê. Di çarçoveya neteweyî de û bi şiklê ku berjewendiyên wê di asteke herî baş de biparêze ekonomî, ziman, çand, pêkhateya siyasî ji nû ve bi rêxistin kir.

Rêjîmên qraltiyê, ku di merhaleya dawî ya civaka feodal de bibûn navendî û dawî li pevçûna timî ya di navbera yekeyên ku civakê bi kaoseke temam re rû bi rû dihêlan anîbûn, dema li ber pêşketina bujuwazî bûn asteng hatin hilweşandin. Burjuwaziya ku îqtîdara siyasî bi dest xistibû û ev ji bo kedxwariya hundir û derve gihandibû astekî kamil, pêşketina civaka çîndar gihand sînorê herî dawî. Piştî kapîtalîzmê, afirandina şiklekî hilberînê yê ku civaka çîndar bidomîne û pêş bixene mumkîn e.

Divê, civaka kapîtalîst û mêtingeriya ku xwe dispêre vê civakê, ji ber taybetmendiyên xwe yên cuda cuda bi şiklê du pêvajoyên cuda were lêkolîn kirin.

**Pêvajoya Danehevê Ya Sermayeya Seretayî û Mêtingerî**

Zeneatkariya ku civaka feodal di rêxistinbûna loncayan de pêşketina wê asteng kiribû, dema ku berê bi şiklê sanayiya malan û paşê jî bi şiklê manîfaktor ji bo pêşxistina kapîtalîzmê ji nû ve hat bi rêxîstinkirin, hilberîna metayê pêş ket. Pere, ku di ekonomiya feodal de kêm pêwîstî pê dihat dîtin, ji bo ekonomiya kapîtalîst naverokeke her tê bikaranîn û destjênabe (vazgeçilmez) qezenc kir. Dema ku ji bo tacirên faîzxwur hêrsa bi destxistina pere û zêr û zîv, ku çavkaniya van pereyan e, li gel firotina metayên ku hê erzantir tên bidestxistin bû yek zêr û zîvê ku piraniya wê bi darê zorê dihat bidestxistin herikî Rojavayê Ewrûpayê, pêşketin û berbelavbûna hilberîna kapîtalîst bilez bû.

Burjuwaziya ku di hundir de jin û zarok jî di nav de girseyeke mezin di manîfaktoran de li yek kom kir û heya bi heyjde saetan da xebitandin, di aliyê amûrên (araç-gereç) hilberînê kirin sermaye û quweta karkirinê kirin meta de serkeftineke mezin bi dest xist. Her ku çûyî tesîra xwe ya li ser civak û dewletê zêde kir, ji bo ku karê (feyde) herî zêde bi dest bixe her amûr ceriband. Ji van amûran a herî kêrhatî jî mêtingerî bû.

Derketina holê ya hilberîna kapîtalîst, weke goşt û neynûk bi mêtingeriya ku pêş xistiye ve girêdayi ye. Kifşên ku hê di sedsala XV. de destpêkiribûn, aliyê belavbûnê yê mêtingeriya kapîtalîst jî derxist meydanê. Ji bo burjuwaziya Rojawaya Ewrûpayê ku xwe sipartiye bingeheke ekonomîk a hê pêşketî û hêzeke dewletê ya ku li ser vê bingeha bi çekên nû hatiye xemilandin, hezeke din a ku wê ji vegirtina cîhanê sar bike û jê re bibe asteng nebû.

Ji bo pêşketina mêtingeriya kapîtalîst, şert û merc heya asta dawiyê destdayî bûn. Li aliyekî gelên ku di serdema koledarî û hegomonyaya feodal de ji azweriya (tutku) azadiyê hatine dûrxistin û ji bo çewisîn (baskı) û kedxwariyê hatibûn amadekirin, li aliyê din bingeheke ekonomîk ku metayên erzan hildibirîne û burjuwaziyek ku xwe dispêre arteşek ku li ser vê bingehê pêş dikeve, hebûn.

Mêtingeriya dema derketina kapîtalîzmê, xwe dispêre pêwîstiyên wê demê. Bilezbûna ekonomiya pereyan, hê zêde taleba zêr û zîv texrîk kiriye û hilberîna meta ku pêş diket pêwîstiya bi madeyê xav (ham madde) zêde kir. Dîsa, ji bo çiftlikên mezin ên ku li parzemîna Emerîkaya ku nû hatibû kifşkirin, keda koleyan bû tiştekî destjê nayê berdan. Di vê rewşê de, tekdestên tekel) tîcaretê ku malbatên mezin ên Ewrûpayê ew ava kiribûn, li çar aliyên cîhanê xwe bi cih kirin. Tekdestan, bi temamî bi rêbazên dagirkeriyê yên wekî îstîla û nijadkujiyê, kole, zêr, zîv, madeyên xav û hwd çi peyda kirin talan kirin. Di talanê de pevguherîna li pêşberê hev pir kêm rol lîst. Di vê pêvajoyê de, berxwedana gelan bi komkujiyeke temam hat çewisandin. Fetihkarên kapîtalîst, mirov û civaka parzemînên Amerîka, Afrîka û Awûstûralyayê ku rêxistinbûna konfederasyona eşîrî derbas nekiribûn an tine kirin an jî bi temamî ji kesayetiya wan dûr xistin û ji dîrokê rakirin. Li ser gelên ku hatine merhaleya civaka çîndar jî, bingehên ekonomîk û leşkerî yên rêveberiya mêtingehê danîn. Serdema gelên cîhanê yapêkhateya xwe ya civakî bi şiklekî serbixwe pêşxistin û pêşde birinê, ji serdema li kapîtalîzma Ewrûpayê hatin girêdan û hatin avêtine derveyê dîrokêre an jî ji mêtingehbûnê re cihê xwe berda. Êdî ji bo gelên cîhanêji bo demeke dirêj ji kapîtalîzmê re bûn zemîn cûdatir reyeke din nebû.

Kapîtalîzmê di vêpêvajoyê de, li cihên ku çûye wê derê, çawa ku peresana (evrim) şiklên hilberînên ji beriya xwe asteng kiriye û xwestiye bide sekinandin, herwiha jî ji bo ku şiklê hilberîna xwe bi cih bike neket nav ti hewldanan. Civakên ku bi pêvajoya mêtingehbûnê re rû bi rû hiştiye, weke bûyî bi halê wan berda. Heta ekonomiyên wan civakên ku têra wan dikirin xist bin tesîra xwe, hevsengiya (denge) di navbera zeneatkariya li bajêr û yekeyên zîraetê yên li gundan xirab kir, ji metayên erzan ên ku hilberandiye bazar tijî kir û bi vî şiklî zeneatkariya bajaran hilweşand. Bi vê riyê ekonomiyên ku li kapîtalîzma Ewrûpayê hatine girêdayin, neçar hatin hiştin ku madeyên xav û berhemen çandiniyê yên din biafirînin û temena şiklên hilberînê yên beriya ji kapîtalîzmê hat dirêjkirin.

Tekdestên (tekel) tîcaretê ku firotina metayan rasterast bi rêve dibirin, di vê pêvajoyê de derfet nedan da ku çîneke burjuwa ya komprador, weke xeleka navgîniyê çêbibe. Hê zêdetir hin feodal û serok eşîr, di pêşberê diyariyên biçûk de hatin kirîn û hatin kirin xeleka

navgînî (piştre van hêzan wê rola ajanên mêtingeran bigirtana ser xwe û tebeqeyeke noker û xaîn pêk anîbana).

Mêtingerî ku di pêvajoya daneheva sermayeya seretayî de hê bêhtir di qada ekonomî û bi awayeke sînordar jî di qada çandî û leşkerî de hatibû pêşxistin, di pêvajoyeke amadekariyê re derbas bû û pêşketina xwe ya bingehîn jî wê di merhaleyên dahatuyê yên kapîtalîzmê de nîşan bida.

Kombûna sermayeyê ku ji ber di kedxwariya bêrehm a hundir de li ser kedê hatiye avakirin û talana li ser gelanpir mezin bibû, di nîviya dawî ya sed sala XVII. de bi şoreşa sanayiyê bi dawî bû. Dema ku kapîtalîzma sanayiyê bû sereke, kapîtalîzma tîcaretê ket asta duyemîn.

## Mêtingerî û Pêvajoya Kapîtalîzmê Ya Rekabeta Serbest

Hilberîna manîfaktorê ku xwe dispart keda dest, bi karanîna mekîneyan re cihê xwe ji hilberîna febrîkayê re berda.Weke çavkaniyeke nû ya enerjiyê hilm bikaranîn û mekîne pê xebitandin, hilberîna metayêhem zêde erzan kir û hem jî kir hilberîneke girseyî. Burjuwaziya ku şoreşa sanayiyê pêk anîbû, feodalîzma ku tenê di qada siyasî de tesîra xwe di nav civakê de didomand bi şoreşan ji dewletê dûr xist û bû yekane hêza hakima civakê. Burjuwazî, ku di têkoşîna li dijî feodalîzmê de alîkariya karker û gundiyan girtibû, piştî ku amûra dewletê bi dest xwe xist, êdî ji bo pêşketina xwe ya bêdawî ev amûra çewisînê bi kar anî. Sînorên feodal ji holê rakir û bi şiklekî azad pêşketina civaka metayê pêk anî. Di çêbûna ziman, çand û dîroka neteweyî de rola sereke lîst. Di qada siyasî de bi pêkanîna dewleta neteweyî, netewebûn temam kir. Dîsa di pêşketina zanist û teknolojiyê de, serkeftinek ku heya wê rojê nehatiyê dîtin çêkir.

Lê ev pêşketinên erênî ku burjuwazî pêk anîbûn, ti car li mêtingehan nehatin bikaranîn. Ji hem û nîmetên kapîtalîzmê kulmeke neteweyên “şaraza”(uygar) yên Ewrûpayê sûd wergirtin. Di pêvajoya rekabetkar de, civakên ku di encama dînamîkên navxweyî de kapîtalîzm pêş xistine bi xwe re netewebûn çêkirin, lêbelê ji ber mercên çewisîn û kedxwariyê ku her diçe hê jî zêde dibû, mêtingeh, ji taybetmendiyên xwe yên neteweyî her ku çûyî hatine dûrxistin.

Mêtingeriya pêvajoya kapîtalîzma rekabeta serbest, li gorî pêdiviyên vê pêvajoyê pêş ket. Zêde hilberîna metayê pêwîstî bi hê

zêde madeyê xav û sûkan didît. Vê rewşê neçar hişt ku li mêtingehan, li şuna xesp û talana vekirî û eşkere, sîstemeke ekonomîk ku rêgeza (ilke) pevguherîna serbest têde hakime û xwe dispêre hilgirtina (taşima) tiştên zîraî û madenan were avakirin. Civakên ku bi temamî hatin kirin yedekên kapîtalizmê, bi şiklekî yek alî û girêdayî ji der ve çewt hatin pêşxistin, serxwebûna xwe ya ji hundir ve wenda kirin û bûn pêyk (uydu). Di van civakan de, beşên nêzî çanda Ewrûpa û ji bo ajanbûnê destdayî, di çarçoveya pevguherîna serbest de weke quwetên navgîn (aracı) lêhatin kirin û weke çîneke burjuwa ya komprador a herêmî hatin pêşxistin. Ev tebeqaya ku ji aliyê kapîtalîzma Ewrûpayê ve hatiyê pêkanîn, ji bo ku bi şiklekî herî hilweşîner tesîra kapîtalîzmêli ser mêtingehan çêbibe bi rola ajantiyê rabû û li ber berxwedana neteweyî bû astengeke girîng. Ji nav begên feodal û serok eşîran bi zêdebûnê hin derdor û faktor jî, tevlî vê tebeqeyê bûn.

Kapitalîzma Ewrûpayê ku dabû pey feydeyê, herî zêde li mêtingehan ev derfet peyda kir. Ev rewşa mêtingehan a bûn çavkaniya feydeya zêde, sedema esasî ya çewisîn û kedxwariya ku her diçe li ser mêtingehanzêde dibeye. Mêtingeriya di pêvajoya daneheva seretayî de di qada ekonomîk û leşkerî de hatiye pêşxistin, di vê pêvajoyê de li ser bingeheke çandî, civakî û leşkerî hate rûnîşkandin û weke sîstemekê hat dîzaynkirin.

Gelên ku pêşketinên wan ên siyasî sînordar, hatin kirin mêtingeh û împaratoriyên feodal ên bihêz jîhatin kirin nîv-mêtingeh. Îxraca metayê hat gihandin deverên herî dûr ên cîhanê û herwiha sûkeke cîhanî hat pêkanîn. Bi vî şiklî, dîroka gelan weke dîrokek ku bi hezar tayê bi kapîtalîzma Ewrûpayê ve girêdayî û li jiyanên xwe yên neteweyî biyanî ye hat kirin. Dest pê kir li çend navendên Ewrûpayê siyaseta cîhanê were çêkirin û were manîpulekirin.

Di bin mêtingeriya vê pêvajoya kapîtalîzma ku seransera sed sala XIX. de pêşketî, rewşa aram û bi halê xwe mayî ya civakên mêtingehan berdewam kir. Têkiliyên feodal, wekî bûyî, bi halê xwe hatin hiştin. Li cîhanê, hema bêje hem û qadên ku karibe werin mêtingehkirin hatin fetihkirin. Mêtingeriya ku bi firehî hatiye temam kirin, hewl hat dan da ku bi kûranî jî were pêşxistin. Berxwedana civakên ku bi eşîr, gel û dewletê dihatin temsîlkirin hat çewisandin û serdema zerîn a rejîmên mêtingehên klasîk hat avakirin. Mêtingehên ku di nav tarîtiyeke mezin de hatine hiştin, karê xwe yê têrkirina

kapîtalîzma çilek (obur) domandin. Berxwedanên ku tevî vê rewşê pêş ketine, di lîberalîzebûn û nermbûna rejîmên mêtingehan de bi tesîr bûn.

Wexta ku li beşeke mezin a cîhanê rewş bi vî şiklî pêş diket, li Rojhilatê Ewrûpayê, bi şiklekî sînordar jî be di civakên ku kapîtalîzm bi dînamîkên navxweyî pêşketiye de, rewş hê cudatir pêş ket. Împaratoriyên xanedaniyê yên ku berêli dijî îstîlayê li van deveran hatine avakirin, li ber pêşketina kapîtalîzma neteweyî bûn asteng. Burjuwaziyên tîcarî yên neteweyî, ji bo ku li ser sûkên xwe serdestiya xwe çêbikin û berê xwe bidin kapîtalîzma senayiyê, avakirina dewletên xwe yên neteweyî weke neçarî dîtin. Ev nakokiya ku bû sedem di navbera burjuwayên hakim û bindest de şerekî bazarê derkeve, tevî ku pirsgirêka neteweyî bi temamî çareser nekir jî hin serkeftin bidest xwe xistin.

Diyardeyeke (olgu) din a giring ku di pêvajoya kapîtalîzma rêkabeta serbest de derketiye meydanê jî, çîna karker pêş ket û xwe gihand doktrîneke zanistî. Sosyalîzma zanistî ku ji aliyê K. Marks û F. Engels ve weke paradîgmayeke bi sîstem hat sererastkirin, sentezeke herî li pêş a aliyên erênî yên çanda mirovahiyê yên heya wê rojê hatiye pêşxistin e. Ev doktrîn ku çavkaniya kedxwariyê ya civaka kapîtalist derxistiye meydanê, bi meşîna li ser vê reçê çavkaniya kedxwariyê ya hem û civakên çîndar derxistiye holê û neçarbûna sosyalîzmê îsbat kiriye, ji bo rizgarbûna çîna karker û gelên cîhanê rê nîşandêreke çalakiyê ya bi quwet e. Kapîtalîzma rekabeta serbest ku pirsgirêkên wekî mêtingeh kirina hem û cîhanê, li rojava û rojhilatê Ewrûpayê pirsgirêkên neteweyî yên nehatine çareserkirin û tevgera çîna karker ku bibû xwediyê doktorîna sosyalîst li pey xwe hişt, cihê xwe terkî emperyalîzmê kir.

## Emperyalîzm, Mêtingerî û Serxwebûna Neteweyî

Merhaleya emperyalîst a kapîtalîzmê, xwe dispêre esasên li ser hev kombûna hilberînê û zêde zêdebûna sermayeyê. Di encama ku makîneyên modern bi çavkaniya enerjiyên nû yên weke elektrîk û petrolê hatin xebitandin de, dest pê kir di mîqtarên hê mezin de hilberîn were kirin. Hilberîna di mîqtarên mezin de û tekdest (tekel), bingeha ekonomîk a emperyalîzmê ye. Li ser vê esasê emperyalîzma ku li pey feydeya herî zêdebû, nakokiyên civaka kapîtalîst gihand asta herî bilind. Sermaye ku di hundir de ji bo bidestxistina feydeya herî zêde

kedxwariyeke nehatiye dîtin pêk di anî, ji der ve jî bi vê armancê polîtîkaya xwe ya dagirkeriyê gihand asta herî bilind.

Dagirkeriya emperyalîst, li gorî pêdivêyên vê merhaleya kapîtalîzmê şikil girt. Di vê pêvajoya ku hilberîna metayê gihiştibû astên bilind û di dest de sermayeyeke zêde zêde kom bibû de hin pirsgirêkên esasî yên kapîtalîzmê hebûn. Ji bo ku sermayeya heyî li qadên ku herî zêde feydeyê tînîn werin razandin, qad hewce bûn; ji bo ku meta werin firotin jî, bazar û madeyên xav (ham madde) hewce bûn. Qada çareseriyê ya her sê pirsgirêkan jî mêtingeh in. Ev rewş nîşanî me dide ku emperyalîzmê ji ber çi polîtîkaya xwe ya dagirkeriyê gihandiye asta herî bilind.

Dema her ku diçe îxraca metayê zêde bû, îxraca sermayeyê ji dawiya sed sala XIX. û destpêka sed sala XX'an pêde herikî mêtingehan. Hê bêhtir sermayeya ku li qadên kansazî (madencilik), riyên trênê û berhemên zîraî dihatin bidestxistin hatiye razandin, rewşa di halê xwe de sekînî ya li mêtigehan bi dawî kir. Her çiqas sînordar jî be, pêşketina kapîtalîzmê li mêtîngehan liv û tevgereke girîng derxist meydanê. Li gel pêşketina burjuwaziya komprador, burjuwaziya sanayiyê (sanayi) ya noker* ku hinekê bi hilberînê re jî mijul dibû pêş ket. Ev burjuwaziya ku bi tekdestên emperyalîst re bi şiklekî şîrîk dixebitî, xwest li gorî burjuwaziya komprador li ser çavkaniyên welêt hê zêde bibe xwediyê heq. Li ser axê, di tîcaretahundir de, di hin qadên senayiyê yên pir sînordar de burjuwaziyekî neteweyî çêbû. Çîna modern a din ku hem di aliyê hejmar de û hem jî di aliyê cewher de ji burjuwaziya nû hê pêşketîtir bû û di kargehên (işletme) emperyalîst de derketibû jî proletarya bû. Ev pêşketinên ekonomîk û civakî yên li mêtingehan, li dijî emperyalîzm û dagirkeriyê şert û mercên objektîfên têkoşîna rizgariya neteweyîpêk anîne.

Pêşketina bê tewazin akapîtalîzmê li gorî şert û mercên ber bi çav ên her welatî, zêdebûna nakokiyan heya bi astên herî li pêş, nehîştina tenê yek qadeke nehatiye dagirkirin li cihanê, neçariya parvekirina ji nû ve ya mêtingehan li gorî asta hêzê, mirovahî bi şerekî giştî re rû bi rû hişt. Şerê Parvekirinê yê Emperyalîst Yê Yekemîn li xwe mukurhatina kapîtalîzmê bû ku, bêyî ku hem û mirovahîyê bibe mirinê wê nikaribe ji krîza ketiye nav de xwe xelas bike.

Şerê Parvekirinê yê Emperyalîst Yê Yekemîn ku bibû sedema mirina ji 10 milyonî zêdetir mirov, seqet mayina ji 30 milyonî zêdetir

mirov û bi şiklekî komî ji têkçûna amûrên hilberînê, çawa ku kapîtalîzm ji nakokiyên wê rizgar nekir, ew bir ber sikratê, ew bir serdema şoreşên proletaryayê. Şoreşa Cotmehê ku li Rûsyaya ku xeleka herî zeîf a sîstema emperyalîst bû pêş ketibû, bû destpêkirina şoreşên proletaryaye yên cîhan û tevgerên rizgariya neteweyî ya gelên bindest .

Şoreşa Cotmehê Ya Mezin û Girîngiya Wê Ya Navneteweyî û Navdewletî

Şoreşa Cotmehê, kevirê esasî yê şoreşên proletarya û rizgariya neteweyîye ku têkbirina têkiliyên hilberîna kapîtalîst ên ku li ber pêşketina quwetên hilberînê û gelên mêtingehan bibû asteng, ji xwe re kiribû hedef. Ev şoreş, ji bo ku li Rûsyayê sosyalîzm were avakirin tenê bi bingehên pêwîst avakirinê nemaye, di asta cîhanî de di pêşketinên ku ji vê dîrokê bi şun de çêbûne de roleke diyarker lîstiye.

Dikare girîngiya naveteweyî û navdewletî ya Şoreşa Cotmehê bi vî şiklî were rêzkirin:

Ya yekemîn, serdemeke nû, serdema şoreşên proletaryayê vebûye. Tevî ku, şoreşên beriya vê li şûna çîneke kedxwar çîneke kedxwar ê cuda bi cih dikir, Şoreşa Cotmehê sosyalîzma ku merhaleya derbasbûnê ya civaka bêçîn bû pêş xistiye.

Ya duyemîn, ji bo ku pêla şoreşê ya li Rojava xwe bigihîne Rojhilat, rola pirê lîstiye û bûye sedem da ku li mêtingehan şoreş pêş bikevin û di van şoreşên mêtingehan de proletarya hakîmiyeta xwe ava bike.

Ya seyemîn, li beranberê îtifaqa dij-şoreşgeriyê yadi navbera emperyalîzm, feodal û burjuwaziyên noker de bûye bingeha îtifaqa şoreşgerî ya di navbera welatên sosyalîst, tevgerên çîna karker û rizgariya neteweyî de.

Ya çaremîn, girêdayî bi van her sê faktoran re, li beranberê cepheyê neteweyî yê sexte ku ji aliyê hêzên hevkarên emperyalîzmê yên nîv-feodal, nîv-burjuwa yên li mêtingeh û nîv-mêtingehan ve hatibû çêkirin, di afirandina cepheya neteweyî ya rastîn ku ji aliyê proletar, gunditî û rewşenbîran ve hatibû pêkanîn de bûye faktoreke diyarker (belirleyici).

Di van pêşketinên ku taybetmendiyên sereke yên serdema me ne de, tesîra Şoreşa Cotmehê hebû û heya ku şoreşa cîhanê were temamkirin wê hebe jî (*)[3].

Eger ji bo burjuwaziyê çi maneya û wateya şoreşa Fransî hebe, Şoreşa Cotmehê jî ji bo proletarya û gelên mêtingehan tê wê wateyê. Tevî ku şoreşên burjuwaziyê ji bilî çewisîn û kedxwariyê tiştekî din nedaye mêtingehan, Şoreşa Proletar a Cotmehê, serdema şoreşên mêtingehan vekir.

Stalîn, tesîra li ser mêtingehan a Şoreşa Cotmehê bi vî şiklî şîrove dike:

"Şoreşa Cotmehê", tenê bi hêjandina emperyalîzmêli navendên wê yên hakîmiyetê û li metropolan teng nema. Hewl da ku hakîmiyet û hegomonyaya emperyalîzmê ya li welatên mêtingeh û di bin tesîrê de ne hilweşîne û bi vê jî, li mewziyên parastî yên emperyalîzmê, yanî li herêmên li hewirdora emperyalîzmêne jî da.

Şoreşa Cotmehê, bi têkbirina xwediyên erdê yên mezin û kapîtalîstan, zincîrên zilm û çewisînê yên neteweyî û mêtingehî şikênandin; bê îstîsna hem û gelên bindest ên li dewleteke mezin, ji vê zordarî û çewisînê rizgar kirin. Proletarya, bêyî ku gelên bindest rizgar bike nikare xwe xelas bike. Taybetmendiya cuda ya Şoreşa Cotmehê ji şoreşên din, ew e ku; ev şoreşên neteweyî yên mêtingehî yên li YKSS'ê (Yekîtiya Komara Sovyet A Sosyalîst SSCB), ne di bin ala dijminatiya neteweyî û xwe li hev rakişandina navdewletî de û ne bi navê miliyetgeriyê, lê di bin ala baweriya bi hev û nêzîkbûneke biratî ya miliyet, karker û gundiyên ku li YKSS'ê dijiyan û bi navê enternasyonalîzmê berfireh û giştî kirine.

Şoreşên netêweyî û mêtingehî, ji ber ku bi rêveberiya proletarya û di bin ala enternasyonalîzmê de hatine pêkanîn -li welatê me ev nebûye-, gelên parya, gelên kolê vayê ji ber vê sedemê, bi mînakên ku pêş xistine hem û gelên bindest ên cîhanê ber bi xwe ve kişandine, cara yekemîn di dîroka mirovahiyê de, xwe gihandine rewşa gelên bi rastî jî azad û wekhev.

---

3 *(*) Bernameya PKK'ê, rûpel 4-5*

Ev tê mane û wateya ku; Şoreşa Cotmehê, bi îtifaqa li gel proletaryayê, bi rêveberiya proletaryayê, li welatên bin dest ên cîhanê, serdemeke nû, serdema şoreşên mêtingehan daye destpêkirin.

Berê'asayî' bû ku bi vî şiklîwere fikirîn:"ji serdemên pir kevin pêde cîhan bi vî şiklî dabeş bûye; nijadên rajêr (aşağı) û raser (üstün) hene, ku yên rajêr qebiliyeta wan a şaristaniyê nîne û ji bo bindestiyê û kedxwariyêne. Xwediyên şaristaniyêyên yekane nijadên raser ê sipî ye û ev, bi mêtingerî û kedxwariya li ser nijadên rajêr ên reşik hatine wezîfedarkirin." Niha, ev çîrok hatiye redkirin û ji holê hatiye rakirin. Yek ji encamên herî girîng ê Şoreşa Cotmehê jî ev e; ji gelên rizgarbûyîyên ne Ewrûpayî ku ketine riya pêşketina Sovyetîk re hatiye nîşandayin ku ew bi rastî jî di aliyêçand û şaristanî pêşxistinê de ji gelên Ewrûpayî ne kêmtir xwediyê qebiliyet in û bi vê, derbeyeke mirinê li vê çîrokê hatiye dayin.

Berê 'asayî' bû ku bi vî şiklî were fikirîn:"ji bo gelên bindest riya xelasiyê ya yekane ew e ku, divêbi rê û rêbaza neteweperestiya burjuwa, bi rê û rêbaza sarbûna ji hev a neteweyan, bi rê û rêbaza ji hev cudabûnê têkoşîn were dayin û dijminahiya neteweyî ya di navbera girseyên kedkarên neteweyên cur bi cur were xurt kirin. Niha, ev çîrok derewîn hatiyê derxistin. Ji encamên girîng ên Şoreşa Cotmehê yek jî, nîşan daye ku; riya xelasiyê ya gelên bindest a proletar û enternasyonal, riya rast a yekane ku bi rastî jî pêkanîna wê mumkîn û li gorî aqil e; û dîsa, nîşan daye ku, yekitiya biratiyê ya li ser esasên tevlîbûna azad û enternasyonalîzmê, ji karker û gundiyên gelên pir cuda cuda hatiye avakirin bi rastî jî mumkîne û li gorî aqil e û herwiha derbeyeke mirinê li vê çîrokê daye. YKSS'ê ku proto-mînaka yekitiya pêşerojêya bi şiklê ekonomiyeke hevgirtî ya cîhanîye û ekonomiyek ku ya hem û kedkarên welatane, ê nekaribe da ku weke delîleke rasterast, vê bi kar neyne û xwe jê bide aliyekî.

pêwîst nake ku mirov bêje ev encam û encamên din ên Şoreşa Cotmehê, li ser tevgerên şoreşger ên li welatên mêtingeh û girêdayî, wê tesîreke cidî bike. Li Çîn, Endonezya, Hindistanê û hwd. mezinbûna tevgerên şoreşgerî yên gelên bindest û bûyerên weke zêdebûna hezkirina van gelan ji bo YKSS'e, nîşan dide ku ji rastbûna vê guman nabe.

Serdema kedxwarî û çewisînê ya nayê hêjandin ku li ser gelên welatên mêtingeh û manda * dihate meşandin derbas bûye (*)[4].

Li welatên mêtingeh û manda * serdema şoreşên rizgariyê, serdema hişyarbûna proletaryayê, serdema ku proletaryaya van welatan hegomonyaya xwe ava bikedest pê kiriye (*)

## Di Navbera Her Du Şerên Parvekirinê Yên Emperyalîst De Rewşa Cîhanê

Gelên Sovyetê yên ku li ser axa Rûsyaya Çartiya kevin bi şiklê YKSS'ê (Sovyetler Birliği) bi rêxistin bûne di encama Şoreşa Cotmehê de, dest bi avakirina sosyalîzmê kirin. Dewletên emperyalîst ên ku nekarîne vê rewşa ku ji şeşan yekê cihanê dest bi avakirina sosyalîzmê kiribû daqurtînin, li dijî Sovyetan dest bi şer kirin. Bi binketina emperyalîstên ku bi paşverûyên li hundir ve yek bibûn, hat fêmkirin ku wê ti hêz û quwet nekaribin avabûna sosyalîst asteng bikin. Bi tasfiye kirina Troçkist û alîgirên Buharin ku rola ajantiya emperyalîzmê girtibûn ser xwe, YKSS'ê bi şiklekî ku bi paş de nayê vegerandin bû welatekî sosyalîst.

Emperyalîstan, piştî şer berê xwe dan ji nû ve avakirin û bihêz û quwetkirina ekonomiyên xwe yên hilweşiyayî. Burjuwaziya ku ji ber YKSS'ê, rizgariya neteweyî û tevgera proletaryayê ya li welatê xwe tirs ketiye dilê wî, rizgariya xwe di îdeolojiyên sosyal-demokrat û faşîst de dît. Bi taybet li Almanya û Îtalya ku di arefeya şoreşê de bû, faşîzma ku şiklê rêveberiyê yê herî xwînî ye, dest bi mezinbûnê kir. Hikumetên sosyal-demokrat ên ji bo xapandin û parçekirina proletaryayê hatine bikaranîn, di vê demê de ji xizmeta faşîzmê zêdetir encam nedan.

Di merhaleya emperyalîst de, bi taybet ji Şoreşa Cotmehê bi şûn de, demokrasiya burjuwa ku timî jê dihat xwarin û dihat sînordarkirin,

---

[4] *(*)J Stalîn, Marksîzm û Pirsgirêka Neteweyî û Mêtingehan, rp 310-312 Weşanên Sol, Çapa seyemîn*

ji bûn şiklekî dewletê derketiye. Dewletên ku ji aliyê grûbên herî bihêz û quwetên kapîtala fînansê ve dihatin bi rêvebirin, xwe xistin qilifên cur bi cur ên weke faşîzm û  olîgarşî û  weke alternatîfê hevdu pêş ketin.

Krîza ekonomîk a cîhanî a sala 1929’an, bilindbûna faşîzmê bilez kir.Faşîstên Alman, Îtalyan û  Japon ku hewl didan YKSS’ê ji holê rakin, di navbera xwe de îtifaqek çêkirin û heya asta dawî mîlîtarîzîm pêş xistin. Îngilîzistana ku ji şer bi feyde derketibû, Fransaya ku heza xwe ya berê wenda kiribû, DYE’yê ku hêzeke emperyalîst a nû her ku diçe mezin dibe bû, difikirîn ku hedefa faşîzmê YKSS’ê ye û  wê bi ser wan de neyê, ji ber vê yekê ketin temaşeya vê rewşê.

Di navbera her du şeran de bûyereke girîng a din jî ev e; di nav civakên mêtingeh de pêşketina kapîtalîzmê bilez bû  û weke parçeyekî ji şoreşên cîhanê yên proletar, li dijî emperyalîzmê tevgerên rizgariya neteweyî pêş ketin. Tevî ku tevgerên çîna karker li Rojava di encama hevkariya sosyal-demokrat û  emperyalîstan de bi bin ket, tevgerên rizgariya neteweyî li Rojhilat, pêşengiya proletaryayê jî di nav de, bi taybet li Çîn, Hinda Çîn û  Hindistanê ku herî zêde kapîtalîzma emperyalîst li van deveran pêş ketibû, bûn yek ji meylên sereke. Tevgera rizgariyê ya neteweyî yaTirk ku ji xirbeyên emperyalîzmê yên piştî şer û  alîkariya YKSS’ê sûd wergirt, bi pêşengiya burjuwaziyêsînordar jî be gihiştibû  serkeftinê, bûyereke karekterîstîk a vê demê ye. Almanya ku ji Şerê Parvekirinê yê I. yê Emperyalîst bi şiklekî binkeftî derketibû  û bilez û  bez mîlîtarîze bû, li gel Japonya û Îtalyaya faşîst ku dixwestin li gorî asta quweta xwe ji mêtingehan parê bistînin, bûn bingeha şerekî cîhanî yê duyemîn. Vê klîka faşîst YKSS jî kir hedefa xwe û  ber bi sala 1939’an şer da destpêkirin. Ev şer, di heman demê de, delîleke duyemîn bû  ku nîşan dida, kapîtalîzm wê ti car biaqil nebe.

Şerê Parvekirinê yê I.yê Emperyalîst ku bibû  sedema mirina nêzî 30 milyon mirov, seqet mayina nêzî 50 milyon mirov û  bi şiklekî komî têkçûna amûrên hilberînê, bi pêşengiya YKSS’ê, li beranberê cepheyê ku ji aliyê proletarya, tevgerên rizgariya neteweyî û  hêzên antî-faşîst ên din ve hatibû  pêkanîn bi binkeftina faşîzmê bi encam bû. Piştî şer, di rewşa cîhanê de guherînên bingehîn çêbûn.

## Ji Şerê Emperyalîst ê Duyemîn Heya Roja Me Ya Îro Rewşa Cîhanê:

### Rewşa Emperyalîzmê:

Sîstema emperyalîst, ji bo ku nakokiyên xwe hal bike û hilweşîna xwe dereng bixe serî li şer dabû. Lê di encamê şer de bi girtina birînên hê mezintir derket.Li dijî emperyalîzma ku di dema şer de û piştî şer dema xwe ya herî zeîf dijiya, gelên cîhanê, ketin nav têkoşîneke mezin a berxwedan û şoreşê. Dema ku avakirina sosyalîzme pêş diket, tevgerên rizgariya neteweyî û çîna karker jî serkeftinên mezin bi dest xistin. Ji ber van sedeman, dewletên emperyalîst dema fêm kirin ku bi tinebûneke mitleq re rû bi rû ne, nakokiyên di navbera xwe de xistin planê duyemîn, ji bo ku şoreşa cîhanê asteng bikin, bi pêşengiya DYE ya ku ji şerherî zêde bi feyde derketibû, ji bo demekê bi hev re îtifaq pêş xistin.

Ji bo fêmkirina vê tevgera antî-şoreşgerî ku bi pêşengiya DYE'ê, divê rewşa ku emperyalîzmê di nav de bû hê ji nêz ve were dîtin.

Emperyalîzma Almanya, Îtalya, û Japonyaya faşîst ku bibû sedema esasîya şer, bi binkeftineke mezin re rû bi rû ma. Ekonomiya wan a ku hê bêhtir bi armanca şer hatibû birêxistinkirin, bi temamî hilweşiya. Beşeke mezin û aktîf a hêzamirov an miribû an jî seqet mabû. Febrîqe bi temamî xirab bibûn.

Rewşa Îngilîz û Fransiyan, ku ji şer serkeftî derketibûn û welatên din yên Ewrûpayêjî ji vê ne cuda bû. Eger ji nû ve rêxistinbûnek nebibûna, mumkîn nedibû ku kapîtalîzmê jiyana xwe berdewam bikirana.EmperyalîzmaDYE'ê ku di kêliya dawî de tevlî şer bibû û ji ber cihê xwe yê coxrafîk zêde zerer nedîtibû, cuda jî ji ber talana ku di şer dekiribû, bû dewleteke pir biquwet. Dema DYE'ê kontrola emperyalîzmê dixist destê xwe, diviyabû li aliyekî ekonomiyên ku bibûn xirabe ji nû ve ava bike û li aliyê din jî weke berdêla vê, li mîrateya kapîtalîzmê ya li mêtingehan xwedî derkeve. Dema ku rewşa bêhêz û bêquwet a Îngilîzîstan û Franseyê bi berxwedana mêtingehan re bû yek, şiklê nû yê mêtingeriya DYE'ê bû neçariyekê. Li beranberê tevgerên sosyalîst û rizgariya neteweyî, diviyabû bêyî ku bi derengî bikeve ev erk û wezîfe werin pêkanîn.

Li gorî doktrînên Marshall û Truman, di navbera pêşketin û mezinbûna welatên kapîtalîst û hêzên ekonomîk û leşkerî yên van welatan de îtifaqek weke neçarî hat dîtin. Rêxistinên weke NATO, CENTO, RCD, SEATO ku li gorî vê hatibûn avakirin, xwe dispêrin esasa krîzên siyasî û leşkerî yên di nav sîstemên kapîtalîst de bi hev re pêşwazî kirinê, li dijî welatên sosyalîst û tevgerên rizgariya neteweyî helwesteke şîrîk girtinê. CEA'ê (AET) ku rêxistina ekonomîk a emperyalîstên Ewrûpayê ye, tevî ku di qada ekonomîk de li dijî Emerîkayê derdikeve, di bingeha xwe de li dijî tevgerên sosyalîst û rizgariya neteweyî li gel emperyalîstên din tevger dike. DYE'ê, li gorî doxtrîna Monroe, xwe weke hakimê xwezayî yê parzemîna Emerîkayê dihesibîne û bi pêşengiya xwe paktên (yekitî) cur bi cur ên ekonomîk û leşkerîava kir.

Dema kuhê di navbera du şerên cîhanê de weke înkara demokrasiya burjuwa şiklên dewletê (faşîst, olîgarşîk) yên ji aliyê grubên tekdest (tekel) ve dihatin ferzkirin derketine holê, hem li metropolan û hem jî li navçeyên pêve girêdayî, hikumetên bi hevkariya faşîst û sosyal demokratan çêbûne û cuntayên leşkerî li pey hev hatine îqtîdarê.

Di qadên çandê yên weke felsefe, wêje û sînema de heya asta dawî meylên ji rê derketî hatine pêşxistin. Bi navgîniya amûrên biquwet, mirov ji pirsgirêkên xwe yên herî jiyanî hatin qutkirin û neçarî kesayetiyên bêhelwest hatin kirin. Hewl hat dan ku nirxên ku mirovahiyê di seransera dîrokê de bilind kirine werin xistin bin lingan.

Hem û pêşketinên di zanist û têknolojiyê de bi qasî ku xizmeta berjewendiya tekdestan dike, pratîze hatin kirin. Enerjiya atomê ku serkeftina zanist û teknolojiyê ye, hat xistin rewşa amûrek ku timî gef li mirovahiyê dixwe.

Burjuwayên welatên emperyalîst, dema kozmopolîtîzm li aliyekî weke şiklekî jiyanê digirtin dest, li aliyê din ji bo ku di navbera kedkaran de nakokî biafrînin ji pêşxistina şovenîzmê kêliyekê paşde neman. Arîstokrasiya karkeran ku di encama kirîna beşeke karkeran de pêk hatibû, bû bîngeha madî ya şovenîzm, revîzyonîzm û reformîzmê. Hewl hat dayin ku çîna karker bixin bin tesîra van meylên ku xizmeta emperyalîzmê dikirin û di vê armancêde jî di asteke pêş de bi ser keftin.

Sîstema kapîtalîst-emperyalîst, tevî vê tevgera ji nû ve bi rêxistinbûn û avabûnê ku bi pêşengiya DYE'ê hatibû destpêkirin, di nav xwe de diderizî û li beranberê welatên sosyalîst, çîna proletarya û tevgerên rizgariya neteweyî nedikarî serkeftinê bidest xwe ve bîne.

Ma ev rewş, ku emperyalîzma DYE'ê ji bo rizgarkirina kapîtalîzma li ber sikratê ye û her roj parçeyekî xwe wenda dike ketibû nav, naşibe rewşa împaratoriya Romayê ku dixwest koletiyê rizgar bike an jînaşibe împaratoriyên Çartiya Rûs û OsmaniyênTirk ku dixwestin feodalîzmê rizgar bikin? Ma ew jî di dema xwe de pir bihêz û biheybet xuya nedibûn?

## Rewşa Welatên Sosyalîst:

Yek ji armancên klîka faşîst ku şer dabû destpêkirin, hilweşandina YKSS'ê (Sovyeta kevin) bû. Lê YKSS çawa ku di şer de bi srer ket, wiha jî ji tecridbûnê xwe rizgar kir. Cepyên gel ku li Ewrûpayê bi alîkariya arteşa sor a Soveyêtê, li Rojhilatê Ewrûpayê hatibûn avakirin, di dawiya şer de îqtîdara dewletê bi dest xistin. Komînîst ku dinav cepheyên gel de bitesîr bûn, di têkoşîna li dijî partiyên demokrat ên burjuwa de bi ser ketin û Komarên Gel ku şiklê destpêkê yê dîktatoriyên proletaryayê bûn ava kirin. Bi avakirina komarên gel li tevahiya Rojhilatê Ewrûpayê, rewşa tecrîdê ya li ser YKSS'ê ji holê rabû. Welatên sosyalîst ku di navbera xwe de di qadên weke ekonomîk, siyasî û leşkerî de hevkariyeke saxlem pêş xistibûn, ji bo avakirina ekonomiya sosyalîst dest bi têkoşînê kirin û serkeftinên mezin bi dest xwe ve anîn.

Di qadên ekonomîk û leşkerî de li beranberê dorpêça sîstema emperyalîst, heyina civata welatên sosyalîst ku bi hêza xwe ya cewherî pêşketibûn, yek ji bûyerên herî girîng ên serdema me ne. Di her bûyera ku li devera herî dûr a cîhanê de pêk têde tesîra welatên sosyalîst nedîtinne mumkîn e. Di gihiştina serkeftinê ya tevgerên antî-faşîst û rizgariya neteweyî de, heyîna cîhaneke sosyalîst yek ji faktorên herîgirîng e. Şoreş, li welatên mêtingeh, bi hebûna sîstema sosyalîst li dijî sîstema emperyalîst û bi alîkariya aktîf a ku ji sîstema sosyalîst tê wergirtin gengaz e. Tevî ku hêza serekeya ku emperyalîzm hilweşandiye tevgerên rizgariya neteweyî ne, hêza esasî ku ji bo ew bigihîn serkeftinê piştgirî dayê jî, sîstema sosyalîst e.

Li beranberê krîza timî ya ekonomiyên kapîtalîst, serkeftina mezin a ekonomiya sosyalîst, rewşa bi îstîkrar a ekonomiyên sosyalîst, serkeftinên di qadên siyasî, leşkerî û çandî de hatine bidestxistin û li ser esasê van hem û serkeftinan raseriya (üstünlük) ku li beranberê emperyalîzmê hatibû bidestxistin, bû sedem da ku sîstema sosyalîst li ser emperyalîzmê bi şiklekî rasterast tesîreke hilweşandinê bike. Dewletên emperyalîst, ji beriya ku sîstema sosyalîst were avakirin, dema ku li ser welatekî di bin hakîmiyeta wan de ye li beranberê hev têkoşîn didan meşandin, tenê li gorî hêza xwe tevger dikirin.Lê, bi avakirina sîstema sosyalîst re ev rewş ji holê rabû, êdî weke faktoreke astenker (önleyici)hesabê welatên sosyalîst jî dikin.

Hebûna welatên sosyalîst, ji bo welatên cîhanê merkezeke timî ya rizgarî, ronahî û kişandinê ye.

## Li Welatên Kapîtalîst Rewşa Tevgera Çîna Karker:

welatên kapîtalîst –bi taybet rojavayê Ewrûpayê- ku xwedî kevneşopiyeke (gelenek) têkoşînê ya dûr û dirêj û tecrubeyekê zêde bû, di seransera şerê emperyalîst de, di binxistina faşîzmê de û di serkeftin bidestxistina hêzên demokrasiyê de bi roleke aktîf rabû; piştî şer, ji bo hedefên demokratîk û siyasî yên weke xurtkirina aştiyê, bi cihkirina demokrasiyê, bipaşxistin û ji îqtîdarê dûrxistina tekdestan, têkoşîna xwe zêde kir. Bi serkeftinên ku di encama vê têkoşînê de bi dest xistiye û bi rêxistinkirina gel li dora xwe, bû hêzek ku hesabê wê tê kirin. Rewş gihiştibû wê astê ku, li hin welatên kapîtalîst milîsên proletar ên şerker çêbibûn û bi pêşengiya proletaryayê organên têmsîlî hatibûn avakakirin û serkeftinên pir mezin bi dest xwe ve anîbûn. Dîsa, proletaryayê, bi van têkoşîn û serkeftinan, alîkariyên xurt jî dabûn hewldanên her ku bilind dibûn ên avakirina sosyalîzmê û tevgerên rizgariya neteweyî; di paşxistina emperyalîzm û bi hêzkirina sosyalîzmê de roleke girîng lîst.

Tevgera proletarya, ku di encama têkoşînên li dijî tekdestên emperyalîst pêş xistiye de bibû alternatîfê îqtîdarê, piştî 1950’yanji ber îxaneta revîzyonîzma modern a xulamên emperyalîzmê, ji bo demekê neçar ma ku leza têkoşînê kêm bike û di cihê xwe de bimîne. Tevgera proletaryayê, îro ji ber ku revîszyonîstan rêveberiyên partiyên komînîst

û sendika xesp kirine, tevî ku tovên bagereke nû di nav xwe de dihewîne, dişibe okyanûsek ku piştî bi bahozê aram û bêdeng bûyî. Proletarya, ku ji ber îxaneta revîzyonîst ji rêveberiyeke bihêz bêpar maye, heya ku rêxistina xwe ya şoreşger ava neke, çawa ku wê nekaribe têkoşînê pêş bixe, wê weke pêwîst dike nekaribe alîkarî bide welatên sosyalîst û tevgerên rizgariya neteweyî jî.

Tevî van hem û mercên neyînî, bêyî ku qanûn û şefên sendîkayên revîzyonîst bi tiştekî bihesibînin, grevên ku li dijî burjuwazî û revîzyonîstên modern ên ku xulamên wan in pêş dikevin û ew jêre greva hovane dibêjin, îro jî ruh û potansiyela têkoşer a proletaryayê nîşan dide. Li gelek welatên kapîtalîst ên pêşketî li pey hev grev çêdibin, ji bo ku rêxistinên nû yên siyasî û girseyê werin çêkirin, li dijî reformîzm, revîzyonîzm û Troçkîzmê têkoşîneke zêde zêde tê meşandin.

## Rewşa Mêtingeh û Tevgerên Rizgariya Neteweyî:

Bi emperyalîzm û Şoreşa Cotmehê re pirsgirêka neteweyî bi pirgirêka giştî ya mêtingehan re ketiye zikhev. Ji ber vê yekê ne tesaduf e ku mêtingeh bi xwestina têkoşîna li dijî emperyalîzmê, pirsgirêka xwe ya neteweyî çareser bikin; yanî serxwebûna xwe ya neteweyî bi dest bixin. Di vê qonaxê de, şert û mercên objektîf û subjektîf dest bi pêşketinê kirine.

Îxraca sermayeyê li ser welatên mêtingeh, dibe sedem ku li van welatan kapîtalîzm pêş bikeve û pêkhateya (yapı) civakî were guherîn. Ev rewş ku di navbera du şerên cîhanê de pêş ketiye, piştî şerê cîhanê yê duyemîn jî bi lezbûnê dewam kir. Ji ber ku ji sisêyan yekê cîhanê berê xwe dabû avakirina sosyalîzmê, serkeftinên her zêde dibin yên tevgerên rizgariya neteweyî, ji bo kapîtalîzmê bû sedema pirsgirêka madeyên xav (ham madde) û bazarê. Bazara ku ji ber sedemên siyasî hejmara wê nedihat zêdekirin, tenê dikarîbû ku bi şiklê kûranî bihata pêşxistin. Vê jî, neçar hişt ku dewletên emperyalîst ne tenê meta bifiroşin mêtingehan, li gel pere-sermayeyê febrîqe jî îxraç bikin. Bi taybet di mêtingehan de qadên weke tekstîl, qut û endustriyên sivik (hafif sanayî) hatin bicihkirin. Çengên sanayiya giran ên weke elektronîk, balafir û hwd. ji xwe re hiştin . Evnîşan dide ku, ji ber

pêşketina faktorên teknolojîk û siyasî, têkiliya metropol-mêtingehan li ser bingeheke madî ya pêşketî ji nû ve tê avakirin.

Hewl tê dayin ku; ev mêtingeriya ku bi taybetxwe bi sipartina ekonomiya xwe ya xurt ji aliyê DYE'ê tê pêşxistin, li piraniya cîhanê hakim bibe da ku sîstema emperyalîst li beranberê welatên sosyalîst xwe ragire, tevgerên rizgariya neteweyîberê xwe nedin serxwebûna ekonomîk û pirsgirêka kapîtalîzmê ya bazarê li ser bengeheke hê pêşketîtir a zanistî û teknolojîk were çareserkirin. Ev mêtingeriya nû, ne li dijî mêtingeriya klasîk e. Hewl tê dayin ku xetereyên dibe ku ji aliyê mêtingeriya klasîk ve werin afirandin, bi şiklê vê mêtingeriyê were tinekirin. Aliyên ku li ser mêtingehan hakim in (emperyalîst û quwetên noker) berjewendiya xwe ya şîrîk hê girîng dibînin û li şuna ku mêtingeh bi temamî ji dest wan derkevin, li ser rê û rêbazek ku her du aliyan jîberê lihev kiriye gihiştine encamekê. Ne pevçûnê, hewl didin rewşa hevsengiyê (denge) biparêzin. Hewceye, ku rewşa ecêb a mêtingehên klasîka ku hê jî bi şiklê bermayî hebûna xwe didomîne di vê maneyê de were nirxandin.

Bi kurtahî, kapîtalîzma ku ji ber van sedeman li welatên mêtingeh hatiye pêşxistin, di pêkhateya (yapı) civakî ya van welatan de bû sedema guherînên girîng. Dema ku beşên komprador û feodal di nav çinên hakim de, quweta xwe wenda kirin, li aliyê din jî burjuwaziya noker-tekdest (işbirlikçi-tekelci) ku di qadên sanayiya sivik ên weke montaj, qut, tekstîl û hwd. de dihate pêşxistin, girîngî qezenc kir. Heman şert û mercê, di bûyera qutbûna ji axê ya gundiyan û pêşketina çîna karker de tesîra xwe nîşan da. Derketina meydanê ya tebeqeyeke her ku zêde dibe ya rewşanbîran jî, encameke pêşketina vê eknomiyê ye.

Di encama van peşketinên sosyo-ekonomîk de, dixwaze bi şiklê mêtingeriya nû di nav amûra dewleteke cuda de be û dixwaze jî di mêtingehên klasîk de di nav rêveberiya mêtingehê ku bi komprador û feodalan re di nav têkiliyên noker de be, şiklê rêveberiyê yê derbasker, dîktatoriyên mîlîtarîst in ku li pişta saziyên civaka sivîlên wekî maske tên bikaranîn û bi emperyalîzmê ve girêdayîne xwe vedişêrin.

Ev pêkhateya (yapı) welatên mêtingeh ku piştî şerê parvekirinêyê duyemîn diyar bûye, nîşan dide ku ji bo şoreşên rizgariya neteweyî şert û mercên ebjektîf çiqas kemilîne. Ev şert û merc eşkere xuya dikin ku; di şoreşên mêtingehî de bi pêşengiya burjuwa bawerî nabe û bi quwetên

dijber re xwediyê karektereke lihevker (uzlaşıcı) e û di heman demê de pêşengiya proletarya ku xwe dispêre girseyên kedkar jî, bi serxwebûna temam encam dibe. Di nav tevgera rizgariyê ya neteweyî de bi her şiklê meyilên noker û teslîmkar, xwe dispêrin emperyalîzm û metingeriyê, tevî vê rewşê meyla serxwebûna neteweyî ya temam, xwe dispêre proletarya û hezên kedkar ên din kuji emperyalîzm û mêtingeriyê zerer dibînin

Ev şert û mercên navxweyî ku li mêtingehên girêdayî emperyalîzmêne û ji bo şoreşê heya asta dawiyê di cih de ne pêk hatine, dema kuji ber mercên şer û piştî şerbi bêquwet ketina emperyalîzmê û li beranberê vêbi alîkariya aktîf a welatên sosyalîst re bûn yek, tevgerên rizgariya neteweyî bûn mêylên sereke yên ku emperyalîzmê paş dixin.

Tevgerên rizgariya neteweyî, destpêkê li mêtingehên îngilîzîstan û Franseyê ku kapîtalîzma mêtinger cara yekemîn li vir pêş ketibû, gihîştin serkeftinê. Ev gelên mêtingehan ku beriya ji vê serî rakiribûn, ji şert û mercên destdayî jî feyde girtin û berê xwe dan serxwebûna siyasî. Têkoşîna serxwebûnê ku li Hinda Çînê û Nîv Girava Hindê li gorî cihên din hêsantir bi ser ketibû, dema ku li Vîetnamê, bi pêşengiya komînîstan zivirî têkoşîna ji sîstema emperyalîst qutbûnê, DYE’ê, Fransa û nokerên navxweyî dest bi tevgereke mezin a dij-şoreşê kirin. Tabetmendiya cuda ya şoreşa Vîetnamê ji şoreşên din, tenê bi sûd wergirtina ji demên şer ku emperyalîzm zeîfbû nema û nîşan da ku welatekî biçûk di şert û mercên ku şerekî cîhanî nîne de bi xwe rêxistinkirina li dijî çend welatên emperyalîst û nokerên wan, dikare bişiklekî serkeftî li ber xwe bide û bi ser bikeve.

Şoreşa Çînêku di nav têkoşîna li dijî emperyalîzma Japon de di encama şerê berxwedanê de pêş ketiye û berê xwe daye kapîtalîzma komprador-burokrat û feodalîzmê bi avabûna şoreşa gel encam bibû, darbeyeke din a mezin li sîstema emperyalîst daye. Rizgarbûna Endonezyayê ji hakîmiyeta Holanda, bi serkeftinatam encambûnatêkoşînên gelên Kore, Laos û Kamboçya, Rojhilata dûr kir herêmek ku emperyalîzm lê zeîf ketiye.

Têkoşînên li Afrîkayê dihatin pêşxistin jî, mînaka serkeftî ya şoreşa Vîetnamê şopandin û serkeftinên mezin bi dest xistin. Li mêtingehên Fransî û Îngilîzan, bi destxistina serxwebûna siyasî bi piranî hêsan bû;lê li mêtingehên Portekîzê ku kapîtaîzma mêtinger kêm pêşketibû, encax ev pêşketin piştî 1950’an bilez bûye û têkoşînên

rizgariya neteweyî hê radîkal û zehmetir pêş ketine.Li Afrîkayê, kêmahiyeke (azınlık) ji nijadê sipî ku girêdayî bi emperyalîzmê ve ye hewldide ku mêtingeriya di rewşa bermayi de ye bide jiyîn. Li aliyê din, emperyalîstên Fransî, Alman û DYE’ê hewl didin mêtingeriya nû pêş bixin. Gelên Afrîkayê bi hev re têkoşîna xwe pêş dixin û ev têkoşîn berê xwe dide mêtingeriya nû jî. Ne mumkîn e ku emperyalîzm û nokerên wê li hemberê vê xwe ragirin. Emperyalîst, ji bo ku tevgerên rizgariya neteweyî bisekinin hewl didin ku rêveberiyên qukla xurt bikin.

Tevgerên şoreşger ên Başûrê Amarîka ku hewl didin mînaka serkeftî ya şoreşa Kubayê ya li dijî mêtingeriya nû bişopînin, hê bi zehmetî pêş dikevin. Têra wê amade nekirina şert û mercên subjektîf, tesîra Troçkîst a di nav tevgeran de û dîktatoriyên harbûyî yênaskerî–faşîst, sedemên bi zehmetî pêşketinê ne.

Emperyalîzma ku piraniya mêtingehên xwe wenda kiriye û ji bo ku yên di destêxwe ye de biparêze ketiye rewşeke zehmet, ji ber cihê wê yê stratejîk û coxrafîk û çavkaniyên dewlemendên ku bêyî wan nabe, bi hem û hêza xwe êrîşî welatên Rojhilata Navin dike; rêûrêbazen mêtingeriya klasîk, mêtingeriya nû  û leşkerî di zikhev de bi kar tîne û bi navgîniya (aracı) nokerên xwe yên wan deveran hewl dide ku van welatan bi rêve bibe.

Emperyalîzm, li gorî berjewendiyên mêtingerî û feodalan parçebûna gelên Rojhilata Navîn, têkoşînên rizgariyê bi zehmet dixe. Weke ku parçebûyina eşîrî-feodal a li Kurdistanê têrê nekiribe, ji aliyê çar welatan ve bi şiklekî herî paşver û mêtingehkirina wê, ji ber vê yekê demeke dirêj ji bo kapîtalîzmê venebûna wê, dibe sedem ku tekoşîna rizgariya Kurdistanê di asteke herî paşketî de bimîne.

Ji bo berjewendiyên emperyalist û feodalan, gelên Ereb xistin bin kontrola gelek dewletên noker astenga herî mezin e li ber yekîtî û serkeftina tevgera rizgariya neteweya Ereb. Îsraîl ku li Rojhilata Navîn weke hêzeke mîlîtarîst rola ‘hespê Truwa’ dilîze, wekî ku derxistina gelê Filîstînê ji welatê wan têrê nekiribe, dem bi dem bi kirinên tevkujiyê hewl dide vî gelî tine bike. Berxwedana Filîstînê, ji aliyêemperyalîzm û  paşverûtiya herêmîve tê xwestin ku were tesfiye kirin.

ArtêşênTirk û Îranê rola cendermetiya emperyalîzmê girtine ser xwe. Mêtingeriya nû ku li van her du welatan hatiye pêşxistin, neçar dibîne ku tevgerên şoreşgerî bi şiklekî herî hovane were têkbirin.

Ev faktor hemû, li ber çavan rêdixin ku têkoşîna şoreşgerî ya gelên Rojhilata Navîn ji ber çi neçariyeke û ev tevgerên gel ên li Rojhilata Navîn wê derbeyeke mirinê jî bide emperyalîzmê.

Hêza emperyalîzmê, di asteke bilind de li Asya û Afrîkayê têkçûye; dema li Rojhilata Navîn jî, ku di navbera van her du parzemîn (kıta) û YKSS'ê de herêmeke pir girîng e, derbeyeke mezin bigire wê bikeve merhaleya dawî ya belavbûnê.

Meyla sosyalîst ku ji aliyê welatên sosyalîst, tevgerên rizgariya neteweyî û çîna karker ve temsîla xwe dibîne, tevî astengiya meylên ji rê derketî yên cur bi cur emperyalîzmê gav bi gav paş dixe, û ji bo serxwebûn, demokrasî û sosyalîzmêji bo ku gelê herî biçûk jî –eger biwêrin şer bikin- xwe bigihînin serkeftinê, ji her demê zêdetir şert û merc diafrîne.

## Rewşa Di Nava Tevgerên Rizgariya Neteweyî, Çîna Karker û Komînîst De

Dîrok pêş me dike ku di her pêvajoya ku meylên şoreşgerî pêş ketine de yên ku berjewendiyên wan ketine xetereyê, hewl dane ku van meylên nikarîne bi darê zorê pêşî lê bigirin ji nav birizînin, ji rêderxin û weke ku dixwazin bi kar bînin. Li pey her pêvajoya bi heyecan a pêşketina meylên şoreşger, bi piranî, pêvajoyeke zeîfbûnê ya ku ji rê derketin (sapma) dibin sedem tê. Di qedera her doktrîna mezin de ev rastî heye. Di Îslamiyet, Xiristiyanî û îdeolojiyên burjuwa de û di sosyalîzme de jî rewş ne cudatir e. Cewhera doxtrînan a rastîn û zindî, şoreşan diafirîne lê demogojiya wan ku ji aliyê oportunîzm û revîzyonîzmê ve tê kirin jî ji ji rê derketinan (di Tirkî de weke 'döneklik' derbas dibe) re dibe sedem.

Sosyalîzma zanistî ku yekane meyla durust a şoreşger a serdema me ye, bi taybet piştî rabûna mezin a ku tevgera sosyalîst di pey Şerê Parvekirinê yê Duyemîn ê Emperyalîstde nîşan daye, bi xirabûn û

guherînên mezin re rû bi rû ma û dimîne. Ji ber ku li welatên ku şoreş bi serkeftinê bi encam bûye ji vî karî re pêşengî hatiye kirin, destpêkê, dibe ku ji mirov re ecêb were. Lê eger dîroka sosyalîzmê were lêkolînkirin, wê derkeve meydanê ku rewş qet ne ewqas jî ecêb e. Rewşeke asayî ye kuli cîhên têkoşîna şoreşgerî pêşketiye, li cihên ku şoreşmezin bûye û bi cih bûye ji rê derketin (sapma) derkeve meydanê. Li deverên ku şoreş û tevgera şoreşgerî nîne, ma çi karê ji rê derketinan heye?

Ne tesaduf e ku revîzyonîzma Bernstein li Almanyaya ku cara yekemîn sosyalîzma zanistî û tevgera çîna karker li wirbûye yek pêş ketiye, û di pey re jî oportunîzma Enternasyonala II. pêş ketiye: ji ber ku di vê pêvajoyê de Almanya merkeza şoreşê ye.

Ne teseduf e ku di Şerê Parvekirinê yê I. ê Emperyalîst de sosyal şovenîzma Enternasyonala I. bi hewara burjuwaziya emperyalîst de çûye; ji ber ku şer hem û Ewrûpa anîbû arefeya şoreşê.

Ne tesaduf e ku li YKSS'ê Troçkîzm derketiye û ji bo dewletên emperyalîst bi rola ajantiya rabûye jî; ji ber ku avakirina sosyalîzmê bibû rastiyekê. Ev rewşa ku emperyalîzm dîn û har kiribû, eger Troçkî nebûna jî wê Troçkiyek biafiranda.

Di roja me ya îro de revîzyonîzma modernli welatên sosyalîst ên herî bihêz derdikeve; ev rewş jî ne tesedufek e. Kapîtalîzm, li van welatan weke ku careke din bi ser xwe ve neyê di kûraniya dîrokê de hatiye binax kirin û civaka çîndar ji aliyê sosyalîzmê ve hatiye serûbin kirin. Li aliyê din, li van welatan zemîna madî ya bermayiyên civaka çîndar ji bo ji rê derketinan bûye zemîn. Ji ber vê yekê, pêşketin û derketina meydanê ya ji rê derketinan a li van welatan, wê helbet bihatana jiyîn. Keştiya şoreşê di deryayên berfireh de di ba û bagerên mezin de bi rê ve diçe; helbet hin wê derkevin da ku xwe bigihînin peravan.

LENÎZM'a ku marksîzma serdema şoreşên proletaryayê ye û rastbûna wê ji aliyê pratîka şoreger a cîhanê ve bi xwîna sed hezaran hatiye îsbatkirin, ne dikare ji aliyê têzen weke "pêşketina civakî", "derbasbûna aştîane", "riya ne kapîtalîst" (*)[5] ku di rastiyê de teoriya ji

[5] *(*) Ya ku li vir tê xwestin were gotin, ne ew têza Lenînîst a bi şiklê "li welatên paşde mayî, di encama şoreşa gel a demokratîk a neteweyî de di riya ku ne kapîtalîst e*

burjuwaziyê re xulamtî kirinê ye û pêşniyara li gel burjuwaziyê desthilatî parvekirinê dikin, û ne jîdikare bi derewên “du dewletên super”, “cîhana sêyemîn”, û “sîstema ekonomîk a nû ya navdewletî” ku teoriya xulamtiya herî girêdayî ya bi emperyalîzm û paşverûtiya wê ve ye, ji bo gelên cîhanê ji rewşa bûn rênîşandêr û rêberê çalakvaniyê were dûrxistin.

Arîstokrasiya karkeran ku bi taybet bi nirxa zêde ya ku emperyalîzmê ji mêtingehan bi desxistiye bi xwedî kiriye, îro li welatên pêşketî yên kapîtalîst di êrîşa li dijî Lenînîzmê de burjuwaziyê jî derbas dike. Qedera vê meyla ku îro weke “euro-komînîzm” tê binavkirin û di partiyên kevin ên komînîst de derketiye meydanê, ku partiyên desthilat ên ku emperyalîzm herî zêde baweriya xwe bi wan tîne ev in, ji niha de dişibe aqubeta partiyên sosyal demokrat. Çîna karker a welatên emperyalîst ku hê nekariye partiyaxwe ya şoreşger ava bike, heya ku maskeyê vê meylê neaniye xwerê, wê alikariyeke cidî yawê ne bigihe gelên mêtingehan û ne jîbigihe wê bi xwe.Beyî ku derfeta kişandina nirxa zêde ji mêtingehan ji holê were rakirin jî, mirov nekare bi temamî li benda pêkhatina wezîfeyeke wiha bisekine.

Ji dema ku tevgerên rizgariya neteweyî bûn meylên sereke yên şoreşger ên serdema me pê de, em dibînin ku li vê qadê jî jirêderketinên cur bi cur xwe didin der. Ev meylên ku di cewher de çavkaniya xwe ji şert û mercên madî yên girêdayî bi emperyalîzm, mêtingerî û paşverûtiya herêmî digirin û her ku diçe karektereke reformîst, lihevker, paşver û nîşan didin, îro di hembêza revîzyonîzma modern de tên bixwedîkirin. Bi temamî deşîfrebûna îdeolojiyên burjuwa û ji aliyê gel ve bi germahî pêşwazî nekirina wan, neçar dihele ku ev meyl hema di aliyê şiklî de bibin sosyalîst.

Taybetmendiya diyar a reforman di pêvajoya emperyalîst de ew e ku, ji bo ku têkoşîna gelan a di riya azadiya tam de ye were astengkirin weke amûrekê rol lîstiye. Heya ku tevgerên rizgariya neteweyî berê xwe bidin serxwebûna tam, rastiyekku ji aliyê pratîka roja me ya îro ve bi sedan car hatiye îsbatkirine, kuemperyalîzm û mêtinger nokerên xwe

---

*de derbasî sosyalîzmê bûyînê” ye; têza revîzyonîst a bi şiklê“bêyî ku şoreşa demokratîk were lidarxistinbi riya reforman, gav bi gav derbasî sosyalîzmê bûn” e.*

ji bin de ji bin dedixin tevgerê, hewl didin ku bi hin reform xistin rojevê girseyan pasîfîze bikin. Bo mînak; li Filîstin û Rodezyayê rewş bi vî şiklî ye. Lê ew jî rast e ku şoreşgeran ti car guh nedaye reforman.

Reform, eger di nav têkoşîna germ de û di riya ku diçe serxwebûna tam de weke berhemeke rex a têkoşînê derkevin meydanê maneyekê hildigirin.

Di tevgerên rizgariya neteweyî de, ji derveyê diyardeya serxwebûnê hem û meyl reformîst in. Her meyla reformîst jî, meyla yên ku di cewhera xwe de bi têkîliyên madî bi emperyalîzm, mêtingerî û paşverûtiya herêmî ve girêdayîne ye.

Di roja me ya îro de, ji rê derketinên (sapma) reformîst ên di nav tevgerên rizgariya neteweyî de û ji rê derketinên çep û rastgerên di nav tevgera komînîst û çîna karker de, wê nekaribin pêşketina tevgera şoreşgerî ya cîhanê asteng bikin. Marksîzm-Lenînîzm ku di têkoşîna li dijî emperyalîzmê de heya roja me ya îro bi gelên cîhanê gelek tişt daye qezenckirin, wê ji vê şun de jî bi gelên cîhanê gelektişt dan qezenckirinê bidomîne.

## Beşa Duyemîn

## CİVAKA KURDİSTANÊ

Kurdistan, li herêmeke kilît a Rojhilata Navîn ku parzemîna Asyayê berêxwe pê dide parzemînên Afrîka û Ewrûpayê, di serdemên seretayî û navîn de ji bo şaristaniyê bûye navend, di roja me ya îro de bi çavkaniyên xwe yên dewlemend û bi cihê xwe yê sratejîk coxrafîk girîngiya xwe ya navdewletî didomîne, cih digire. Nexşeya siyasî ya Rojhilata Navîn a roja me ya îro, di bingeha xwe de ji aliyê emperyalîzm û burjuwazî û feodalên ku nokerên wî ne ve hatiye çêkirin û li pêşiya xwestekên gelan ên serxwebûn û demokrasiyê astengeke mezin e. Gelê Kurdê ku bi taybet hatiye xistin nav sînorên çar dewletên mêtinger û yekîtiya welatê wî hatiye parçekirin, ji vê rewşê zerere herî mezin dibîne.

Kurdistan, welatekî welê ye ku di navbera neteweyênTirk, Erebû Fars de dimîne, bi piranî Kurd li ser dijîn, çiyayên bilind û deştên

berhemdar di zikhev de ne, ji aliyê jêderên binerd û sererd ve pir dewlend e û şêniyeke zêdetirî 20 milyon mirov li ser dijîn. Di bin hakîmiyeta çar dewletên dagirker ên di aliyê siyasî de girêdayî emperyalîzmê ne de ye. Her dewlet, li gorî berjewendiyên tekdestên (tekel) navdewletî û li gorî berjewendiyên xwe, li ser parçeyê ku di bin hakîmiyeta xwe de digire di aliyê pêşxistina mêtingeriyê de bi rola sereke radibe.

Berjewendiyên eşîrî-feodal, di nav şikilgirtina ekonomîk ku ji aliyê mêtingerîyê ve hatiye pêkanîn de tên parastin, tên pêşxistin û bi darê zorê tên jiyandin; bi vî şiklî hewl tê dayin da ku parçebûna civakî were kûrkirin. Di vê pêvajoyê de netewebûna Kurdan tê astengkirin û her ku çûye giranî tê dan ser siyasetên di nav neteweyên hakim de helandinê.

Di serdema me de mêtingeriya klasîk bi temamî ketiye pêvajoya tasfiyebûnê. Lê belê hêjîserdestiya xwe ya li Kurdistanêbi şiklekî çar bi çar berdewam dike. Divê, em, ji merhaleya civaka koledar heya bi merhaleya emperyalîzmê, di nav dîroka mêtingeriyê û civaka çîndar ku me lêkolîn kiriye û welat û gelê me jiyaye û dijî deli sedema vê bigerin. Emê bi vê perspektîfê bi kurtahî dîroka mêtingehbûna Kurdistanê û pêkhateya civaka wê lêkolîn bikin.

## I-Dîroka Mêtigehbûna Kurdistanê

## A)Di Serdema Koledar De Med

Kokên Kurdan xwe dispêre Medên ku yek ji qewmên gruba Hînt-Ewrûpayê bû. Vê gruba qewman ku di serdema barbartiyê de li Bakurê Ewrûpayê bi koçberiyê jiyaye, bi pêşketina şaristaniyê re ber bi Ewrûpaya Navîn, Nîv Girava Hind, platoyên Anatolî û Îran ve tevgereke koçberiyê ya mezin dabû destpêkirin. Medên ku qewmekî ji vê grubê bûn, salên 1000’î B.Z. di navbera gola û rmiyê û gola Wanê de bi cih bûn.Medan ji vê dîrokê pêde li aliyekî bi Persên ku gelê herî nêzî wan bû re, û li aliyê din jîbi Aşûrên ku împaratoriya herî xedar a Rojhilata Navîn ava kiribûnre ketin nav têkoşînek ku bi sedan sal berdewam kiriye.

Medên ku di vê têkoşînê de destpêkê Pers bi bin xistine û surgînî başûrê rojhilata Îranê kirineûhê bi hêztir bûne, di 612'yên B.Z. de Nînowa hilweşandine ûdawî li împaratoriya Aşur anîne. Di encama binkeftina Aşûriyan de ji bo Medan deriyên Rojava vebûn. Medan, di pêvajoya împaratoriyê ku demkurt bûye de, hema bêje Kurdistana îro, xistine nav sînorên xwe û dest pê kirine vê deverêji xwe re bikin war. Qebîle û eşîrên Medan ku zêde zêde, cur bi cur bûnû zêde zêde bi tevger bûn bi gelên ji beriya wan cihnîştî bûne re tevlîhev bûn û ziman û çanda xwe li ser wan hakim kirin.

Di heman wextê de ji çanda pir dewlemend a herêmê jî bitesîr bûn û di nav dîrokê de ji bo çêbûna gelê Kurd bûn zemîn.

Wexta ku Persan di 550'yên B.Z. de împaratoriya Med hilweşandin, ji serdema koledarî pêde serdema dagirî û îstîlayê li ser Kurdan vebû. Qebîle û eşîrên Medan ku Kurdên destpêkê bûn û B.Z. di navbera salên 550-330'an de jiyabûn, pirî caran serî hildan, wexta bi bin ketin xwe sipartin çiyan û di vê merhaleyê de di asteke girîng de serxwebûna xwe parastin. Li gel vê ziman û çanda xwe ya netêweyî jî pêşxistin.

Kurdên dema ku Îskenderê Mezin B.Z. di salên 330'an de Pers têkbirin ketibûn bin hegomonyaya Helenan, bi mirina Îskender û parçebûna împaratoriyê re bi awayekî hê azad pêşketina xwe berdewam kirin. Ermenên ku di vê pêvajoyê de pêşketibûn, ji bakur ber bi başur ve, carna bi Kurdan re bûn yek û carna jî ew kirin bin hakîmiyeta xwe û heya bi B.Z. salên 50'yî li herêmê hakîmiyeta xwe berdewam kirin. Di vê serdemê de, alimên Yewnanî di dîrokê de cara yekemîn, navê "Kurdo" û "Kurdienne" bi kar anîne. Romayiyên ku li Rojava împaratoriyeke koledar a mezin ava kiribûn, B.Z. ji 50'yî pêde, hem û herêm û herêmên cihnîşînê yên Kurdan jî hilweşandin û talan kirin. Romayiyên ku li hewzeyên (kortal) Dîcle û Firatê jî hakîmiyeta xwe çêkiribûn, wexta ku Sasaniyan di salên 260'an de li Îranê hakîmiyeta xwe çêkirin û împaratoriyeke mezin ava kirin, bi wan redest bi pevçûnê kirin. Ev her du împatoriyên koleder ku bênavber, heya destpêkirina fetihên Îslamê di salên 630'an de, Mezopatamya weke qada şer ji xwe re hilbijartin.Kurdan, ji ber ku van her du quwetan nekarîbûn li ser hev hakîmiyeta xwe çêbikirana, ji ber encamên vî şerî zezerên mezin dîtin. Rewşa şer ya timî , bû sedem ku ew xwe bidin çiyan û ji ber vê yekê jîzêde nekarîbûndi qada şaristaniyê de pêşketina xweberdewam bikin.

Ji ber ku di serdema koledariyê de, herêmên bajar û deşt timî di kontrola talankeran de bûnKurdan nekarîbûn di aliyê siyasî de pêş bikevin; ji ber vê yekê jî rêxistinbûna bi şiklê eşîrî di asteke bilind de hat berdewamkirin. Beşên civakî yên li deşt û bajaran dijiyan jî ji ber ku zanebûna xwe ya azadiyê wenda kiribûn û bibûn kole, di serdema koledariyê de tevgera gelbûnê ya Kurdan teng ma. Tevî van sedemên nêyînî, Kurdan, bi ziman, dîn û çanda xwe ya neteweyî weke gelê cihnîştî yê biesil, di serdema feodal de ji gelên din ên cîhanê hê bi şiklekî diyar li ser dîka dîrokê cihê xwe girtin.

## B) Di Serdema Feodal De Kurd û Kurdistan

### 1-Pêvajoya Hegomonyaya Ereban

Erebên ku di sedsa VI. de bi taybet bi pêşengiya îdeolojiya Îslamê dest bi tevgereke fetihê ya mezin kiribûn, li Rojhilata Navîn pêvajoya pêşketina feodalîteyê dan destpêkirin. Erebên ku temsîla îdeolojî û şiklekî hilberînê ya hê pêşketî dikirin, ji ber ku riyên tîcaretê yên di bakurê Sûriyê re derbas dibûn xistin bin hakîmiyeta xwe, di şerên talankeriyê yên li dijî împaratoriyên koledar ên Roma û Sasaniyên ku ji ber vê yekê ketibûn nav tengasiyên mezin de bi hêsanî bi ser ketin. Îslamiyet, tevî karektera xwe ya fetihkar, ji aliyê gelên di bin çewisandina (zilm û zor) rejîmên koledar de bûn, weke ku quweteke rizgarker be hat pêşwazîkirin.Lê, piştî bi pevajoyeke kurt, wexta ku bi maskeyê Îslamiyetêtalanên Ereban zêde û berbelav bûn, gelên Rojhilata Navîn dest bi tevgereke berxwedanê ya mezin kirin. Dînên xwe yên neteweyî bi Îslamiyetê re têkel kirin û mezhebên xwe çêkirin. Gelan, ev mezheb weke îdeolojiyên berxwedanêbi kar anîn û welê bi hêsanî teslîm nebûn. Tevî vê, feodalîteyê ji ber ku di vê serdemê de roleke pêşver û dilîst û şiklê hilberînê yê nû yêçînên kedxwarêli bajar û çolterê ji bo berjewendiyên xwe hê baştir û di cih de didît û ji ber vê yekê berê xwe da bû nokeriya bi Ereban re, ev berxwedan bi binketine. Împaratoriyên feodal-mêtinger ên Ereb ên ku hatibûn avakirin, heta sedsala XI. Erebkirin û feodalbûn di zikhev de pêş xistin û pêşketina gelên di bin hegomonyaya xwe de radigirtin, asteng kirin.

Civaka feodal û mêtingeriya feodal ku di hegomonyaya Ereban de hatiye pêşxistin, li Rojhilata Navîn herî zêde li ser Kurdan tesîra xwe nîşan da. Faktora ku di derketina meydanê ya vê encamê de bi roleke girîng rabûye ew e ku, erdên berhemdar ên ji bo pêşketina feodalîzmê dest didan li Kurdistanê bûn û Ereb cîranên Kurdan bûn. Fetihkirina Kurdistanê di sala 640'î de dest pê kir.Piştî ku Romî li Qadisiyê têk çûn, tevî ku Kurdan li ber xwe dan û pir xwîn rijandin, zêde di ser re dem derbas nebû talana Ereban pêk hat. Li herêmên ku fetih kirine, mîritiyên feodal ên bi eslê xwe Ereb an jî Kurd bi rêxistin kirin û li aliyekî feodalîzekirina civakê, li aliyê din jî hegomonyaya mêtingeriya Ereb a feodal li gel hev meşandin. Li Kurdistanê feodalbûn, mêtingehbûn û Erebûn hev temam kirin û pêş ketin.

Di hakîmiyeta mêtingeriya Ereb a feodal de di nav pêkhateya (yapı) civaka feodal a ku li Kurdistanê çêkirin de, tebeqeyeke biquwet a Erebû alîgirê Erebûnê çêbû. Ev tebeqaya ku nirxên neteweyî yên Kurdan biçûk didît, ziman û çanda Kurdî ku heya wê rojê di nav dewlemendiyeke mezin de pêş ketibû li aliyekî danî, ji bo ziman û çanda Erebî bi rola ajantiyê rabû. Jixwe, menfeatên(berjewendî) çînî yên vê tebeqayê jî ev hewce dikir. Riya bûn mîr, beg di Erebûn û bûn xizmetkarê xelîfeyên Ereb re derbas dibû. Wekî ku ev hemû îxanetên neteweyî, pêwîstiyen dîna îslama pîroz bin, gel jê agahdar dikirin û qederekê jî di vê de serkeftin hat bidestxistin.

## 2- Serdema Ku Hegomonyaya Biyanî Zeîf Bûye

**a**) Pêşveçûna serbixwe ya sed salî: Feodalîzm li Kurdistanêji nîviya sed sala VI. heya bi sedsala IX. di bin hegomonyayeke şidayî ya Ereban de pêşve çû. Ji vê dîrokê pêde, ji ber ku li Başûr hakîmiyeta Ereban zeîf bibû û li Rojava împaratoriya Bîzansê rojên xwe yên zeîf dijiyan û li Rojhilat hê tevgereke talanê xuya nedikir, li Kurdistanê şert û mercên derve yên pêşketineke feodal derketin meydanê. Bo mînak, Kurdên Merwanî dewleteke feodal ku sinorên wê ji Wanê dest pê dikir û heya bi Rihayê digirte nav xwe û zêdetirî sed salî jiyaye ava kirin û hin mîritiyên Kurdan jî, dîsa ji vê pêvajoyê pêde hema bêje weke dewleteke serbixwe jiyana xwe domandine.

**b**) Êrîş û talanên Tirkan li ser Kurdistanê û têkoşîna li dijî van êrîşan: wexta ku di sed sala XI. de êrîşên Tirkan dest pê kirin, li Rojhilata Navîn li ser gelan pêvajoyeke nû ya çêwisîn û kedxwariyê dest pê kir. Tirkên ku qewmekî talanker ê nû bû, di merhaleya jor a barbartiyê de dijiyan û bi koçberî û talankeriyê debara xwe dikirin. Ji ber vê yekê qewmekî timî di nav rêxistinbûneke leşkerî de û di êrîşê de bûn. Ji sed sala IX.pêde ji ber zêdebûna şêniyê, tengavkirina Çînê û ji ber her ku diçe zêdebûna hişkesaliyê, (kuraklık) warê xwe yê li Asyaya Navîn terikandin û ber bi bakur û başurê Xezarê ve, ber bi Nîvgirava Hîndê ve dest bi êrîş û tevgereke mezin kirin. Van êrîşan, ku ji bo şaristaniya cihnîştî xetereyeke mezin bûn, cihê tê re derbas dibûn hilweşandin û talan kirin.

Tirkan, bi Erebên ku ji beriya wan li Rojhilata Navîn hegomonyaya xwe ava kiribûn û Îrana li ser riya wan bû jîdi bin destê xwe de digirtin ve dest bi şer kirin û li dijî îdeolojiya wan li ber xwe dan; lê belê ji ber faktora misilmanbûna gelên Rojhilata Navîn, ji bo domandina xebatên xwe yên êrîşê, diviyabû bibûna misilman. Tirkên ku fêm kirin amûra îdeolojîk a herî dest dayî, bi taybet di fetihkirina gelên Xiristiyan de Misilmantî ye, bi awayên girseyî bûn Misilman. Tirkan, dema ku karektera fetihkar a Îslamê bi taybetmendiya wan a êrîşkar re bû yek, weke qewmekî hegomon ê heya bi Ewrûpaya Navîn belav bibûna li ser dîka dîrokê cihê xwe girtin.

Sîstema siyasî ya kuTirkan li Rojhilata Navîn ava kirine, xwediyê dîmeneke (görüntü) kompleks e. Tirkên ku di destpêkê de weke leşkerên bi maaş(mûçe) ên xelîfeyên Ereb dixebitîn, dema ku xelîfeyan hêza xwe wenda kir, hêdî hêdî dest pê kirin di nav împaratoriyê de bi tesîr bin. Di derketina meydanê ya encameke wiha de faktorên weke; di nav rêxistinbûneke timî ya leşkerî de bûn, zêde zêde hatina koçberên nû û karektera fetihkar a herî baş temsîlkirina wan jî, bi tesîr bûne. Dîsa, êrîşên Bîzansên Xristiyan dibû sedem ku li şuna Erebên ji hêzê ketine, pêwîstiya bi qewmekî êrîşkar ê ku hêzeke nû bû derkeve pêş. Dema hem û ev faktor dihatin gel hev, ji bo kuTirk nebin qewmê efendî yê nû yê Rojhilata Navîn ti sedem neman.

Di navbera sed salên XI-XII. De ji beşeke mezin aTirkên ku hêza herîmezin a Rojhilata Navîn pêk dianîn, di nav rêxistinbûna dewletê de wezîfe distandin û debara xwe dikirin.Yên din jîbi piranî, erdên ku di destê gelan de bû bi darê zorê desteser kirin û begitî ava kirin.Beşeke

pir kêm jî bûn serf. Lê belê zêdebûna koçberan, bû sedem ku hejmaraTirkmenên ku dihatxwestin bihatana kirin serf, jiTirkên cihnîştî û beg zêdetir be.

BihêzbûnaTirkan di qada siyasî û leşkerî de, helîna wan a di nav gelên cihnîştî de asteng nekir. Ziman û çandên hêzengînên gelên cihnîştî, şêniya wan a hê zêde û şiklê hilberînê yê pêşketî, li pêşberê ziman û çanda hê kêm pêşketîtir a qewmênTirk û şêniyaTirkan a hê kêmtir û şiklê hilberînê yê zede paşde mayî, raserî (üstünük) xist destê gelan û di nav sîstema xwe deTirk helandin. Yanî maneyê vê ew e ku yên di vê merhaleyê de bi ser ketine, têkçûne.

Ev pêvajo ku di giştiya Rojhilata Navîn de di hegomonyayaTirkan de hat jiyîn, bi şiklekî hê kûrtir liKurdistanê jî hat jiyîn.Ji ber ku di Kurdan de civaka feodal û cihnîştî bihêz bûûqebîle û eşîr şerker bûn, vê rewşêheya bi sed sala XVI. derfet neda Tirkan ku li pêşberê Kurdan raseriyeke misoger bi dest bixin û Kurdan bixin bin otorîteyeke merkezî. Dewletên Tirkan ku ji sedsala XI. heya sedsalaXVII. li Kurdistanê bi awayekî belawela hatibûn avakirin, bi piranî ji sîstema begitiyê derbas nebûn. Bi ser de jî, ev begitiyên ku tenê li hin herêman hatibûn avakirin, çawa ku nekarîbûn li beranberê êrîşên eşîrên Kurdan xwe ragirin herwiha şêniyaTirk jî nekarî ku di demeke kurt de ji helîn û Kurdbûnê xwe rizgar bikira. Rewşa Akkoyunlu, Karakoyunlu, Artukoğulları, Atabek û begitiyên din jî wiha bû. Tevî ku di aliyê siyasî de di navbera Kurd ûTirkan de ferq û cudahiyeke cidî nebû, di qada civakî de bi misogerî tewazin (denge) bi aliyê Kurdan ve bû. Hakîmiyeta Tirk çawa ku di merheleya Selçukiyên Mezin ên Tirk de bisazînebûye, ku di vê merhaleyê de Kurdistan wekî eyaleteke xwe lê kiribûn, ji bûn otorîteyeke şidayî ya navendî jî pir dûr bû.

Pêkhateya civaka feodal a Kurdistanê ku ji nîviya sed sala VII. heya sala IX. di bin hegomonyaya Ereban de çêbibû, ji sed sala IX. sînordarbe jî, heya bi sed sala XI. bi şiklekî serbixwe pêş ket û ji sed sala XI. heya bi sed sala XVI. di nav pêvçûneke timî ya biTirk û Moxol’an de kemiliye. Ev merhaleyên ku feodalîzmê tê de şikil girtiye, di dîroka Kurdan de bi piranî temsîla rûpeleke pêşver û dikin. Tevgera gel bûn û ji xwe re war girtinê, di serdema feodal de hê jî bilêz bû û têgînên “Kurd” û “Kurdistanê” belavî derdorê bûn.Kurd ku weke gelekî ku li cihekî kilît ê Rojhilata Navîn dijiyan û tesîra wan a siyasî zêde bibû, di bûyerên cur bi cur ên leşkerî û siyasî de bi roleke girîng

rabûn. Kesên weke Selahatînî Eyubî, ku di qada leşkerî û siyasî de deha bûn derketin. Eger, ev tesîrên erênî bi bûn quweteke merkezî-siyasî ya Kurdan bihatana temamkirin, bêguman dîroka wan a paşê wê bi şiklekî din bibûna. Kurd, tevî vê rewşê, ji beriya ku di sed sala XVI. de di navberaTirk û Îraniyan de bi şiklekî misoger parçe bibin, hema bêje weke mîr û begitiyên weke dewletên serbixwe tevger dikirin û di aliyê pêşketina neteweyî de ji gelek gelên wê serdemê di rewşeke hê pêşketî de bûn. Tevî kuhê zêde di nav tebeqeya hakim de bi şiklekî berbalav Erebî dihate bikaranîn, di vê serdemê de ti tesîra ziman û çanda Tirkan nebû. Ziman û edebiyata Kurdan, ber bi dawiya serdemê ve xwediyê wê hêzê bû ku hozanekî weke Ehmedê Xanî û destaneke neteweyî ya weke Mem û Zînê biafirîne.

## 3-Di HegomonyayaTirk û Îraniyan De Kurdistan

**a**) Kirina du parçeya Kurdistanê û encamên siyasî yên vê: Di dîroka Kurdan de çûna ser bi jêr, ji sedsala XVI. pêde bi bûna du parçe ya Kurdistanê û bi pêşketina otorîteya feodal a navendîya Tirk û Îraniyan ku dest bi avabûnê kiribûn, dest pê kiriye.

Tirkên nekarîbûn erdên ku gelên misilmanên Rojhilata Navîn li ser dijiyan ji xwe re bikirana cih û war û ji helîna di nav van gelan de xwe rizgar bikin, bi awayekî zêde zêde herîkin Anatoliyagelên Xiristiyan li ser dijiyan. Heya bi pêkanînên weke tevkujî, bi darê zorê Misilman kirin û Tirk-kirina Xiristiyanan û koçberiya her ku diçûzêde dibû, şêniyaTirk li Anatoliyê anî rewşeke raser (üstün). Dewleta Tirk a Osmanî ku piştî hilweşîna dewleta Tirka Selçukiyên Anatoliyê li derdora Bursayê hatibû avakirin, ji sedsala XVI. pêde heya bi ber sînorên Kurdistanê sînorên xwe berfireh kir. Di vêsedsala de sê hêz hebûn ku li ser Kurdistanê şer dikirin: dewleta Memluk a Misir ku Başur kiribû bin tesîra xwe, dewleta Safevî ya Îraniyan ku di 1502’an de hatibû avakirin û li beşeke mezin a Kurdistanê kontrola xwe pêş xistibû û dewleta Tirk a Osmanî ku dixwest li Kurdistanê hogomonyaya xwe pêş bixe. Kurdistan ku di nîviya herêma ku riyên karwanên ji rojava ber bi rojhilat ve û ji başûr ber bi bakur ve diçûn de cih girtibû, ji bo her sê dewletan jî xwedî girîngiyeke stratejîk bû. Ew hêza ku bibûya xwediyêKurdistanê, di wê serdemê de, wê bibûya

xwediyêriyên tîcaretê yên di navbera parzemînan de jî. Ji ber vê yekê, di navbera van her sê dewletan de li ser Kurdistanê têkoşîneke hegomonyayê ya mezin dest pê kir.

Osmaniyên ku di vê têkoşînê de ji bo Kurdan rola tamponê difikirîn, li Kurdistanê di pêşberê tewîzên mezin de, hema bêje statûya dewleteke ji derve girêdayî û ji hundir ve azad dan mîritiyên Kurdan û ji wan beşeke mezin kişandin aliyê xwe. Îdrîsî Bitlisî ku di vî şerî de weke ajanekî Osmaniyan tevgeriya jî, ji bo ku Kurdistan bi vî şiklî bi Osmaniyan ve were girêdan alîkariyeke mezin da. Ji bo sultanê Osmaniyan, ku begitiyên Kurdan û herwiha eşîrên Kurdan ên şerker bi aliyê xwe ve kişandibûn, dewleta Safevî ya Îraniyan û dewleta Memluk a Misir ji Kurdistanê qewitandin zêde zehmet nebû. Ji destpêka sedsala XVI. pêde hêza ku li Kurdistanê dest bi berfireh û berbelavbûnê dikir Osmanî bû. Tesîra Îraniyên ku di şerên destpêkêde binkeftibûn jî, bi parçeyekî biçûk êKurdistanê sînordar ma. Osmanî û Îraniyan, di têkoşîna hakîmiyetê ya di nav hev de ji bo ku berjewendiyên (çıkar) xwe yên rastîn veşêrin û gelan bi hev bidin qirqirin, di vê pêvajoyê de nakokiya Sunîtî û Elewitiyê ya ku beriya niha hatibû afirandin gur kirin.

Împaratoriya Osmanî, di merhaleya ku feodalîte di asta cîhanî de ketiye pêvajoya paşketinê û kapîtalîzmê li rojavayê Ewrûpayê weke şiklekî nû yê hilberînê dest bi pêşketina xwe kiriye de bilez dest bi pêşketinê kiriye. Ev împaratorî ji ber van sedeman, ji aliyê dîrokî ve dewleteke paşver û ye.Rastiya objektîf ku ev karektera paşver û pê daye qezenckirin ev e; têvîku kapîtalîzma Ewrûpayê pêş diket, wê hewl da ku pêkhateya civaka feodal li Ewrûpa û Asyayê bi darê zorê li ser lingan bigire. Feodalîzm, ji aliyê dîrokî ve ji sedsala XV.pêde ketiyê pevajoyê paşketinê. Tirkên Osmanî ku ji vê dîrokê pêde li beşeke mezin a cîhanê temsîla feodalîzmê kirine û timî hewl dane ku vê pêkhateyê li beranberê kapîtalîzma li Ewrûpayê pêş diket li ser lingan bigire, di dîrokê de ne roleke pêşver û lêbi roleke paşverû rabûne. Dema ku bi awayekî objektîf li ser vê rewşê, karektera talanker a fetihênTirkan jî tê zêdekirin, hê jî girîngiya vê rola paşver û zêde dibe.

Dewleta Osmanî ya feodal-dagirker a merkezî, nehiştiye ku civakên feodal ên Rojhilata Navîn, hem bi dînamîkên navxweyî û hem jî bi tesîra pêvajoya kapîtalîzma pêşver û ber bi kapîtalîzmê ve pêş bikevin.Yek ji gelên ku herî zêde ketiye bin vê tesîra neyînîya dewleta

Osmaniyan jî Kurd in. Hakîmiyeta Osmanî ku ji sedsala XVI. pêde pêşketiye, ji ber peymanên (anlaşma) ku destpêkê bi begên Kurdan re hatine çêkirin, bi taybet di qada ekonomîk û çandî de zêde nikarîbû tesîra xwe bike. Lê, li aliyekî ji ber zêdebûna quweta otorîteya merkezî, li aliyê din tesîra barê ku neserkeftîbûna şerên fetihan zêde kiribû, her ku çûyî li ser Kurdistanê hegomonyaya Osmaniyan zêde bû. Rêveberiyên Eyaletan hê zêde bi şiklê rêveberiyên sancaqan, rêveberiyên sancaqan jîhê zêde bi şiklê rêveberiyên navçeyan hatin rêk û pêkirin û begênTirk-Osmanî jî kirin berpirsiyarên wan û bi vî şiklî otorîteya merkezî hat gihandin asteke bisazîbûyî. Bi vê sazîbûyinê (kurumlaşma) re mêtingeriya Tirk afeodal jî dest bi pêşketinê kir. Ji ber ku li Kurdistanê hê zêde rêveberin Tirk bi cih bûn, cih bi cih koloniyênTirkan derketin meydanê. Bi pêşketina rêveberiya Tirk re, otonomiya hundirîn ku di destê begên Kurdan de bû, dest pê kir hêdî hêdî ji destê wan were derxistin. Berxwedanên begên Kurdan ên ku paşê pêş ketine, timî ji bo dûbare bidestxistina wê otonomiya hundirîn (xweseriya hundirîn) bûye.

**b**) Di sedsala XIX. de têkoşîna li ser Kurdistanê: Împaratoriya Osmanî ku di nîviya duyemîn a sedsalaXIX. de tevî kuli Ewrûpayê şoreşa sanayiyê pêş ketibû, ket merhaleyeke timî paşde çûnêûdest pê kir li gel sîstema xwe ya ekonomîk, sîstema xwe ya leşkerî û hiqûqî jî biguherîne. Sultanên Osmanî ji bo ku karibin li beranberê Rojava xwe ragirin, pêwîstî bi xwe nûkirinê didîtin. Li şuna artêşa yeniçeriyan ku ji dewşirmekirina ciwanên her neteweyê hatibû pêkanîn, vê carê artêşên ku tenê ji ciwanên gelên misilman pêk dihatinên weke Nizam-ı Cedît, Askar-ıMansureyi Muhamediye ava kirin. Bi Tanzimat Fermanı û bi peymana tîcaretê ya di 1840'î de bi Îngilîzan re hatiye çekirin, ketin ser riya mêtingehbûnê. Di van deman de ji boTirkên Osmanî pirsgirêka herî girîng ew e ku; weke dewletekê li beranberê dewletên kapîtalîst ên Rojava hebûna xwe biparêze û bi van dewletan re hevkarî bike û herwiha li ser gelên ku di bin hegomonyaya xwe de digire kedxwariya feodal û kedxwariya kapîtalîst li gel hev bimeşîne.

Timî bi binkeftin û paşve kişîna Osmaniyan, nebû sedem ku çewisîn û kedxwariya li ser gelên di bin hegomonyaya xwe de digirin kêm bikin; berevajî, bû sedem ku hê jî zêde bikin. Ji ber ku; kapîtalîstên Ewrûpayî û kêm neteweyên ku hêdî hêdî nirxa zêde bi dest dixistin împaratorî ber bi îflasê ve dibirin. Ji bo ku karibe li ser lingan

bimîne, ji bo împaratoriyê, ji zêdekirina çewisîn û kedxwariyê cudatir ti riyên din nemabûn. Împaratorî di encama van pêkanîn de, di sedsala XIX. de bi berxwedaneke mezin a gelan re rû bi rû ma. Alîkariyên Rûsya, Îngilîzîstan û Fransa ku çavkaniya xwe ji nakokiyên wan ên berjewendîperest digirtin, ber bi salên 1840'an ve Împaratoriya ku hatibû li ber parçebûnê ji vê rewşêrizgar kir.

Di sedsala XIX. de dest pê kiriye dîroka cîhanê bi hezar tayî bi dîroka Ewrûpayê ve were girêdan. Ev sedsalaji bo Kurdan jî bi bûyer û pêşketinên girîng ve dagirtiye. Ekonomiya feodal ku heya vê dîrokê têra xwe dikir, ji metayên erzan ên ku jibazara Ewrûpayê dihatin bi tesîr bû. Du encamên girîng ên îxraca metayê derketin holê: Ya yekemîn, di encama îxraca metayê de, weke xeleka navbeynkar ji kêmneteweyan, bi taybet ji Ermen û Ruman tebeqayeke komprador çêbû. Ya duyemîn jî, zeneatkariya ku di navbera xwe û ekonomiya li çoltereyê (kırsal) de tewazineke diyar çêkiribû, hilweşiya.Van her du encaman, encameke seyemîn derxist holê: Kurdistan jî di navê de, pêkhateya civaka feodal ku împaratoriyê xwe dispartê, ket pêvajoyeke di halê xwe de mayin û aramiyê. Ji ber ku di qada tîcaretê de kompradorên kêm neteweyan hakim bibûn, li bajaran zeneatkarî hilweşiya, kapîtalîzm di nav gelên misilman de dereng pêş ket û di heman demê de di nav gelên Xiristiyan de zûka pêşketina kapîtalîzmêbû sedem ku ev gel zûka şiyar bin. Di vê de, rola kompradorên ku dibûn burjuwaziya tîcaretê ya milî jî heye.

Li Kurdistanê li aliyekî karektera împaratoriyê ku pêşketina kapîtalîzmê asteng dikir, li aliyê din ji ber ku li şuna zeneatkariya ku di encama îxraca metayê de hilweşiyabû lêdi maneya herêmî-neteweyî de burjuwaziyeke komprador, tîcarî û bujuwaziyeke sanayiyê çênebibû, pêkhateya civaka feodal ket pêvajoyeke di halê xwe de sekinînê û ev rewş her berdewam kir. Hem mercên ji der ve û hem jî mercên hundir, di sedsala XIX. de derfet nedan ku li Kurdistanê feodalîzm hilweşe.

Li aliyê din, bi şoreşa sanayiyê (sanayî) re Îngilîzîstan û Fransa ku dewletên kapîtalîstên Ewrûpayê bûn, dest bi tevgereke mezin a mêtingehkirinê kirin; hêdî hêdî çav berdan Rojhilata Navîn û Kurdistanê jî. Dîsa, Çartiya Rûs ku di nav hewldaneke temam a berfirehbûneke emperyalîst de bû jî, ji bo ku riyên tîcaretê yên di destê Îngilîzîstanê de bi dest bixe, plansaziya ber bi başûr ve berfirehbûnê, yanî plansaziya li ser Kurdistanê hegomonyaya xwe avakirinê pêş xist.

Bi vî şiklî li ser her du hêzên klasîk ên kevin Osmanî û Îraniyan ku li ser Kurdistanê pev diçûn, di sedsala XIX. de Îngilîzîstan, Fransa û Rûsyaya Çartiyê jî zêde bûn. Di encam de hejmaradewletên emperyalîstên ku li ser Kurdistanê şer dikirin gihîşt pêncan. Di navbera van hêzên ku dixwestin tesîra xwe ya li Kurdistanê li dijî hev zêde bikin de, timî nakokî û pevçûn pêş ketin. Di bingeha siyaseta vê pêvajoyê ya Îngilîzîstanê de ev hebûye; ji boku nehêle Rûsya dakeve herêmên sûda wê tê de heye, timî hewl daye Împaratoriya Osmanî li ser lingan bigire û di bin sîwana Osmanî de li ser gelên Rojhilata Navîn kedxwariyê bimeşîne. Îngilîzîstanê, ti car nexwest Împaratorî ji hev bikeve û belav be. Ji ber ku, her ku împaratorî li ser lingan bimaya dihat wê maneyê ku berjewendiyên Îngilîzan jî di bin ewlekariyê de ne.

Di negihîştina serkeftinê ya berxwedanên Kurdan ku di seransera sed sala XIX. de xwe gihandine asteke bilind (1831-35 Rewanduz, 1842 Bedînan, 1842-48 Bedirxan Beg, 1856 Yezdan Şêr, 1879 Bedirxanî, 1881 serhildana Ubeydullah û hwd.) di serî de para polîtîkayên Îngîlizîstanê û para polîtîkayên dewletên emperyalîst mezin e. Eger di şert û mercên wê rojê yên dîrokê de ev berxwedan bi serketana, wê bi avabûna dewleteke feodal a merkezî ku di pêvajoya netewebûnê de rola qirase bilîstana, encam bibûna. Ji ber vê sedemê, ev berxwedan xwediyê karektereke pêşver û ne. Tiştê ku karektera pêşver û dida berxwedanan ew bû ku, li dijî çewîsina feodal a Osmanîbûn; eger bi serkeftana ji bo pêşketina kapîtalîzmeke neteweyî wê derfet amade bikirana. Eger burjuwaziyeke tîcarî ku xwe dispêre karektereke herêmî derketiba meydanê, ji bo ku tevgera têkoşîna rizgariya neteweyî bi pêşengiya burjuwazî pêş bikeve jî, wê bibûya sedem ku derfet peyda bin. Mixabin, ji ber têkçûna van tevgeran, bûye sedem ku pêşketina kapîtalîzmê li Kurdistanê bi qasî sed salî dereng çêbibe. Dîsa, ji ber ku ev kapîtalîzm jî kapîtalîzmeke emperyalîst dagirker ku karektera xwe ya pêşver û ji mêj ve wenda kirîbû, encamên pir xirab derketine meydanê. Di sedsala XIX. de ji bo Kurdistanê pirsgirêka esasî ew bû ku, çînek burjuwa ya herêmî derneketibû meydanê. Eger berxwedan bigihîştina armanca xwe, wê çîneke wiha pêşketana.

Di dawiya sedsala XIX. de împaratoriyên Osmanî û Îranê ku bibûn nîv-mêtingeh, di heman demê de tesîra wan li ser Kurdistanê pir zeîf bibû. Ev her du împaratoriyên di merhaleya belavbûnê de bûn, tenê dikarîn ji ber hesabên hevsengî (denge) yên di navbera hev de ji xwe re

derfetên jiyanê peyda bikirana. Di destpêka sedsala XX. de her du blokên emperyalîst ji bo ku cîhanê ji nû ve par ve bikin, ji bo şerekî misoger xwe amade dikirin. Li gorî çarçoveya van planênemperyalîst ji nû ve parvekirina Kurdistanê jî wekî neçariyekê dihat dîtin.

## C-Di Nav Sîstema Emperyalîst De Kurdistan

### 1- Şerê Parvekirinê Yê I. Ê Emperyalîst û Ji Nû Ve Parçekirina Kurdistanê

Emperyalîzma Alman, paşê, girêdayî bi zagona pêşketina newekhev a kapîtalîzmê ve pêşketineke mezin çêkiriye: li gorî asta hêza xwe ji nû ve parvekirina cîhanê xistiye rojevê. Lê, Fransa û Îngilîzîstan ku beriya vê di navbera xwe de beşeke mezin a cîhanê parve kiribûn li dijî vê yekê der derketin. Yekane amûra parvekirinê, şer bû.

Beriya ji şer bloka ku pêşkeşiya wê Îngilizîstanê dikir, ji bo parvekirina împaratoriyên Îran û Osmanî ku her kêliyê belavbûna wan mumkîn bû, planên parvekirinê pêş xistin. Li gorî van planan, Kurdistan di navbera Îngilîzîstan û Fransayê de wê bihatana parvekirin. Ji bo Ermenîstana ku avakirina wê hatibû plankirin jî, beşeke girîng ê herêma bakur hatibû veqetandin.

Tirkan, di şer de li gel Almanan cih girtin. Sedema vê, têkiliyên ekonomîk –mînak riya trenê ya Haydar paşa-Bexda kudi seranserêKurdistanê re derbas dibû- ku beriya vê li gel Almanyayê hatibûn pêşxistin, û ya herî girîng jî ew bû ku, doktrîna Turanîzmê ya pêşengên Îttîhat ve Terakîyê ku berdevkê burjuwaziya Tirk a burokrat-komprador bû û nû dewlet bi dest xistibûn, ji aliyê Almanyayê ve dihate teşwîqkirin.Li gel ku împaratorî wê ji aliyê Almanyayê ve bihatana parastin, dihate plankirin ku heya Asyaya Navîn hemûTirkên li cîhanê di bin siwana yek dewletê de werin komkirin jî.

Şerê Parvekirinê Yê I. ê Emperyalîstê ku hem û gelên cîhanê xistiye bin tesîra xwe û bûye sedema şiyarbûn û berxwedana gelan û bûyereke wekî Şoreşa Cotmehê ku di asta cîhanê de xwediyê girîngiyeke mezin e derxistiye meydanê, bi binkeftina Almanyayê bi dawî bû. Împaratoriyên weke Rus, Alman Awûsturya Osmanî, Îran jî ji

ser dîka dîrokê daketin. Bi şun de ew dima ku, li gorî xwestekên bloka ku pêşkeşiya wê Îngilîzîstanê dikir cîhan ji nû ve were parvekirin.

Pevçûn û xwe li hev rakişandina li ser Kurdistanê, ku ji aliyê împaratoriya Osmanî ve mîras hatibû hiştin, piştî şer jî berdewam kir. Tirkên ku ji nû ve dest bi şerekî rizgariya neteweyî kiribûn, bi xwe spartina mekanîzmaya dewletê ku ji împaratoriyê weke bermayî mayibû, hewl didan beşeke mezin a Kurdistanê di dest xwe de bigirin û di heman demê de Îngilîz jî li Başurê Kurdistanê ku di aliyê petrol de zengîn bû bi cih bûn. Fransiyan jî dest pê kirin derdora herêmên Dîlok, Riha, Mereş dagir bikin. Reîsên eşîran ên xayin û axayên feodal ku ji sed salan e vir de xizmetkarî û ajantî ketibû nav xwîna wan, jixwe nedifikirîn ku ji van mercên zêde zêde destdayî yên navdewletî feyde bistînin.Ji berdevkên neteweparêziya zeîf a Kurdan bû ku bi serhejmar girtinê (nüfus sayımı) û nexşe çêkirin û pêşkeşî emperyalîstan kirinê, wê karibin mafên gel bi dest bixin. Pêkhateya civaka feodal ku di halê xwe de mayî bû, derfet nedayibû ku çînek ku ji Şoreşa Cotmehê bi tesîr be bi pêş keve. Di van mercan de, jênerev bû, Kurdistan, ji aliyê dewletên mêtingerên empeytalîst ve li gorî asta qeweta wan were parvekirin.

Pêwîst e ev rewşa Kurdistanê ya ji nû ve hatin parvekirinê, bi aliyê sedem û encamên xwe ve hê bi şiklekî kûrani were lêkolîn kirin. BurjuwaziyaTirk di pêvajoya mêtingehbûna împaratoriya Osamanî de derket meydanê.

Di îxraca metayên ku piştî şoreşa sanayiyê li Ewrupayê zêde bûye de Kêm neteweyên Xiristiyan weke xeleka navberê hatin bikaranîn. Ev bû sedem ku, tîcaret, di nav gelên Misilman de paş bikeve û bi destê kêm neteweyên Ermen û Rûm bikeve. Tîcaretê, ji ber ku bi vî şiklî bi destê kêm neteweyan diket, ji bo ku burjuwaziya Tirk pêş bikeve hewce dikir xwe bisparta dewletê.Sultan, ku dixwestin împaratoriya li ser esasên feodal paş dikeve xelas bikin jî, neçar man di jora saziyên civakî de nûbûnê pêş bixin. Hin dibistanên leşkerî û tibî vebûn. Ev curê sazî di Împaratoriya ku bi peymana di 1840’an de bi Îngilîzîstanê re hatibû mohrkirin ketibû pêvajoya mêtingehbûnê de, dest bi zêdebûnê kirin.

Li aliyê din, burokratên alîgirên Rojava, bi ruşwet û komisyon wergirtinê her ku diçe mezin bûn û di pêşketina kapîtalîzma burokratîk de pêşengî kirin. Di vê pêvajoyê ku ji nîviya duyemîn a sedsala XIX. pê de bilêz bûye de, hêdî hêdî burjuwaziyekî Tirk derket meydanê.

Îdeolojiya neteweperest a burjuwaziya Tirk ku di nav dewletê de her ku diçe tesîra xwe zêde dikir jî, di vê pêvajoyê de derket meydanê û şikil girt. Ev îdeolojî ku di hembêza dewletê de mezin bibû, wê bi şiklekî xwezayî berê wê li parastina dewletê bûya. Neteweperestiya Tirk, ji beriya ku gelên Xiristiyan bi şiklê dewletên serbixwe xwe rêxistin bikirana, bi şiklê Osmanîperestî (Osmanlıcılık) derket. Bi vê feraseta (anlayış) neteweperestiyê ku ji aliyê wêjevanên (edebiyatçı) weke Namık Kemal, Şinasi, Ziya Paşa ve dihat temsîlkirin, hedef dihat kirin ku rewşa xwediyê ferq û cewazî ya bûn neteweyaTirk were berdewamkirin. Di vê pêvajoya ku gel bilêz şiyar bûn û dest bi têkoşîna serxwebûnê kirine de, vê neteweperestiya ku xwe dispart ferasetekê bê bingeh a weke “neteweya Osmanî”, bihêsanî deşîfre bû û şuna xwe ji şiklekî din ê neteweperestiyê re berda.

Çînên hakimên Tirk ku gelên Xiristiyan wenda dikirin, ji bo ku qet nebe gelên Misilman di destê xwe de bigirin, şiklekî neteweperestiya ku di bin kilifê“panîslamîzmê” de xwe vedişart afrandin. Hewl hat dayin ku bi taybet di dema AbdulhamîtêII.de ev neteweperestî were berbelavkirin. Lê, dema ku gelên Misilman jî serî hildan, vê îdeolojiyê îflas kir û vê carê dest pê kir neteweperestiyeke Tirk a nijadperest-şoven mezin bû. Ev neteweperestî ku di qada ekonomiyê de li gel biquwetbûna burjuwaziyê re mezin bûye, di nav Îttîhat ve Terakî Cemiyetî de bi şiklê rêxistinî îfadeya xwe dît.

Li pey hev binkeftin û timî erd wendakirina împaratoriyê, neçar hişt ku burjuwaziya burukrat û rewşenbîrên ciwan ên Tirk ji bo xwe warekî peyda bikin û sînorên vê diyar bikin. Burjuwayên burokrat û rewşenbîrên ku fêm kiribûn dema dewlet jî ji dest biçe wê bi temamî tine bibin, zûka li dewletê xwedî derketin û ji bo ku qet nebe li ser erdên maye neteweyeke Tirk biafirînin, bi qasî ji dest wan hat neteweperestiya nijadperest-şoven pêş xistin. Îttîhat ve Terakkî Cemiyetî, bû berdevkê siyasî yê vê neteweperestiyê. Îttîhat ve Terakkî Cemiyetî ku di salên ber bi Şerê ParvekirinêYê I. Yê Emperyalîst ve diç û de, bi çend derbeyan dewlet bi dest xist û bi teşwîqên emperyalîzma Alman jî, bi îdeolojiya neteweperest nijadperest-şovena ku şikla “Panturanîzmê” girtibû ket nav xiyalên hedefên emperyalîst. Îtîhat ve Terakkiyê ji pêşketina neteweperestiya Kurdan ku her çendî zeîf be jî di van salan de çêbibû re, heqê jiyanê nas nekir. Di salên şer de 600 hezar

Kurd bi darê zorê kir koçber. –piraniya wan li Torosan mirin-Dîsa, Ermen di tevkujiyeke mezin re derbas kir.

Piştî ku şer xelas bû rewşenbîrên Tirkên leşker-sivîl ên ku dîtin împaratorî ji hev dikeve û belav dibe, vê carê berê xwe dan neteweperestiyek ku pêşengiya wê Mustafa Kemal dikir. Ev neteweperestiya Tirk a ku bi navê “Kemalîzmê” tê zanîn li gorî “turanîzmê” hê realîst e. Vê neteweperestiyê dizanî ku ji bo ku erdên di şer de hatine wenda kirin ji nû ve wergire, wê quweta wê têrê neke; tenê dikare qadên ku artêşa Tirkhakim e biparêze û hêza wê têrê dike ku li ser vê qada ku jêre “mîsak-ı milî” tê gotin neteweyeke Tirk biafirîne. Ev neteweperestî, di heman demê de jî zemîna îdeolojîk a hakîmiyeta leşkerî, siyasî, çandî û ekonomîka ku li ser Kurdistanê bihatana pêşxistine.

Kemalîstên ku berdevkên burjuwaziya tîcarêtê ya milî bûn, bi pêşketina dagiriya Yewnan re, wexta fikirîn ku wê Anatoliya ku şêniyaTirk lê zêde ye jî wenda bikin, bilez xwe birêxistin kirin. Rêxistinên bi navê Doğu ve Batı Anadolu Müdafa-ı Hukuk Cemiyetleri ku ji bo parastina berjewendiyên herêmî li dijî kêmneteweyên Ermen û Rûm hatibû avakirin, bûn şiklê yekemîn ê rêxistinbûnên Kemalîst. Ev cemiyetên ku di kongreyên Sêwas û Erzeromê de bûne yek, li Ankarayê meclîseke bi navê “BMM” kom kirin û biryar girtin ku li dijî dagiriya Yewnan tewdîr werin pêşxistin û di vê navê de hikumetek ku xwe bisipêre vê meclîsê were avakirin. Berxwedana di pêşengiya vê hikumetê de li aliyekî li dijî sultanê li İstenbolê û li aliyekê jî li dijî dagiriya Yewnanê, bi şiklê rizgariya neteweya Tirk pêş ket. Kemalîstên ku destpêkê bi taybet ji bo kişandina reîs û şexên eşîrên Kurdan ev karektera xwe veşartibûn, dema ku serkeftin qezenc kirin nasnameya xwe bi temamîaşkere kirin. Helwesta Kurdan li beranberê şerê rizgariya neteweyaTirk, -li aliyekê dagiriya Fransî, li aliyê din ji ber hê jî ji bîrnekirina xetereya Rûs û Ermen- bi şiklê alîkarî dayinê bû. Nasnameya şelo ya Kemalîstan, dîsa propagandayên wan ên bi şiklê “hikumeta her du gelan” jî di dayina vê alikariyê de rol lîst.

Wexta ku tevgera rizgariya neteweyî ya Tirk ku li dijî dagiriya Yewnan serkeftin qezenc kiribû ji bo ku serkeftina xwe bi qada navdewletî bida qebûlkirin berdevkên xwe şandin Lozanê, pirsgirêka Kurd ji nû ve dikeve rojevê. Li pêşberê wê, Îngilîzîstan û Fransaya ku rasterast dest werdabûn pirsgirêka Kurd hebû. Van her du dewletan, di

salên şer de di asteke girîng de hêza xwe xelas kiribûn, di hundir de ji ber tevgera çîna karker pirsgirêkan wan zêde dibûn; dîsa ew quwet bi xwe re nedidîtinda ku leşkerên xwe yên li ser erdên berfireh ên mêtingehan radigirin bixin nav şerekî nû.YKSS'ê (Sovyetler Birliği), li beranberê Ewrûpayê alîkarî didaTirkiyê. Dema ku mercên navdewletî yên destdayî, bi awantajeke weke li hundir serkeftin qezenckirinê re bû yek, di têkiliyên dîplomatîk de qederekê destêTirkan xurt dibe. Herî zêde ji ber pirsgirêka Misûlê, bi Îngilîzan re pêvçûn derdikeve. Îngilîzên ku çav berdabûn rezervên petrolên dewlemend ên li vir, di têkoşîna li dijî Tirkan de heya dawiyê bi biryar bûn.Weke lîstokeke klasîk a Tirk û Îngilîzan, Kurd û Kurdistan, di navbera van her du hêzan de wekî piyonekî tê bikaranîn. Îngilîz, Kurdên di bin dagiriyaTirkan de û Tirk jî Kurdên di bin dagiriya Îngilîzan de li beranberê hev bi kar tînin, Kurdistanê pêşkeşê hev dikin û encax heya bi salên 1926'an li ser sînorên îro yên Kurdistanê li hev dikin. Bi vî şiklî parçebûna axên herî berhemdar ên Kurdistanê, li Lozanê tê tasdîqkirin û ev rewş heya roja me ya îro hatiye berdewam kirin. Tirk, li Lozanê bi vî şiklî xwe bi hem û neteweyên cîhanê didin nasîn û Kurdan û warê wan ku di şerê xwe yê rizgariya neteweyî de ji wan alîkariyên ji nêz ve girtine, li gel emperyalîstan di navbera hev de parve kirine.

Ji vê dîroka ku Kurdistan dabeşê çar parçayan bûye pê de heya roja me ya îro, li ser her parçeyê Kurdistanê mêtingerî bi dagirî, tevkujî û talanê hatiye meşandin. Dîroka Kurdistanê ya vê pêvajoyê, ji dîroka mêtingerîyê pêve netiştekî din e.

## Mêtingehkirina Kurdistanê Ji Aliyê KomaraTirkiyê Ve

Berdevkên ciwan ên burjuwaziya Tirkpiştî ku serkeftina li dijî Yewnan qezenc kirine li Lozanê bi qada navdewletî jî dan qebûlkirin, weke şiklê rêxistinbûna siyasî komar îlan kirin. Di bin banê rejîma komarê de, ji bo ku burjuwaziya Tirk pêş bikeve bi her şiklî tewdîr hatin wergirtin. Tîcareta ku ji aliyê kemneteweyên Ermen û Rûm ve dihat meşandin hat bidestxistin. Hem û xwestekên karker û gundiyan bi darê zorê hat tepisandin. Karektera şoven a rejîma nû, aşkere nîşan da

ku; çi xwestekên ku mafên kêmneteweyan û çi jî xwestekên ku mafên Kurdan tinîn ziman, hem û wê bi darê zorê werin çewisandin. Tevî hem û van tewdîran, burjuwaziya neteweyî ya Tirkçawa ku zede peş neket, bi ser de jî her ku çûyî karektera xwe ya neteweyî jî wenda kir.

Tişta sereke ku bûye sedema pêşneketina burjuwaziya neteweyî ya Tirk, hegomonyaya emperyalîst e. Di navbera her du şerên emperyalîst de xwe lihevrakişandina hundirîna dewletên emperyalîst, alîkariya ekonomîk ya YKSS'ê, di sala 1929'an de krîza mezin a kapîtalîzma cîhanî, polîtîkaya dewletperest a ku dihat pêkanîn, her çendî ji bo pêşketina kapîtalîzmeke Tirk a serbixwe hinekê derfet afirandibe jî, tirsa ji Şoreşa Cotmehê û dijminahiya ji bo karker û gundiyan, bû sedem ku burjuwaziya Tirk bilez û bez teslîmî emperyalîzmê bibe. Li welatekî ku ne serbixwe ye, derfetên pêşketina burwaziya neteweyî kêm in. Her çendî KomaraTirkiyê di nav pevçûna bi emperyalîzmêre de ava bûyibe jî, nekaribû heya bi serxwebûna temam ji emperyalîzmê ev pevçûn bihata berdewamkirin.

Bi taybet ber bi dawiya salên 1930'î cîhan ji nûve ber bi şerekî mezin ve hat rakişandin. Vê yekê, kapîtalîzma Tirk ji binî de dehfand gel emperyalîzmê. KomaraTirk ku polîtîkaya xwe ya dostaniya li gel Yekitiya Sovyetan ji mêj ve terikandibû di navbera Almanyaya Nazî û Îngilîzîstanê de hat û çû, hat û çû, di encam de pê karîbû da ku di Şerê Parvekirinê Yê II. Yê Emperyalîst de ji derveyê şer bimîne. Burjuwaziya ku bi bahaneya tewdîrên ji bo şer bi talanên ku rakiriye bi ser xwe ve hatibû, li beranberê nakokiya kûrbûyî ya di navbera sosyalîzm û kapîtalîzmê de, ji ketina bin tesîr û kontrola emperyalîzmê dudiliyeke herî biçûk jî nîşan neda. Li pêşberê avakirina sosyalîzmê û tevgerên rizgariyê yên neteweyî ku di asta cîhanî de pêş diketin, ji bo burjuwaziya Tirk, ji bûn nobedarê emperyalîzmê yê li Rojhilata Navîn cudatir ti riyê din nebûn. Leşker şandina wê ya li dijî gelê Koreyê, ketina wê ya NATO'yê, alîkariya Marshall'ê û peymanên bi DYE'yê re, belgeyên aşkerene ku teslîmî emperyalîzmêbûna wê nîşan didin. Peşverûtiya sînordar a komara Tirkiyê ya di salên avabûnê de, di hundir deji dijminahiya bi karker û gundiyan, û li dijî gelê Kurd pêkanînên heya bi tevkujiyan diçin re cihê xwe berdaye; li derve jî ji şerê li dijî sosyalîzma bi pêşengiya YKSS'ê û di tepisandina (bastırma) têkoşînên rizgariyê yên neteweyî yên gelên cîhanê de, ji bûn hevkarê herî baş ê emperyalîzmê re cihê xwe berdaye. Komara Tirkiyê, bi van

taybetmendiyên xwe yên heya rojame ya îro nehatine guherîn dewleteke paşver û ye.

Li Tirkiyê, ku piştî şerê emperyalîst ê II. bûye mêtingeha nû ya DYE'yê,(dewletên Yekgirtî yê Emerikayê) kapîtalîzma sanayiyê ya girêdayî emperyalîzmê–bi taybet sanayiya montaj, tekstîl û qut (gıda)-ya noker-tekdest dest bi pêşketinê kir. Ev pêşketina kapîtalîst ku bi derbeyên hikumetê yên 1960 û 1971'î hê jî bilez bûye, roja me ya îro li Tirkiyê ji krîzeke temama welê re rê vekiriye ku bi ti awayî nikare ji nav derkeve.

Îro, şiklê siyasî yê Kapîtalîzma Tirk, ku ji çêbûna xwe heya bi roja me ya îro girêdayî bi emperyalîzmê re pêşketiye, dewleta olîgarşîk e. Ev şiklê dewletê, ji îtifaqa burjuwaziya tekdest a noker, burjuwaziya burokratîk û xwedan erdên mezin, di qadên sanayî û malî de dewlemendên herî mezin–li gorî asta quweta wan- ku parlementarîzma burjuwa dike maske û hikumetên "lîberal" û faşîst weke maske bi kar tîne çêbûye.

Em, li ser van pêşketinên ku di pêvajoya KomaraTirkiyê de di qada ekonomîk û siyasî de çêbûne disekinin; ji ber ku ev pêşketin ji nêzîk ve bi hegomonyaya Tirk ku li Kurdistanê pêş dikeve ve eleqadar in.

Armanca neteweperestiya Kemalîst, ku esasên avakirina komarê daniye ew bû; di nav sînorên "mîsak-ı milî" de neteweyeke Tirk ku "bi welat û neteweya xwe veyekpare ye û nayê parçekirin" biafirîne. Netewe û kêmneteweyên cur bi cur ê di vê çarçoveyê de di nav tevgera netewebûnaTirk de werin asîmilekirin û tinekirin. Komara Tirkiyê bi vê îdeolojiya xwe ku di aliyêçarçove ya dîrokî, siyasî û civakî de dişibiya siyonîzma Îsraîl, nijadperestiya Başûrê Afrîka û Rodezyayê, ji ber zeîfbûna ekonomiya xwe, neçar ma ku beriya pêşîn di qada leşkerî de dest bi pêkanînên xwe yên li ser Kurdistanê bike.

Burjuwaziya Tirk di wê zanebûnê de bû ku; bêyî ku li ser Kurdistanê dagiriyeke leşkerî ya şidayî pêk bîne, nikare di qada siyasî, çandî û ekonomîk de mêtingeriyê pêş bixe. Ji ber vê yekê ye ku bi artêşa komarê ya nû ava kiriye, di navbera salên 1925-1940'an de dest bi tevgereke dagiriyê ya leşkerî ya xurt kir. Dema Kurd li bendê bûn Kemalîst wê soza xwe ya di salên şerê rizgariyê de dabûn pêk bînin, pêşketina vê rewşê, bû sedem ku li Kurdistanê reaksiyonên mezin werin nîşandayin . Ev tevgera dagiriyê ku ji bilî zêdekirina kedxwarî,

şovenîzm û zilm û zorê ti encamên din nedaye, hewl hat dayin ku weke “ tevgera şaristaniyê ya komarê ku li dijî Kurdên hov dimeşîne” were nîşandayin. Giregirên feodal ên eşîran, ku tevgera berxwedanê ya mafdar a gelê Kurd ji bo berjewendiya xwe bi kar dianîn, ji aliyê Kemalîstan ve, ji bo ku îdîaya xwe îsbat bikin weke delîlekê hatin nîşandayin. Xwe dispêre kîjan sedemê bila bispêrê, tevgerek ku îmhaya ziman, çand û heta hebûna fîzîkî ya gelekî dike armanca xwe, ne tevgereke şaristaniyê ye, encax dikare bibe tevgereke hovane.

Rêxistinbûna feodal-eşîrî ya Kurdan, zêde nekarî li beranberê rêxistinbûna artêşa modern a burjuwaziya Tirk xwe ragire û nedikarî ku xwe ragire jî. Tevî ku berxwedanên 1925’an ên Palo-Genç-Hanî, 1930 Agirî, 1938 Dêrsimê xwe gihandin astên bilind, nekarîbûn ji binkeftinê xwe xelas bikin.nSedemeke van binkeftinan jî ew bû ku, şert û mercên objektîf bi qasî ku tevgereke modern a rizgariya neteweyî pêş bikeve kamil nebibûn. Tirkan, ku YKSS’ê ji ber berjewendiyên giştî yên sosyalîzmê alîkariya wan dikir, ber bi 1940’an ve tevgera dagiriyê temam kirin. Şerê Parvekirinê Yê .ê Emperyalîst ku li hem û cîhanê bibû sedema pêşketina tevgerên rizgariya neteweyî, ji bilî Mehabadê li ser Kurdistanê bitesîr nebû. Tecrîda ku Komara Tirkiyêli ser Kurdistanê danîbû, ji bo pêşketina ekonomîk derfeteke herî biçûk nas nekirin û neketina wê ya şer, di derketina meydanê ya encameke bi vî şiklî de bi roleke bingehîn rabû.

Ji bo DYE’ê (Dewletên Yekgirtî Yê Emerika) ku piştî şer mêtingeriya nû li cîhanê pêş dixist, diviyabû ku Tirkiye û Kurdistan ji bo mêtingeriya nû bihatana vekirin. Mayina Kurdistanê di bin destê Tirkan de, li gel berjewendiyên DYE’ê ne nakok bû. Artêşa Tirk ku Kurdistan di destê xwe de digirt, di maneyekê de berjewendiyên DYE’ê jî diparast. DYE’ê ku li pişta gelek artêşên kukla bû, ji ber ku dikariya van artêşan ji bo berjewendiya xwe bi kar bîne, pêwîstî pê nedidît ku artêşa xwe ji bo mêtingeriyeke klasîk bi kar bîne. Ev, li gorî polîtîkaya mêtingeriya nû jî di cih de bû. Ji ber van sedeman; DYE’ê ku weke hevkarê herî nêzî xwe burjuwaziya Tirk hilbijartibû, di nav sînorên Komara Tirkiyê de mêtingeriya nû pêş dixist. Ji ber vê yekê, ji aliyê burjuwaziya Tirk ve jî pêşxistina mêtingeriya klasîk li Kurdistanê, bi hev re ne nakok e; berevajî hev temam dikin. Di vê pêvajoyê de, ekonomiyên bihêz mêtingeriya nû pêş dixistin û ekonomiyên girêdayî bi emperyalîzmêrejîtenê dikarîn mêtingeriya klasîk bidin jiyîn. Mînak,

Portekîzê, ji ber ku ekonomiya wê bi emperyalîzmê ve girêdayibû, ji polîtîkaya xwe ya mêtingeriya klasîk dest bernedida.

Qada razandinê (yatırım alanı) ya zêde dibû û hewcedariya tekdestên navdewletîbi bazar û madeyên xav, hewcadariya ku di şert û mercên mêtingeha nû de hê jî pêş diket a kapîtalîzma Tirk a komprador-tekdest bi keda erzan, madeyên xav, bazar, berhemên heywan û zîraetê, dema ku bi talebên beşdarbûna kedxwariya kapîtalîst a feodalên Kurd re bû yek ji salên 1960'an pê de di Kurdistanê de pêvajoya pêşketina kapîtalîzma biyanî bilez bû. Kapîtalîzma ku li Kurdistanê bi vî awayî pêş diket, li ser pêkhateya çandî (kültürel yapı) û civakî guherînên girîng çêkir. Îro, li Navîna Rojavayê Bakurê Kurdistanê ev guherînên ekonomîk, civakî û siyasî di bin şert û mercên giran ên asimilasyonê de pêk tên. Ji beriya ku em dest bi lêkolîna van bikin, emê bi xetên stûr mêtingeriya ku li ser parçeyên din ên Kurdistanê pêş dikeve lêkolîn bikin.

## Mêtingehkirina Başûrê Kurdistanê

Bi Peymana 1921'an a Enqereyê, beşek ji Başûrê Kurdistanê ket para Franseyê. Di wan salan de gelê Ereb di navbera gelek dewletan de nehatibû parçekirin. Franseyê, Sûriye û Lubnan bi rejîma mandeyeke şîrîk bi rêve dibir. Burjuwaziya komprador a Erebû Xiristiyan, di hakîmiyeta Fransî ku heya 1946'an berdewam kiribû de çêbû. Beyrut, di vê pêvajoyêde bi roleke merkezî rabû. Rêveberiya Fransî ku li ser bingeheke zeîf hatibû avakirin, berjewendiya hin gelên di hegomonyaya xwe de li ber çav digirt. Tevî ku Erebû Xiristiyan di qada siyasî de pêş diketin, ev derfet ji bo Kurdan nedihat naskirin. Dîsa jî, tesîra hakîmiyeta Fransî li ser Kurdan kêm çêbû. Ereban, ji ber ku hê ew bi xwe di hegomonyaya rejîmên mêtinger de dijîn, nedikarîn li ser Kurdan çewisandinê (baskı) pêş bixin. Partiya BAAS ku bi pêşengiya hin burjuwayên biçûk ên Ereb hat avakirin, weke berdevkê siyasî yê burjuwaziya Ereb, li dijî hegomonyaya Fransî têkoşîn pêş xist. Dema ku di vê pêvajoyê de zehmetiya pratîzekirina mêtingeriya klasîk li vê zêde bû, Fransî, ku Sûriye û Lubnan bi şiklê du dewletên cuda ji hev qetandibûn, neçar man di rêveberiyên van dewletan de nokerên (işbirlikçi) xwe bi cih bikin û paşde bikişin. Fransiyan, ji beriya ku paş

de bikişe Hatay'a ku beşeke mezin ji şêniya wê Ereb bû û ya mayî jî Kurd, Tirk, Çerkez bû bi dagiriya Kemalîstan re rû bi rû hiştibûn.

Bi paşde kişîna Fransiyan re, di nav dewleta Sûriyê de Ereb bûn neteweya hakim. Bi xurtbûna burjuwaziya Ereb re zilm û zora li ser Kurdan dest bi zêdebûnê kir.

Bi hatina ser îqtîdarê ya Baas'ê Şovenîst re –dişibiya CHP'ya li Tirkiyê-, planên weke ji kedxwariya Ereb re vekirina Kurdistanê, bi darê zorê bi cih kirina Kurdan li Başûrê Suriyeyê, projeya "kembera Ereb" û asîmilasyona kûr û giran hat pêşxistin. Kurd bi girêdana welatiyê (vatandaşlık) ne girêdayî dewletê bûn û weke kêmneteweyan lê dihate nêrîn. Partiya Komînîst a Revîzyonîst ya Suriye û Partiya Baas a Sûriyeyê ku îro bi hev re li ser desthilatdariyê ne, ji ber nakokiyên weke parvekirina ava Firatê, pirsgirêka Filîstin û Lubnanê, hin tewîz didin Kurdan û wan li gorî berjewendiyên xwe bi kar tînin.

Di encama peymanên 1923 Lozan, 1926 Bruksel ku Tirkiyê û Îngilîzîstanê di navbera xwe de çêkiribûn de, beşeke mezin a rojhilata Başûrê Kurdistanê ket kontrola (manda) Îngilîzîstanê. Hegomonyaya Îngilîzan, demeke dirêj li ser Îraqê berdewam kir. Îngilîzan di vê pêvajoya demdirêj de li ser Kurd û Ereban polîtîkayên cuda meşandin. Tevî ku Ereb derdixistin pêş, ji bo ku tesîra tevgerên rizgariyê yên Ereban kêm bikin –weke liTirkiyê bûye- li gorî berjewendiyên xwe di cih de dîtin ku qasî bi ser nekevin, pirsgireka Kurd zindî bigirin û alîkarî bidinê polîtîkayeke taybet (karekterîstîk) hegomonyaya xwe meşandin.

Potansiyela şoreşger a Kurdistanê, di ti pêvajoyên dîrokê de bi berjewendiyên Îngilîzan re li hev nekir. Îngilîzan pir baş dizanîn ku Kurdistaneke serbixwe, ji bo berjewendiyên Îngilîzan ên li Rojhilata Navîn wê bibe xetereyeke pir mezin. Kurdistana serbixwe, ku bi berjewendiyên çînên feodal û kompradoran ve li hev nake û ji ber vê yekê ji xwe gihandina pêkhateyeke demokratîk cudatir ti riyên wê yên din nîne, ji bo hem û polîtîkayên emperyalîzmê yên li Rojhilata Navîn jî xetereya herî mezin e.Kurdistanekku parçe parçe bûyî, dema ku emperyalîzm bixwazibe ji nokerên (işbirlikçi) xwe hê zêde tewîz bistîne û wan bike maşikên xwe, bikaribe Kurdistana ku weke amûreke şantajê bi kar bîne, ji bo berjewendiyên emperyalîzmê Kurdistana herî îdeal e. Dostaniya bi Kurdan reya dûr û ya çapemeniya emperyalîst jî, di rastiyê de xwe dispêre polîtîkayeke wiha.

Aliyê ku di bin hegomonyaya rejîma mandeyê ya Îngilîzan de timî tesîra wan dihat zêdekirin, Erebên feodal-komprador bûn. Îngilîz û beşên heya dawiyê bi wan ve girêdayî, çewisîn û kedxwariya xwe li ser Kurdistanê qederekê zêde kirin. Hê ji destpêkê dê berxwedanên ku di pêşengiya feodal û reîsên eşîrên Kurdan de li dijî vê çewisîn û kedxwariyê hatine pêşxistin bi şîrîkatiya van hêzan hat tepisandin. Ev berxwedanên ku wê li dijî Ereban bi hêsanî bi ser biketana, ji aliyê hêzên hewayî yên Îngilîzan ve bêtesîr dihatin kirin.

Piştî Şerê Parvekirinê Yê II.Yê Emperyalîst di asta cîhanê de ketina planê duyemîn a Îngilîzan, tesîra her ku zêde dibe ya welatên sosyalîst û tevgerên rizgariya neteweyî, di hundir de avabûna partiya Baas a Ereb û Partiya Demokrat A Kurdistanê, Partiya Komînîst A Îraqê Ya Şoreger ku berê hatibû avakirin, bû sedem da ku li Îraqê tevgera şoreşgerî dest bi pêşketinê bike. Wekî berhema destpêkê ya vê têkoşînê; Nûrî Seîd Paşa'yê ku di rewşa ajanê Îngilîzan de bû ji aliyê gel ve hat lînçkirin, Îraq gihîşt serxwebûna xwe û hikumetekî hê demokratîk hat sazkirin. Hikumeta Îraqê, ji Pakta Bexdayê ku bi armanca tepisandina têkoşînên rizgariya neteweyî ya gelên Rojhilata Navîn hatibû avakirin (CENTO'ya niha) veqetiya, ji Kurdan re jî soza hin mafên neteweyî û demokratîk da. Lê belê karektera şoven a burjuwaziya biçûka Ereban û berê xwe dayina dîkdatoriyê ya serokwezîr Qasim ku temsîla burjuwaziya Ereb dikir, bû sedem ku demokratîzebûna Îraqê asteng be û sozên ku hatibûn dayin Kurdan werin binpêkirin. Têkoşîna pêş diket a PDK, PKÎ û Partiya Baas'ê di sala 1968'an de dîsa bû sedem ku hikumetekî di aliyê şiklî de demokrat derkeve meydanê. Lê vê carê jî tesîra zêde a Baas'ê ya di nav îqtîdarê de, kir ku dîsa " şiyara Îraqa demokratîk, Kurdistana xweser" neyê pêkanîn. Karektera reformîst, nîv-burjuwa û nîv-feodal a PDK'ya Îraqê, dibû asteng ku ew berê xwe bide serxwebûnê û dibû sedem ku şiyara "Kurdistana serbixwe" hatiye rewşa ku eger ji bo wê şer were kirin dikare were qezenckirin paşguh were kirin. Ji van firsendên ku ji dest derketine şun de sedemên wekî, pînebûna bi emperyalîzmê ve ya PDK'ya Îraqê û bi riya tewîzdayina ji bo emperyalîzmê, cihê xwe qeyîmkirina Baas'ê, bû sedem ku di sala 1974'an de Kurd bi binkeftineke giran re rû bi rû bimînin. Heya ku pêkhateya eşîrî-feodal, ku reformîzm xwe dispêrê, bi emperyalîzm û mêtingeriyê re di rewşa

lihevkirinê de dimîne-wê bimîne jî- ne mumkîn e ku ti encamên din werin girtin.

Di roja me ya îro de, dîktaya Baas ku Partiya Komînîst a lraqê ya revîzyonîst bûye dûvikê wê, li Kurdistanê dagiriya xwe berdewam dike, Kurdan bi darê zorê koçberê Başûrê lraqê dike, hewl dide projeya “kembera Ereban” pêk bîne û di serî de petrol, dewlemendiyên Kurdistanê talan dike. Di bin van şert û mercan de ji bo gelê li vî parçeyî pirsgirêka bingehîn, ne ku bi şiyara “ji bo lraqê demokrasî û ji bo Kurdistanê otonomî” ku di pratîkê de bi caran îflas kiriye û bûye sedema zererên mezin şer bike;” ji bo hilweşandina bi her şiklê têkiliyên ekonomîk, çandî, leşkerî û siyasî yên li gel komara Ereb a Îraqê ji bo “Kurdistana serbixwe şer kirin, û xebatên îdeolojîk, rêxistinî, siyasî û leşkerî ku ev şer ferz dike bilez kirine.

## Mêtingehkirina Rojhilata Kurdistanê

Împaratoriya Îranê ku ji beriya Şerê ParvekirinêYê I. Yê Emperyalîst ji aliyê Îngilîzîstan û Çartiya Rûs ve biryara parvekirina wê hatibû girtin, piştî şer bi temamî ket pêvajoyeke belavbûnê. Li aliyekî di bin dagiriya Îngilîzan de parçebûna feodal pêş diket, lêli aliyê din hikumeta Sovyetê peymanên ku Çartiyê çêkiribûn qebûl nekir û alîkarî da tevgerên şoreşgerî yên ku bi şiklekî parçe parçe pêş diketin. Van mercan Îran dehf da nav rewşeke şoreş û dij şoreşê. Lê Riza Xanê ku hê bi hêztir bû, berjewendiyên axayên feodal û burjuwaziyê temsîl dikir; ji xwe re kiribû hedef ku artêşeke neteweyî ya merkezî avabike, dawî li parçebûna feodal bîne, ekonomiya welêt pêş bixe û tevgerên şoreşger tasfiye bike welat xist kontrla xwe. Xanedaniya Kaçar welat firot hêzên emperyalîst û bi talanên li ser pişta gel feydeyên mezin bidest xistin. Riza Xan ku nerazîbûnên gel baş bi kar dianî, di bin navê “Pehlevî” de ji xwe re xanedaniyeke nû ava kir û dubare Îran bi şiklê împaratoriyekê birêxistin kir. Împaratoriya ku rewşa serdestbûnê ya neteweya Farsparast û berpirsiyariya pêşxistina berjewendiyên axayên feodal û burjuwaziyê girt ser milên xwe, di Şerê Parvekirinê Yê I.Yê Emperyalîst de ji nû ve hat dagirkirin.

Di dawiyê şer de bi alîkariya Artêşa Sor, Komarên Azerbaycan û Mehabadê hatin avakirin. Ev her du komar, li ser bi paş ve kişana

Artêşa Sor bi desteka emperyalîstên ku alîkarî didan Îranê jî, ji aliyê Îran ve bi hêsanî ji holê hatin rakirin. Dema ku hewldanên Musadiq ên neteweyîkirina ekonomiyê, bi saya alîkariyên aktîf ên ClA'yê ve ji aliyê Şah Muhamed Riza ve hatin perçiqandin, Îran ket pêvajoya bûn mêtingeha nû ya DYE'yê. Şah ku rejîmeke bê eman a zilm û zorê ava kiriye, bi xism û karên xwe û axa burjuwakirinê, hewl dide hakîmiyeta xwe ya li Îranê bidomîne.

Aşkere ye, li Îrana ku Fars rewşa xwe ya bûn neteweya xwediyê ferq û cewazî diparêzin, gelên Azerî, Kurd û Belucî di bin çewisîna neteweyî û feodal de tên ragirtin, her ku mêtingeriya nû pêş dikeve wê rewş hê bêhtir jî xirab be. Di Îrana roja me ya îro de ku emperyalîzm, derdora şah, axayên feodal ên mezin û burjuwaziya noker (işbirlikçi) ku xwe dispêre sanayiya montajê li ser esasê berjewendiyên xwe li hev kirine, li dijî mêtingeriya nû ya ku li ser neteweya Fars pêş dikeve û li dijî mêtingeriya klasîk ku ji aliyêmonarşiya Fars ve li ser neteweyên Azerî, Kurd û Belucî tê pêkanîn, têkoşîneke şirîk a gelan pêş dikeve.

Ev têkoşîna li Îranê, wezîfeyên esasî yên Kurdên li Rojhilatê Kurdistanê, têkoşîna Kurdan a neteweyî ya serxwebûn û demokrasiyê, bi têkoşîna serxwebuna neteweyî û demokrasiyê ya gelên din re di cepheyekî de gihandina hev e. Têkoşîna serxwebûnê ya neteweyî û demokrasiyê ya ku Kurd li dijî axayên xayin ên feodal, emperyalîzm û xizmetkarê wê ku monarşiya Şah e pêş bixe, bi têkoşîna gelên Azerî, Fars û Belucî re hev temam dikin. Di vê têkoşînê de wezîfeya destpêkê, hilweşandina monarşiya Şah e.

Wekî encam, mêtingeriya ku li çar parçeyên Kurdistanê cuda cuda û di nav alîkariyeke diyar de wekî ku berjewendiyên hev li ber çav bigirin hatiye pêşxistin, heya ku têkoşîna Kurdistanê ya serxwebûna neteweyî û hevgirtina neteweyî înisiyatîfê neke destê xwe an jî heya ku di asta cîhanî de guherînek pêk neyê wê hê jî girantir be û her berdewam bike.

## ll-Taybetmendiyên Civaka Bakurê Kurdistanê

## Pêkhateya Ekonomîk:

Ekonomiya feodal a Kurdistanê di dema Osmaniyan de bi temamî ket pêvajoya sekinîn û di halê xwe de mayinê. Di bin zilm û zora her ku diçe ji aliyê Sultan û derebegên herêmî ve dihate zêdekirin de ne mumkun bû ku hêzên hilberînê pêş bikevin. Şert û mercên giran ên leşkerî û vergiyê, pişt li gundiyan şikenandi bû.

Îxraca meta ku piştî şoreşa sanayiyê berfireh bibû, zeneatkariya li Kurdistanê heye têkbiribû. Kurdistan ku heya salên 1850'an xwediyê ekonomiyek ku têra xwe bi xwe bû, ji vê dîrokê bi şun de serxwebûna xwe ya di qada ekonomiyê de wenda kir. Ji ber ku li şuna zeneatkariya ku ji holê rabibû, hilberîna manîfaktor û febrîqeyê pêş neketibû, ekonomiya feodal ku xwe dispêra çoltereyê cihê xwe hê jî qeyîmtir kir. Di îxraca metayan de wekî xeleka navber bikaranîna kêmneteweyên Xiristiyan, pêşî li pêşketina tebeqeyeke komprador girt. Li aliyê din, qutkirina têkîliya di navbera zeneatkariya li bajaran û ekonomiya feodal ku di bin kedxwariya du qatî ya Siltanên Tirkên Osmanî û begên Kurdan de bêkêr bibû, derfetên ku bi dînamîkên navxweyî kapîtalîzmeke neteweyî pêş bikeve ji holê rakir. Piştî 1850'an kompradorên ji kêmneteweyan pêk dihatin, tîcareta hundirîn û ji derve bi dest xistin. Vê yekê kir ku bi tesîra kapîtalîzma Rojavaya Ewrûpayê, pêşketineke kapîtalîst mumkun nebe.

Burjuwaziya Tirk ku di demên destpêkê yên komarê de tîcareta di destê kompradorên kêmneteweyan de bi dest xist û di qadên kar ên weke tîcaret, sanayî û malî de hakîmiyeta xwe ava kir û di heman qadên karan de li Kurdistanê (beşa Kurdistanê yabakur) jî hegomonyaya xwe ava kir. Burjuwaziya Tirk ku di sînorên komarê de di qadên sanayî, tîcarî û malî de bi temamî bi feraseteke neteweyî – tekdest tevger kiriye, di qadên sanayî, malî û tîcarî de ji bo pêşketineke herî biçûk derfet neda. Tenê, li herêmên navîn ên Kurdistanê ku nikarîbû xwe bigihînê, her çendî pir sînordar jî be karîbû bi destên hin beşên Kurdan tîcaret pêş bikeve. Jixwe, di dorpêça tecrîda giran a leşkerî, siyasî û çandî (kültürel) de li benda pêşketineke kapîtalîst a ku xwediyê karektera neteweyî ye bûn bi temamî xiyalperestî ye.

Burjuwaziya Tirk ku di qada xwe ya herêmî de nekaribûye di bin kontrola emperyalîzmê de pêşketineke kapîtalîst a neteweyî pêk bîne, li Kurdistana ku di bin hakîmiyeta xwe ya mitleq de digirt wê kapîtalîzm pêş nexistana. Ji ber van sedeman, heya 1950’an li Kurdistanê hê jî ekonomiyeke feodal a di halê xwe de sekiniye hakim bû. Burjuwaziya Tirk, jihevketin û hilweşîna vê ekonomiyê, ji ber sedemên siyasî dereng xist. Berdevkên burjuwaziya Kemalîst pir baş dizanîn ku parçebûna ekonomiya feodal wê bibe sedema pêşketina şert û mercên madî yên rizgariya neteweyî, ji bo berjewendiyên xwe hê di cih de didîtin ku vê pêvajoyê qasî ji dest wan were dereng bixin.

Ji ber ku welatên sosyalîst zêde dibûn, tevgerên rizgariya neteweyî her ku diçe zêde dibûn û pêş diketin, pêdiviyên tekdestên (tekel) navdewletî bi bazar û madeyên xav zêde bûn, tekdestên navdewletî pêwîstî pê dîtin ku bazarên di destên xwe de bi kûrahî pêş bixin. Ji ber heman sedeman, li Tirkiyeya ku di dema Partiya Demokrat de di navbera salên 1950-1960’an de bi temamî ketiye bin kontrola emperyalîzmê, di qadên zîraet û sanayiya montajê de lêza pêşketina kapîtalîzmê zêde bû. Di vê pêvajoyê de, li gorî emperyalîzmê bilêzbûna pêşketineke kapîtalîst a bi vî şiklî neçariyek bû.

Kapîtalîzma ku li Tirkiyê di encama hevkariya bi tekdestên navdewletî de hatiye pêşxistin, ne mumkun bû ku li ser pêkhateya civaka feodal a Kurdistanê ku bi sedan sal di dorpêçeke tecrîda giran de hatiye razandin bi tesîr nebe. Pêdiwiya her ku diçe zêde dibû ya tekdestên navdewletî û burjuwaziya Tirk bi bazar, madeyên xav, quweta kar a erzan, berhemên ziraî û heywanî, neçar dihîşt ku welatekî wekî Kurdistanê yê fireh û dewlemend, bikeve xizmeta sermayeya wan. Dîsa, feodalên Kurdan ên ku kedxwariya sînordar a heyî kêm didîtin û dixwestin bibin hevkarên kapîtalîzma biyanî û herwiha para xwe ya di kedxwariyê de zêde bikin jî, pêşketineke bi vî şiklî dixwestin. Li Kurdistanê, ku xwediyê coxrafyayeke biTirkiyê re cîran e, ji beriya vê di bin kontrola tîcarî û malî ya burjuwaziya Tirk de bû, di serî de kapîtalîzmaTirk li gorî berjewendiyên tekdestênnavdewletî û feodalên Kurd, bi taybet ji 1960’an pêde pêvajoyeke pêşketina kapîtalîst hat bilez kirin. Nedikarîbû hêvî bihata kirin da ku pêşketineke kapîtalîst a bi vî şiklî xwediyê karektereke neteweyî be. Di van şert û mercên kapîtalîzmê ku tekdestên navdewletî, burjuwaziya Tirk û feodalên Kurdên ku bi rola kompradoriyê rabibûn pêş xistibûn de, pêşketineke

ekonomîk a serbixwe ya herî biçûk ne mumkun bû. Ekonomiyeke serbixwe, dikare di şert û mercên ku ji derve dest werdaneke emperyalîst nebe û li hundir jî yekîtiya siyasî heye de pêş bikeve. Bi sedan sal e ku li Kurdistanê şert û mercên bi vî şiklî pêk nehatine, û herwiha jî di roja me ya îro de pêkhatina van şert û mercan tenê bi têkoşîneke rizagariya neteweyî ku bi serkkefftinê encam bibe gengaz e.

Bi kurtasî, pêkhateya (yapı) ekonomîk a Kurdistanê ku cihê wê yê navdewletî, dîroka wê û çarçoveya wê ya siyasî bi kurtasî hatiye diyarkirin û îro hê bêhtir ji aliyê kapîtalîzma biyanî ve tê manîplekirin, xwediyê van taybetmendiyan e:

**a**)Burjuwaziya Tirk, dest datîne ser beşa herî mezin a berhema zêde ya ku di şert û mercên pêşketina kapîtalîzmê de derdikeve meydanê. Tevî ku dezgehên taybet jîhene, dezgehên dewletê ku berjewendiyên çînên hegomon ên Tirk digihîne hev, berê xwe dayê dewlenmendiyên ser erd û bin erd, û ekonomiyeke talanê ya temam bi rêxistin kiriye. Ev hem û dezgehên ku girêdayî tekdestên (tekel) dewletê ne, di serî de petol, di qadên wekî çem, erd (toprak), kansazî (madencilik), berhemên ji heywanan tê bidestxistin, sanayiya çîmentoyê û tîcaretê de hatine avakirin. Dezgeh û saziyên wekî TPAO (şîrîkatiya petrolên Tirkiye), TMO (ofîsa berhemên Tirkiye), TEK (saziya elektrîkê ya Tirkiyê), TKİ (dezgehên komirê yên Tirkiye), Türkiye Çimento Sanayî Anonim Şirketi, Etibank, Sümerbank, Çukobirlik, TEKEL, banka, çiflikên çandiniyê yên dewletê, kombîneyên goşt û hwd.ku bi temamî milkê dewleta mêtinger a Tirk in, aliyê (taraf) ekonomiya Kurdistanê diyar dikin û ji bo gelê Kurd pareke herî biçûk jî nahêlin. Di van dezgehan de tevî ku para tekdestên navdewletî heye, parake herî biçûk a kes û derûdorên Kurd tineye. Wexta ku dewlemendiyên welêt ji binî de tê birin, ji bo faktorên herêmî pareke komisyonê jî nayê hiştin. Sedema feqîrbûn û pêşneketina bi sedan sal, bi taybet jî di roja me ya îro de, bingeha xwe dispêre vê ekonomiya talanê. Ev sîstema talanê, ku ji bo ku gelê Kurd karibe bi azadî pêş bixe qadeke herî biçûk nehiştiye, ji bo pêşneketina hêzên hilberînker, bêkariyê, feqîrtiyê, xirabûna exlaqî, înkara neteweyî û bi her şiklê paşverûtiyê re bûye zemîn.

**b**) Ji bo ku ev ekonomiya talanêku li welatên din ên mêtingeh nayê dîtin û burjuwaziya Tirk bi destê xwe çêkiriyewere meşandin, hewl tê dayin li Kurdistanê şebekeya riyên bejahî, trên û hewayî were

pêşxistin. Li şuna ku Kurdistan wekî yekparetiyeke (bütün) ekonomîkwere dîtin û li gorî wê sîstema riyan were pêşxistin, bi temamî sîstemek ku girêdana bi Tirkiyê re zêde dike, dike hedef ku xwe bigihîne dewlemendiyên welêt, dike armanc da ku berhema zêde ya li gund, hêza kar a erzan û derfetên berfireh ên bazarê ji bo derve veke, polîtîkayeke sîstema riyên ku tevgera leşkerî û ekonomîkwekî yekparetiyekê difikire tê pêşxistin. Ev rê, wekî damarên mûyîn ên organîzmayekê, kanalên ku hem û çavkaniyên jiyanê yên welêt, keda wî, mejiyê wî vediguhezin Tirkiyeyê ne. Bi navbeynkariya van riyan, bajar bi bajar, navçe bi navçe, gund bi gund Kurdistan li Tirkiyê hatiye girêdan. Bi vî şiklî, di asta bajaran de, di asta herêman de û herwiha di asta hemû welêt de rêxistinbûna li dora bazareke şîrîk wê bê anîn rewşeke nemumkun. Jixwe, nabe ku mirov hêvî bike ku li ser esasê ekonomiya talanê li Kurdistanê bazareke şîrîk, yekitiyeke li ser esasê bazarê çêbibe. Çawa ku polîtîkaya riyan ji vê taybetmendiya ekonomiya mêtingeriyê tê, rê jî pêkhateyeke (yapı) bi vî şiklî qeyîmtir dikin.

**c**) Li Kurdistanê maliyeya Tirk hakim e. Sîstema pere ya Tirkan, xebata benqeyan, sîstema vergiyê (vergi), bi temamî di destê burjuwaziya mêtinger de ye û ev jî riyeke din a ku nirxa zêde pê tê transferkirin e.

**d**) Hemû tîcareta ji derve û beşeke mezin a tîcareta ji hundir ve ya li Kurdistanê, di destê burjuwaziya Tirk a mêtinger de ye. Burjuwaziya Tirk, îthalat û îxracata li Kurdistanê di kontrola xwe de digire û bi vê, talanên mezin pêk tîne. Para burjuwaziya mêtinger di tîcareta hundir de jî mezin e. Tîcareta goşt, şîr, tutun, pembo, tirî, fistiq û hwd û dezgehên TMO, Çuko birlik, Fisko birlik, Et ve Balık Kurumu, TEKEL febrîqayên şîr û rûn, ku her yek jê tekdestekî dewletê yê tîcaretê ye û tenê tê de para burjuwaziyaTirkheye, di dest xwe de digire. Ji ber vê sedemê ye ku li Kurdistanê jî bujuwaziyeke tîcaretê pêk nehatiye. Eger di asteke girîng de tîcaret di destê Kurdistaniyan de bibûna, wê pêşketina welêt hê zêde bileztir bûya.

**e**) Kapîtalîzma komprador û tîcaretê, di qadên ku burjuwaziya Tirk xwe negihandiyê de sînordar jî be bi destê beşên eleqadar ên Kurd pêş dikeve. Kapîtalîzma ku ji ber sedemên coxrafîk, ekonomîk, siyasî û çandî di van qadên ku burjuwaziya Tirk nekariye xwe bigihînê û dewletê jî bi destxistina van qadan li gorî berjewendiya xwe nedîtiye de

pêş dikeve, aliyê wê yê komprador li pêş e. Kapîtalîzma tîcarî ya neteweyî, di qadên weke neqliyat, avahîsazî, tîcareta hundirîn de beriya ku derfeta pêşketinê peyda bike, di bin çewisandina kapîtalîzma mêtinger û komprador de tê perçiqandin. Kapîtalîzma komprador a Kurd, bi kapîtalîzma Tirk ve girêdayî ye û tenêdikare di asta ku bi kapîtalîzma Tirk re dibe yek, xwe bigihîne kapîtalîzma navdewletî. Kapîtalîzma Tirk ku tîcareta bi derve li gorî pêdiviyên xwe pêk tîne, dîsa li gorî pêdiviyên xwe destûr dide ku li Kurdistanê xelekeke navberê derkeve meydanê. Kompradorên Kurd, bi burjuwaziya Tirk a hevkar û komprador ve girêdayî ne û bi roleke kompradoriyê ya di asta duyemîn de radibe.

**f**) Di zîraetê de kedxwariya feodal û kapîtalîst di zikhev de tên meşandin û hê zêdetir ji aliyê heman beşan ve tê pêkanîn. Di çandiniyê de ji ber ku kedxwariya feodal li gel kedxwariya kapîtalîst lewaz dimîne, neçar dihêle ku axayên xwedan erd ên feodal di qada zîraetê de kapîtalîzmê bi pêş bixin. Lê, ji ber ku di zîraetê de hatin û lêçûnên (gelir-gider) malî ji aliyê burjuwaziya Tirk ve tê kontrolkirin, ev pêvajo hêdîtir dimeşe. Di kapîtalîzma zîraetêde ku bi şiklê axayên xwedan erd ên feodal vediguhezin axayên xwedan erd ên kapîtalîst pêş dikeve, dibe ku faktorên neteweyî jî derkevin holê. Girêdayî bi sedemên cur bi cur ên dîrokî û siyasî, li ser erdên Kurdistanê ku çînên hakimên Tirkan karîne pir kêm bi dest bixin, di aliyê milk de hê zêde hakîmiyeta axayên Kurd ên xwediyêax heye. Bi şiklê parçekirina axên mezin û yekirina axên biçûk, erdên di mezinahiya navîn detên pêşxistin. Ev, qadên ku herî zêde îro ji kapîtalîzmê re tên vekirin û cihên herî nêzî kapîtalîzma neteweyî ne. Ekonomiya feodal ku di bin hegomonya û hevkariya kapîtalîzma Tirk de bi şiklê kapîtalîstbûna axayên axê yên feodal ên Kurd ji hev dikeve, hêbi temamî ji tesfiyebûnê dûr e. Di bin hegomonyaya mêtinger-feodal de veguherîna civaka feodal, tenê dikare nîv bi nîv pêk were. Tasfiyeya temam a feodalîzmê, di qada siyasî, civakî, çandî û ekonomîk de bi lidarxistina şoreşê mumkun e.

**g**) Hêza kar ku wekî encama xwezayî ya kapîtalîzma mêtinger-komprador ji axê qût bûye, ji bo ku mezin be nikare li Kurdistanê cih peyda bike û bi şiklê bêkariyê bêkêr dibe. Eger derfet peyda bin li ser esasê ku xizmeta kapîtalîzma Tirk û emperyalîzmê bike, bi koçberiyeke zêde ya girseyî koçî Tirkiyê û Ewrûpayê dike û li van deveran di karên herî zehmet, herî giran de bi maaşeke kêm tê xebitandin. Ev rewşa keda

mirov ku çavkaniya herî mezin a dewlemendiyê ya Kurdistanê ye, sedema bingehîn a feqîrtî û pêşneketina şexs a li Kurdistanê ye. Kapîtalîzma mêtinger-komprodor, derfetên xebitînê çênake û quweta mirovan a karkirinê bi koçberiyê re rû bi rû dihêle, encameke herî nebaş a vê jî di qada hêza karkirinê de xwe nîşan dide.

**h**) Kapîtalîzma Tirk, li ser bazara Kurdistanê ya ku girêdayî bi bazara wê ya neteweyî ya hakim ve ye kontroleke temam çêkiriye;ji bo daneheva (birikim) sermayeya li Kurdistanê derfet nas nake. Li aliyekî nirxên ku tekdestên dewletê dest danîne ser, li aliyê din nirxên di destê komprador û kapîtalîstên ku di bin kontrola xwe de digirin, timî vedihuhezînin Tirkiyê, li wir dikin sermaye û berê vê sermayeyê didin razandinên ekonomîk. Hêza ku herî zêde dikare li Kurdistanê razandinên (yatırım) ekonomîk bike – û dike- dewlet e.Ya ku dewlet dike jî, ne ku razandineke têra xwe bi xwe dike û dewlemendiyên welêt li welêt xerc dike ye; berevajî, razandinên ku hem û dewlemendiyên welêt talan dike ye. Karsaziya taybet (özel girişimcilik), berê xwe dide qadên ku feydeya (kâr) wan zêde çêdibe û neteweya Tirk lê zêde dijîn. Nirxa ku li Kurdistanê li gel karsazên taybet kom dibe, ji derveyê avahîsaziyê (inşaatcılık), hê bêhtir berê xwe dide Tirkiyê. Qadên ku lê zêde feyde heye, ji bo kapîtalîzmê weke kabeya wê ne. Her sermayedar dibeze wê derê.

Raserî (üstünlük) û kontrola misoger ku burjuwaziya Tirk di qadên sanayî, malî û tîcarî de ava kiriye, derfetê nade ku madeyê xav, hêza kar û nirxa zêde ya ku li Kurdistanê derdikeve meydanê li welêt bimîne, madeyên xav jî, nirxa zêde jî hê zêde li Tirkiyêkom bibin. Di bingeha hem û pirsgirêkên Kurdistanê de ev rastiya heye.

## Pêkhateya (yapı) Civakî:

Pêşketina mêtingeriy ê, di qada ekonomîk de li ser pêkhateya neteweyî û çînî ya Kurdistanê dibe sedema guherînên mezin.

Pêkhateya civakîya ku axayên feodal û reîsên eşîran û gundiyên ku xizmetkarên wan in, di şert û mercên civaka girtî de pêk anîne, îro hatiye parçekirin. Li aliyekê gundiyên ji ser erdan tên qewitandin, ji têkiliyên xwe yên feodal û eşîrî dest berdidin û dibin proletar; li aliyê din axayên feodal û reîsên eşîran, dibin kapîtalîstên axê û burjuwayên

komprador. Dezgehên dewleta mêtinger, zêde zêde kadroyên burokrat digihîne hev û kêm netewe, di astên girîng ên ekonomiyê de di wezîfeyên bi îmtiyaz de tên bicihkirin. Girseyeke mezin a xwendevanan di saziyên perwerdeyê ku bi armanca asîmilasyonê hatine avakirin de kom bûne.

Ji van ên herî serkeftî di saziyên dewletê de tên bikaranîn. Ev pêkhateya civakî ya nû ku di encama tesîra kapîtalîzma biyanî ya li ser pêkhateya civakî ya feodal pêk aniye de çêbûye, li gorî taybetmendiyên xwe dabeşî van beşan dibin:

## Maketa Li KurdistanêYa Burjuwaziya Tirk A Dagirker:

Ji ber ku bi armanc û  terzên cuda hatiye metingehkirin, Li Kurdistanê, tebeqeyek ku li mêtingehên din nayê dîtinderketiye meydanê. Burjuwaziya Tirk ji ber ku Kurdistanê ne tenê weke mêtingeh dibîne, di heman demê de ji bo neteweya xwe weke qada lê bicihbûne dibîne, weke quweteke ji herême ye tevger dike û  hewl dide ku li Kurdistanêkarîkatora xwe çêbike. Bi taybet li bajarên Kurdistanê yên bi Tirkiyê re sînor, tebeqaya hegomon ji van pêk tê. Ev tebeqaya ku hê di dema Osmaniyan de ji begên Tirkên li Kurdistanê bi cih bibûn, di dema komarê de ji kêmneteweyan, ji giregirên rêveberiya mêtinger û  ji Kurdên xayin ku Tirkbûn li gorî berjewendiya çîna xwe hê destdayî dîtine pêk hatiye, li Kurdistanê palpişta civakî ya herî girîng a burjuwaziya Tirk e.

Ev tebeqeya ku di qada sanayî û tîcaretê de raseriya (üstünlük) wê heyî û  li gel kapîtalîzmê di zikhev de dimeşe, ajanê birjuwaziya Tirkê li metropolan e. Ji bo ku mêtingeriya Tirk were rewakirin û  ji bo ku rastiya Kurd were înkarkirin, bi rola sereke radibe: Weke ku ne li Kurdistanê, li Tirkiyê bijî tevger dike. Ev tebeqe ku dizane, tenê dikare bi tinekirina rastiya Kurd ji bo xwe mafa jiyanê ya heta heta peyda bike. Tevgera rizgariya Kurdistanê, wê bi temamî vê tebeqaya kumeylên şoven, sosyal-şoven û  neteweperestên Tirkên faşîst jî bi xwedî dikeji holê rabike.

## Çîna Komprador-Feodal:

Ev beş, ku wexta ku pêkhateya civaka feodal-eşîrîji jora xwe ve û bi şiklekîpaşver û hat jihevxistindi encama têkîliya şidayî ya kapîtalîzma Tirk de derketiye meydanê, ji axayên axê yên kapîtalîst ku di şexsê xwe de temsîla kedxwariya feodal dikin û mutehît û acenteyên mezin pêk tê. Ev beşa ku berê axayên axê yên feodal bûn û bi xwe re burjuwabûn pêş xistiye, mutefîqeke sediq a mêtingeriya Tirk e. Vê çînêdi dema komarê de rola xizmetkariyêku ji Serdema Navîn pê de pê rabûye, hê jî qeyîmtir kiriye û nirxa zêde ya ku bi dest xistiye rojane veguhestiye Tirkiyê.Pirsgrêkeke wê ya weke serxwebûn û pêşxistina sanayiya welêt tineye. Cihê vê çîna ku ji bo bireve Tirkiyêji mejda cihê xwe amade kiriye, li Kurdistanê tineye. Di nav partiyên burjuwaziya mêtinger de xwe rêxistin kirine û pêşketina xwe, pirsgirêkên xwe, rizgariya xwe ji burjuwaziya Tirk cuda nagirin dest. Weke ku parazvanê berjewendiya wan a çînî be, li dewleta mêtinger dinêrin û li hemberê wê, daxwaza heqekî herî biçûk a siyasî nakin. Hin caran ji bo ku rûyê xwe yê xayin veşêrin, hewl didin da ku xwe neteweperest nîşan bidin, berevajî, li gel mêtingeriya Tirkan di mijara berjewendiyan de ti nakokiyên wan ên cidî tineye. Ev beşa ku tenê karibe bibe xizmetkarê neteweperestiya Tirk, di nav hedefên tevgera rizgariya Kurdistanê de ye.

## Burjuwaziya Biçûk a Bajaran:

Piştî ku mêtingerî di qada ekonomîk de pêş ket, tevgereke bajarbûnê ya sûnî (lihevçêkirî) pêşket. Li bajarên ku ne li ser esasê sanayiyê hê bêhtir bi şiklekî lihevçêkirî ji kombûna zêde şêniyê pêk hatine, ji pîşeyên wekî terzî, berber, xwediyên dukanên biçûk, saziyên biçûk ên erebayên bi anîn û birinê (taşımacılık) re mijul dibin tebeqeyeke burjuwaziya biçûk a bajaran pêş dikeve.

Ev tebeqe jî, ji sîstema mêtinger û feodal –komprador zerereke mezin dibîne. Berjewendiyên wan bi yên sîstemê re nakok in lê timî bi tirsa ku wê karê xwe wenda bikin, hewl didin wekî ku sernerm in xwe nîşanî sîstemê bidin. Pêşketineke kapîtalîst a neteweyî ku ev tebeqa li

ser navê wê siyasetê bike, tevgereke serxwebûnê ya bihêz ku proletarya jê re pêşengî dike, û ji vê tebeqayê beşeke girîng ê tevlî bibe, tineye. Ji ber van sedeman e ku ev tebeqa bi neçarî dibe zemîna madî ya nêrînên reformîstên ku pasîfîzma civakî weke rêbazeke têkoşînê qebûl dikin, xizmeta lîberalîzekirina sîstema mêtinger û hineke din zêdekirina berjewendiyên wan ên çînî dikin.

Beşa jor a vê tebeqeyê ku kenê xwe bi dozên giranbiha yên weke serxwebûn û demokrasiyê dike û xwe wekî siyastmedarê herî biaqil dihesibîne, pirî caran hewl dide sîstema mêtinger û feodal-komprador ku bi têkîliyên madî pêre girêdayî ye, rewa bike. Bi taybet di pêvajoyên çewisîn û şîdetê de, ev beşa vê tebaqeyê bi temamî dibe xizmetkar û ajanê sîstemê.

Tevî vê, dibe ku ji nav vê tebeqayê hem di aliyê hejmar de hem jî di alîyê cewher de beşeke bihêz a welatparêz jî derkeve. Eger bi rêbazên îknakirinê nêzîkatî li wan were çêkirin, ev tebeqa ji tesîra reformîzmê xelas kirin û tevlî hêzên têkoşîna rizgariya neteweyî kirin mumkun e.

## Gundîtî:

Gundîtî, ku îskeletê şêniya Kurdistanê pêk tîne û di seranserê dîrokê de bi çewisînên herî mezin re rû bi rû maye bingeha neteweya Kurde jî. Kurdîtî û gundîtî ji hev veqetandin ne mumkun e. Ji ber ku heya roja me ya îro li bajaran meyleke înkara neteweyî li pêş bûye, rastiya Kurdan bi gundîtiyê sînordar maye. Gundîtî ji homejenbûnê dûr e. Wexta li ser axê kapîtalîzm pêş ket, gundîtî jî ji hev cuda bû; piranîya axayên feodal ên axê gundîtiya dewlemend pêk anîn, beşek ji van jî axên xwe wenda dikin û gundîtiya navîn pêk tînin. Gundiyên zengîn bi piranî li bajaran bi cih dibin û bi navbeynkariya kesekî alîkar, dîsa serfên xwe yên kevin bi şiklê nîv serf, nîv proletar bi xwe ve girêdide û keda wan dixwe. Gundîtiya navîn, bi xwe li ser axên xwe disekine, hê bêhtir hewl dide bi keda xwe debara xwe bike û kêm caran karkeran dixebitîne.

Gundîtiya feqîr, beşeke mezin a gundîtiyê pêk tîne. Gundîtiya feqîr a ku pir kêm derfeta wê heye da ku li bajaran ji xwe re kar peyda bike, bi temamî di hembêza bêkarî û feqîrtiyê de ye. Ev beş, ji sîstema

mêtinger û feodal-komprador zerara herî mezin dibîne. Pêşneketina hêzên hilberînê di bin çewisîna mêtinger û feodal de, herî zêde li welat li ser gundîtiyê tesîra xwe nîşan dide. Beşa navîn û feqîr a gundîtiyê ku di nav tarîtiya Serdema Navînde ye, nikare ku ji berhemên zîraetê sûd wergire û naçar dimîne bi erzanî hilberîna bi dest xistiye bi destê dewlet û kompradoran ve berde. Di bin zilm û zora mêtinger û feodal de pêşneketina hêzên hilberînê li welêt, dibe sedem ku gundîtî jî pêş nekeve. Têkoşîna serxwebûn û demokrasiyê ya welêt, ji ber ku di heman demê de wê gundîtiyê jî rizgar bike, gundîtiya navîn û feqîr dikevin nav çarçoveya hêzên esasîyên têkoşîna rizgariya neteweyî.

Gundîtî ku hêza wê ya pêkhateyeke (yapı) îdeolojîk-rêxistinî ya serbixwe avakirinê tineye, tenê dikare di bin pêşengiya îdeolojîk-rêxistinî ya proletaryayê de were gel hev. Gundîtî ku meylên cur bi cur ên reformîst ên burjuwazî û burjuwaziya biçûk dixwazin bixin bin tesîra xwe, ji ber cih û şert û mercên ku ew niha di nav de ye bi reformîzmê re li hev nake. Hêza wê ku di şert û mercên îro de di encame têkîliyên eşîrî-feodal de bi navbeynkariya feodal-kompradoran di navbera partiyên burjuwazî de hatiye parçekirin, di pêşengiya proletaryayê de di nav têkoşîna rizgariya neteweyî de anîn gel hev, yek ji erkên herî girîng ê şoreşgerên proletar e.

## Proletarya:

Li Kurdistanê, li gel pêşketina kapîtalîzma Tirk, proletaryayeke Kurd jî dest bi pêşketinê kir. Proletaryaya Kurd, di encama nakokiyên bi burjuwaziya Kurd re de pêş neket. Hê bêhtir di kargehên (işletme) dewleta Tirkên li Kurdistanê ne de çêbû. Ne di şert û mercên kapîtalîzma Kurd de, di şert û mercên kapîtalîzma dewleta Tirk ya mêtinger de derket meydanê. Ji ber vê yekê, proletaryaya Kurd, hem ji burjuwayên Kurd zûtir çêbû û hem jî di aliyê hejmar û cewher de hê bihêztir e.

Girêdayî bi kapîtalîzma Tirkiyê re, wexta ku li Kurdistanê di qada zîraetê de kapîtalîstbûn dest pê kir proletarbûn jî li gorî vê hê bileztir bû. Di qada zîraetê de bikaranîna makîneyan, bû sedem da ku hêza kar di asteke bilind de azad be. Kargehên dewletê ku dikarin beşeke pir biçûk ê hêza kar a ku azadbûyî bi kar bîne, nikare ku hêza kar a azad a

ku bi şûn de mayî bixebitîne. Ji ber ku ti car derfet peyda nebûye ku di qada sanayiyê de kapîtalîzm pêş bikeve, arteşeke mezin a bêkaran çêbûye.

Hêz û quweta kar a azad a li Kurdistanê, weke encameke xwezayî ya sîstema mêtingeh û feodal-komprador, ji bo metropolên kapîtalîzma biyanî, xizmeta depoyeke hêza kar a erzan pêk tîne. Bi milyonan karker, di demsalên (mevsim) wê de diçin Tirkiyê û li wir di karên herî giran û kirêt ên kapîtalîzmê de bi maaşeke kêm dixebitin. Stûneke kapîtalîzma Tirk, li ser dewlemendiyên ser erd û bin erd ên Kurdistanê hatiye avakirin û stûna din jî li ser keda Kurdistanê hatiye avakirin.

Kedkarên Kurdistanê, ku pirsgirêkên wan ên weke perwerde nedîtinê, şert û mercên nebaş ên tendirustiyê, pirsgirêkên qet ti car nayên çareserkirin ên wekî avahiyên ku xwe tê de bisitirînin û hwd. hene, nikarin bi temamî xwe ji gund jî qut bikin. Wexta ku li bajêr karekî demdirêj diajo nabînin, ji vegera gund cudatir ti rê li ber wan namîne. Bêkarî, dibe sedem ku beşeke mezin a lumpenan çêbe; ev jî, dibe çavkaniya bi her şiklê xirabûn û bê exlaqiyê. Ev kesên ku meyldarê şîdetê ne, eger werin perweredekirin çawa ku dikarin di nav refên şoreşê de şer bikin, herwiha jî dikare bi pir erzanî werin kirîn û ji bo dij-şoreşê bibin maşik û alet. Jixwe, îro ji aliyê tevgerên paşverû, sosyal-şoven û bi taybet jîji aliyêtevgerên faşîst ve di asteke girîng de tên bikaranîn.

Proletaryaya Kurd, ji mêtingeriya Tirk a ku girêdayî bi emperyalîzmê ve ye û ji nokerên wê yên ku sîstema feodal-komprador pêk tînin, zerera herî mezin dibîne. Proletarya ku hema bêje fêrî jiyana koçberiyê hatiye kirin û ji bo siberojê (gelecek) ewlehiyeke wê ya herî biçûk a civakî tineye, di têkoşîna ji bo Kurdistaneke serbixwe û azad de çîna ku herî zêde berjewendiyên wê heyî ye. Pêşxistin û komînalîzekirina hêz û quwetên hilberînê li ser esasê serxwebûna siyasî ya welêt, ji bo hem û kedkarên Kurdistanê yekane riya rizgariyê ye. Timî, ji bo koçberiyê xwe amadekirin û hêza xwe ya karkirinê li welatên herî dûr, di şert û mercên herî zehmet de bi herî erzanî firotin, welat terkî însafa kapîtalîzma biyanî û xizmetkarên wêyên feodalên komprodorkirin, çawa ku ne riya xilasbûnê ye; ji bo mirovahiya hemdem sûcê herî mezin e.

Proletaryaya Kurdistanê, tevî hem û mercên nebaş ên ku di nav de ye, çîna herî şoreşger a Kurdistanê ye. Nebûna ti fikarên wê yên ji bo

mal û milk, xelasbûna wê ji têkîliyên eşîrî û feodal, bûn çînek ku her mezin dibe û di serbixwebûn û demokratîkbûna welêt de xwediyê berjewendiyên herî mezin bûn, vê tabetmendiyê jê re dide qezenckirin.

Proletarya, di maneya subjektîf denekariye ji bo xwe bibe çînekê, yanî bibe çîneke xwediyê zanebûn û rêxistin. Weke mercên ku gundîtî di nav de dijî, bi têkîliyên eşîrî-feodal ên bi şiklê bermayîbi çîna feodal-komprador ve tê girêdan û bi navbeynkariya wan jî di navbera partiyên cur bi cur ên mêtinger de dabeş dibin.

Tevgera proletaryayê ku di merhaleyaîro de li ser esasê têkoşîna teorîk, ekonomîk û polîtîk, bêyî ku tevgerên sosyal-şoven, reformîst û lîberal (uzlaşıcı) ku sosyalîzma zanistîberevajî dikin û revîzyonîzmê ji xwe re dikin al, di cewhera xwe de temsîla neteweya hakim û neteweperestiya neteweya bindest dikin tecrîd bike, nikare bibe partiyeke biquwet. Bêyî ku pêşengiya proletaryayê ya îdeolojîk-polîtîk hebe jî, nikare îtifaqa karker-gundiyan a esasîpêk were. Ji bo proletarên şoreşger, îro erk û wezîfeya herî acîl, di nav têkoşîna aktîf a li dijî mêtingerî û sîstema feodal-komprador de, ji bo ku rêxistinbûn ji asteke herî biçûk were gihandin asteke herî bilind, xebatên teorik, îdeolojîk, ekonomîk û çalakvaniyê di nav yekparetiyekê de fêm kirin û li gorî vê têkoşînek meşandin e.

## Rewşenbîr û Ciwan:

Di Kurdistana roja me ya îro de tebeqayeke modern a ku her diçe bi tesîr dibe jî rewşenbîr û ciwan in. Têkîliyên neteweyî û çînî yên vê tebeqayê, ku hewl tê dayin li gorî armancên hegomonyaya Tirk ku di salên dawî de bilêz pêş dikeve were perwerdekirin, weke ku bêbiryar in û baş bi cih nebûne xuya dikin. Burjuwaziya Tirk, ji bo ku van di nav hebûna xwe ya neteweyî de bihelîne û ji bo berjewendiyên çînî bi kar bîne, di asîmilasyoneke kûr re derbas dike. Ji ber ku xebat meşandina di saziyên ekonomîk, civakî, çandî û siyasî ku mohra neteweya Tirk hildigirin de fêmkirin û qebûlkirina ziman û çanda Tirk pêwîst dike, kesên nikarin çandeke bi vî şiklî bi kesayetiyên xwe bidin xwarin, nikarin di qada ekonomîk û civakî de bi ser bikevin. Gelek ciwanên xwendî û rewşenbîrên Kurd ku bûne qurbanê vê polîtîkaya burjuwaziya Tirk, nikarin hemdem bûnê ji Tirkbûnê cuda bifikirin.

Herwiha ji ber ku nekarîne şexsiyeta xwe ya neteweyî qezenc bikin, nikarin ji bûn xizmetkarê neteweya hakim xwe rizgar bikin. Têkîliyên çînî yên van ciwan û rewşenbîran ku di navbera du neteweyan de di rewşa tamponê de ne jî, xwediyê pêkhateyeke kompleks in. Pêkhateya (yapı) çînên hakim ên Kurd ku bi piranî li gel çînên hakimên Tirk têkîliyên şidayî çêkirine û tenê dikare bi taybetmendiyên xizmetkariyê ji wan were cudakirin, li ser ciwan û rewşenbîrên ku çavkaniya xwe ji wan digirin jî tesîr dike. Kesên nikarin bibînin ku ji kîjan neteweyê ne, nikarin wê biryarê jî bidin da ku ji çînên hakimên kîjan neteweyê ne. Di nav rewşenbîr û ciwanan de beşa ku herî zêde têde rûhê xizmetkarî û ajantiyê pêre pêş ketiye ev e.

Beşa ciwan û rewşenbîran ku ji çînên navîn û feqîr tên, dikarin hineke din rewşa xwe bi şiklekî objektîf bibînin. Dizane ku hegomonyaya feodal-komprador a mêtingeh, astenga herî mezin a li pêşberê pêşketina welêt, gel û wî/ê ye jî. Dibîne ku di nav neteweya hakim de riya “rizgariyê” her ku diçe namîne, wext hatiye û derbas dibe da ku li welat û gelê xwe vegere û li gorî vê helwestên xwe diguhere. Ev veguherîna di helwestê de, di nav vê tebeqeyê de welatparêziyê pêş dixe.

Di her pêvajoya dîrokê de, zanebûn, ji bo gel û çînan ji derve hatiye birin. Komeke ji hilberînê qut, teorî pêş dixe, ji derve mujul dibe ku vê bike malê gel û çînê. Dixwaze bila ji bo çînên pêşver û be, dixwaze bila ji bo çînên paşver û be ev rastî ji bo her çînê derbas dibe. Gel an jî çînên ku nikarin “komên” xwediyê zanebûn û rêxistin in pêş bixin, nikarin xwe bigihînin armancên xwe yên ekonomîk û polîtîk. Bêyî ku “koma” xwediyê zanebûn û rêxistin a gelên mêtingehan ku bi sed salan di mercên civakîyên li halê xwe de mayî pêk were, têkoşîna wan a li dijî emperyalîzm û mêtingeriyê pêş nakeve û nagihîje serkeftinê. Heya ku ji gelên mêtingehan di pêşengiya “komeke” xwediyê zanebûn û rêxistin de tevgera ciwan û rewşenbîrên welatparêz neyêpêşxistin, tevgera serxwebûnê ya neteweyî nikare pêş bikeve.

Ji ber ku pêkhateya (yapı) civakî ya eşîrî-feodal di bin hakîmiyeta biyanî de timî li ser lingan hatiye ragirtin, ji tevgereke xwediyê zanebûn a rewşenbîr-ciwanên welatparêz bê par mayin, ji bo tevgerên me yên ku bi armanca serxwebûnê hatine lidarxistin kêmasiyeke mezin e. Encax, di van salên dawiyê di pêkhateya me ya civakî de beşeke rewşenbîr-

ciwan a modern derketiye holê û ev kêmasiya hatiye derbaskirin; li dijî mêtingeriyê bi taybet di merhaleya destpêkê ya têkoşînê de xebata “koma” xwediyê zanebûn ku pêwîst e bi roleke diyarker rabe û di pêşengiya vê “komê” de tevgera rewşenbîr-ciwan a welatparêz hatiye destpêkirin. Di derketina meydanê ya vê encamê de, di nav beşa rewşenbîr-ciwan de eleqeyeke mezin dîtina sosyalîzma zanistî û baweriya misoger a bi fikra “tenê di pêşengiya sosyalîzma zanistî de wê mumkun be ku welat bigihêje serxwebûn û demokrasiyê” li şuna neteweperestiya burjuwazî ku ji mêj de wexta xwe temam kiribû, rol lîstiye.

Li pêşiya tevgera rewşenbîr-ciwan a welatparêz ku di mercên şênber (somut) ên welatê me de hêdi merhaleya destpêkê de ye, gelek wezîfeyên ku bi cih bîne heye. Tevgera rewşenbîr-ciwanan a welatparêz, bêyî ku nêrîn û helwestên ku hê jî di nav ciwanan de bi awayekî berfireh tê dîtin ên wekî şoven, sosyal-şoven, reformîst, çi ji min re ye, înkara neteweyî tasfiye bike û rêxistina xwe ya şoreşgerî ava bike û bi hêz bike, nikare ku nebesiya kadro ya têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê derbas bike. Tevgera rewşenbîr-ciwanan a welatparêz wê hê demeke dirêj di nav têkoşîna rizgariya neteweyî de girîngiya xwe bidomîne.

## Perwerde û Pêkhateya Çandî:

Perwerde û çanda ku li Kurdistanê hakim e, perwerde û çanda mêtinger a ku di xizmeta berjewendiyên neteweya Tirk de ye. Polîtîkaya perwerde û çandê ya mêtingeriya Tirk ku di çarçoveya neteweperestiya Tirk a şoven de hatiye pêşxistin, dike armanc ku rastiya neteweyî ya Kurdistanê tine bike; şexs li pêşberê ked, gel û welatê wê/î biyanî dike, li Kurdistanê xwediyê derfetên berfireh ên malî, kadro û dezgehî ye û li ser beşa civakî ku difikire hegomonyaya xwe hema bêje ava kiriye. Ev polîtîka di cewhera xwe de xwe dispêre di aliyê mejî û helwestan de temamkirina mêtingeriya civakî, ekonomîk û polîtîk, yanî xwe dispêre temamkirina mêtingeriya li ser mejî. Şerê rizgariya neteweyî li gelek welatan ji aliyê kulmeke rewşenbîran ve hatiye destpêkirin. Lê, li gel me tevî bi sed hezaran

rewşenbîr nehatiye destpêkirin. Yek ji sedemên vê jî, mêtingerîya li ser mejî ya li gel me ye.

Mêtingeriya ku di qada ekonomîk, civakî û siyasî de tê pêşxistin, eger di qada subjektîf de bi rewşenbîr û kesên ku difikirin wekî sîstemeke rewa û dikare were qebûlkirin were nîşandan, ti quwetên li cîhanênikarin vê mêtingeriyê hilweşînin. Vayê, li Kurdistanê, rastiya ku polîtîkaya perwerde û çanda Tirk li pey wê dibeze ev e.

Çanda Kurdan, tevî ku li ser mîrateya çandî ya gelek gelandi pêvajoyeke dûrûdirêjde bi şiklekî bihêz pêk hatiye, ji ber ku nekariye xwe bispêre destekeke ekonomîk û dezgehî (kurumsal), wekî şînatiyek ku li çiyayên asê bê av mayî, li ber ba û bahozên dijwar û germahiyên sotîner maye û ji ber vê yekê nekariye bişgoj (tomurcuk) bide, mezin nebûye, çîçek nedaye û di halê xwe de maye.Wekî ku di her qadê de bûye, Tirkan, di qada çandî de jîji çanda Kurdan sûd girtine û wekî materyal bi kar anîne. Netewebûna Tirk a ku xwe spartiye dewlemendiya çandî ya Kurdan jî, ji bo ku bi azadîpêş bikeve rê nedaye çanda Kurdan, di vê qadê de gelek tişt deyndarê vê çandê ye. Li pêşberî vê, ji ber ku di qadên siyasî û ekonomîk de zêde hatibûn zeîfkirin, Tirkandi qada çandî de jî hegomonyaya xwe bi hêsanî li ser Kurdan ava kirin. Herwiha di encam de karektereke Kurdê ku serxwebûna siyasî, ekonomîk û îdeolojîk çiye nizane, li ked û neteweya xwe bûye biyanî, hema bêje bûye heywan çêkirin. Mohra 'Kurdê hov' li vê karekterê dan û avêtin meydanê.Karektera rastîn a Kurd ku di nav dîrokê de di şert û mercên dewlemend ên çanda mirovahiyê de û di şerekî bêaman ê li dijî xweza û dagirkeran de çêbibû, diviyabû evqas nehatibûya xistin.

Em vê pêvajoyê hineke din zelaltir bikin.

Ji bo ku hedefa di nav sînorên 'mîsak-ı milî' de "yek netewe-yek ziman" were pêkanîn, hewl tê dayin ku Kurd ji dibistana seretayî pêde dîrok, ziman û hunera Tirkan fêr bibin û qebûl bikin. "saziyên perwerdeyê", bi gotineke din "saziyên bêkesayet kirinê" ku li mêtingehên din, mêtingehên neteweyên dewlemend ên wekî Îngilîz û Fransiyan jî nayên dîtin, lêbelê li Kurdistanê zêde zêde û cur bi cur in ji ber vê sedemê hatine vekirin. Eger bi vê armancê re nakok bikevin, ev dibistan êdi rojekê de werin girtin. Wekî ku di vê encamê de jî diyar dibe, armanc ne perwerdekirina gel e, gel kirin Tirk û kirin xizmetkar e.

Ev mêtingeriya perwerde û çandê ku bi zimanê Tirkî tê kirin, li ser ziman û çanda Kurdî çewisîneke bêrehm ava kiriye. Bi Kurdî xwendin û nivîsandin, dîrok, wêje û hunera Kurdan lêkolîn kirin û berbelav kirin ji binî de qedexe ye. Ev çavkaniyên me yên muzîk û folklorê yên ku nirxên bi hezaran sal ên dîroka gelê me ne, ji aliyê gelên cîhanê ve jî tên ecibandin. Di rewşa heyî de, tevî ku li van xwedî derdikevin, derfeteke herî biçûk tineye da ku bi Kurdî weşanên muzîkê were kirin. Bi hem û zimanan weşanên muzîkê tên kirin, lê destûr nayê dayin da ku 15 milyon mirov bi zimanê xwe, hunera xwe bigirin dest. Ev rastîbi me didin zanîn ku mêtingeriya çandî, ji ya tê fikirîn jî hê kûrtir e.

Divê, têkoşîna li dijî mêtingeriya çandî me negihîne encamên şaş. Ferasetên îdîa dikin ku bêyî ku rizgariya neteweyî pêk were, dikare ziman û çand rizgar be û bi vê armancê alîgiriya perwerdeya bi zimanê Kurdî ya di çarçoveya Komara Tirkiyê de dikin, reformîst û paşver û ne. Tenê xiyalperestên ku ji taybetmendiyên mêtingeriyê fêm nakin, dikarin li pey planên bi vî şiklî bibezin. Ya rast jî ew e ku; ji bo ku zimanêKurdî di çarçoveya sîstemê de pêş bikeve û bibe zimanekî xwendin û nivîsandinê derfet tineyeku dibistaneke seretayî were çekirin. Lê tevî vê, divê têkoşîna fêrbûn û kirin zimanekî xwendin û nivîsandinê ya Kurdî, di asta ferdî de be jî were dayin, divê bi taybet bi gundiyan re bi Kurdî were axifîn. Bi Kurdî fêrbûn û ew anîn asta zimanê xwendin û nivîsandinê ne şaş e; ya şaş, nêrînên teslîmkar û reformîst ên wekî "di çarçoveya vê sîstemê de perwerdeya bi Kurdî" ye. Divê li gel vê jî, ji ber ku zimanê mêtingeran e, Tirkî biçûk neyê dîtin; divê, ji bo ku nirxên çandî yên gelên cîhanê werin gihandin gelê me, wekî amûrekê were bikaranîn. Divê, derfetên teng ên bi Kurdî fikirînê, ji bo niha bi zimanêTirkî were pêşwazîkirin. Dema ku me serxwebûna xwe ya neteweyî bi dest xwe xist, vayê wê demê Kurdî wê bibe xwediyê derfetên malî, saziyî (kurumsal) û kadroyî û bilez bi pêş bikeve, bibe amûra esasîya ragihandin û danûstandinê û di nav zimanên cîhanê de cihê ku layiq e wê bigire. Îro gelek mêtingehên ku serbixwe ne, hê jî zimanê mêtingeran bi kar tînin û zimanê xwe yê neteweyî nû nû pêş dixin.

Dema li dijî siyaseta perwerde û çanda mêtingeriyêtêkoşîn tê meşandin, pêwîst e ev xelekên esasî werin fêm kirin: hilweşandina fikra ku înkara neteweyî dike; tecrîdkirina neteweperestiya reformîst a

burjuwaziya biçûk ku dixwaze mêtingeriyê wekî sîstemek ku mirov dikare pêre bijî û dikare bi hin reforman sererast bike nîşan dide; li şuna fêrbûna dîroka feodal û reîsên eşîran, lêkolînkirin, fêrbûyin û fêrkirina dîroka berxwedanê ya gelê me;li beranberê çanda jiyana dejenerebûyî ya ku burjuwaziya mêtinger bi riya televîzyon, sînema, sporê belav dikexwedî derketina li çanda pêşver û ya gelên cîhanê û gelê me.

## Pêkhateya Neteweyî:

Di bin tesîra mercên mêtingeriya Tirk ku pêş dikeve de, ji netewebûnê zêdetir, ya ku hakim e pêvajoya tinebûna neteweyî ye. Burjuwaziya Tirk, li ser dewlemendiyên civakî û çandî yên neteweyî yên li Kurdistanê bi temamî tevkujiyekê dimeşîne û hewl dide li şuna wan yên xwe hakim bike.

Gelê Kurd ku di serdema feodal de hin aliyên xwe yên neteweyî ji gelê cîran hê zêdetir pêş xistiye, bêyî ku van aliyên xwe veguhezîne netewebûneke xurt, di bin tesîra mêtingeriya kapîtalîst de ket pêvajoya tinebûnê ya neteweyî. Burjuwazî, di merhaleya xwe ya rekabeta serbest de ji bo ku li ser bazara xwe ya neteweyî hakîmiyeta xwe çêbike, ket nav têkoşîn û şerekî neteweyî. Di encam de bû sedem ku li gelek welatan neteweyên bujuwa derkevin holê. Dîsa di merhaleya emperyalîst de, piştî ku burjuwaziya gelek welatên mêtingeh her ku diçe bû xwediyê karektereke noker û xayinên neteweyî, neteweyên proletar an jî demokratîkên ku de encama serkeftina proletaryaya ku pêşengiya rizgaraya neteweyî ya welatên mêtingeh xistibûn destê xwe dehatibû avakirin, çêbûn. Gelên ku hê jî, di hakîmiyeta mêtingeriyê de dijîn, aliyên wan ên neteweyî timî xirab dibin; kesayetiya neteweyî tine dibe û li şunê, bi neteweya hakim re bûnyek pêş dikeve.

Pirî caran tê gotin ku kapîtalîzm netewebûnê pêş dixe. Rast e, lê ev jî rast e ku di bin hegomonyaya kapîtalîzmê de gelek gel an tine bûn an jî şexsiyeta xwe ya neteweyî wenda kirin û di nav neteweya hakim de heliyan. Gelekan jî, ji bo ku bibin netewe, li dijî emperyalîzma kapîtalîst ji meşandina şerekî bê eman cudatir ti rê nedîtin. Hem û gelên çermsorik ên wek Aztek, Înka û hwd. û Ermenên Anatoliyê û hwd. bi komkujiyan hatin tinekirin Neteweyên wek Çîn, Mozambîk, Kore,

Gîne, Angola û hwd. jî, di nav şerê bi emperyalîzma kapîtalîst re de çêbûne.

Bi pêşketina mêtingeriya kapîtalîst re şertûmercên objektîf ên netewebûnê derdikevin meydanê. Lê belê ev yeka nikare wekî ku "kapîtalîzm netewebûnê pêş dixe" were şîrovekirin.Vebûna reyan, pêşveçûna bazarê, derketina meydanê ya çînên nû diyardeyên (olgu) objektîf in. Di vê çarçoveyê de, dibe ku netewebûn jî pêş bikeve, tinebûna neteweyî jî çawa ku hêzên welatparêz ên welêt dikarin di vê pêvajoya têkoşînê ya rizgariya neteweyî de, ku wê li ser zemîna van şert û mercên objektîf pêş bixin , welat, ziman, çand û ekonomiyê rizgar bike û neteweyeke nû biafirîne, yanî netewebûnê pêk bîne; hêzên mêtinger jî dikarin ziman û çanda gel tine bikin, erdnîgariya welêt ji netewa xwe re bikin qada lê belavbûn û bicihbûnê, kokê dewlemendiyên ekonomîk biqelînin û li ber netewebûna wî gelî bibin asteng. Ev, giradayî bi hêz û rêxistinbûnê re ye. Yên ku dibêjin "emê bê nakokî, hema ji ber xwe, bê têkoşîn bigihîjin hedefên xwe" xizmetkarên mêtingeriyê ne. Ti gelên mêtingehan, hema bê têkoşîn, bidi cihêxwe de sekinînê nebûye netewe û netewebûn pêş nexistiye. Netewebûn di destpêkê de ji aliyê burjuwaziya pêşver û ku li dijî feodalîzmê şer dikir ve hatiye pêşxistin; lê, di roja me ya îro de îtifaqa karker û gundiyan ku bi pêşengiya proletaryayê li dijî emperyalîzm û mêtingeriyê şer dike, vê pêk tîne. Tevgerên ku li dijî emperyalîzmê bi pêşengiya burjuwazî û burjuwaziya biçûk hatine meşandin jî, li şuna ku neteweyê rizgar bikin an jî pêşketina neteweyî bilêz bikin, di şert û mercên nû de ji emperyalîzmê re zemîna koletiyê afirandine.

Li ber ronahiya van nêrînên giştî, li Kurdistanê, di bin hegomonyaya mêtingeriya kapîtalîst de ne ku netewebûna Kurd pêş ket, netewebûna Tirk pêş ket. Burjuwaziya Tirk ku bazara Kurdistanê bi dest xistiye, heya bi parçeya wê ya herî biçûk dagir kiriye û li ser ziman û çanda Kurd sîstemeke bê rehm a çewisandinê ava kiriye; bi pêşketina ekonomiya ya mêtinger re bi zimanê xwe, bi çanda xwe û bi pêkhateya xwe ya civakî jî, neteweya Tirk pêş dixe. Jixwe, rêgeza herî girîng a Kemalîzmê di nav sînorên "mîsaq-ı milî" de afirandina neteweyeke Tirk e. Vayê îro li Kurdistanê, ev rêgez dimeşe.

Netewebûna Kurd jî, tenê dikare bi pêvajoyeke berevajî pêş bikeve. Ev jî, bi têkoşîneke giran ku di qadên wekî ekonomîk, çandî, siyasî û leşkerî de li dijî mêtingeriya Tirk were dayîn mumkun

dibe.Yên ku xizmetkarî ji xwe re wekî pîşeyekê (meslek) hilbijartine, dibêjin; “kapîtalîzm netewebûnêpêş dixe, ji ber vê yekê pêşver û ye, traktora kapîtalîzmê li gorî gisinê reş pêşver û ye” û xwe sosyalîst dihesibînin. Bila li aliyekî bimîne bûn sosyalîst, ev dikarin encax bibin tirşikçiyên mêtingerên Tirk ku her ku mêtingeriya kapîtalîst pêş ket gilêz bi devê wan dikeve û jiyana ku gel a bi êş, rondikên çavan û bi xwîna xwe herikandinê pêk aniye, nikarin bibînin.

Li Kurdistanê, pêşketina aliyên neteweyî yên çandî û civakîji aliyê du quwetan ve tê astengkirin: Quwetên biyanî û quwetên ji hundir ve. Quweta ji der vemêtingerî ye, û quweta ji hundir ve jîpêkhateya eşîrî-feodal ku nokerê (işbirlikçi) quwetên mêtinger e û tenê dikare bi alîkariya vê quwetê xwe li ser lingan ragire. Kevneşopiyên eşîrî-feodal, di civakên ku pêşketina wan a bi dînamîkên navxweyî hatiye astengkirin û nekarîne ku rejîmên xwe yên siyasî yên serbixwe ava bikin de, bi şiklekî bizanebûn tê jiyandin. Ev parçebûna feodalî ku li pêşiya zanebûna neteweyî û yekbûna gel timî dibe asteng, bi zêde zêde pêşxistina zanebûna malbatperestî, qebîleperestî û eşîrperestiyê, wekî cisimekî ku heya atomên wî hatiye parçekirin, dibe sedema ji hev belavbûna civakê. Piştgiriya qebîle û eşîrî, çawa ku li ber pêşketineke hê pêşde ya civakî dibe asteng, li ber netewebûnê jî astengek e. Her ku têkoşîna civakî û neteweyî pêş ket, di nav civakê de zanebûna (bilinç) zêde ya malbatperestî, qebîleperestî û eşîrperestiyê, wê şuna xwe ji zanebûna civakî û neteweyî re berde.

Saziyek ku ji Serdema Navîn maye û di bin mercên mêtingeriyê de temena wê bi zorê hatiye dirêjkirin jî, olperestî (dincilik) û mezhep-perestî ye. Dîna Misilmantiyê ku di Serdema Navîn de di hakîmiyeta Ereban de pêş ketiye û li şuna zanebûna milî, zanebûna ummedê pêş xistiye, bi riya mezhebên ku afirandine, gelê Kurd ji kûr ve parçe kiriye. Mezhebperestiya ku di bin hakîmiyetaTirkên Osmanî de jîwekî amûreke (alet) siyasîli dijî Îraniyan hatiye bikaranîn, heya roja me ya îro ew fonksiyona xwe ya gelê me parçekirin û li dijî hev bikaranînê domandiye. Mezhebperestiya ku ji bo gel xwe negihîne fikrên hemdem bûye asteng, xizmeta parastina sîstema mêtinger û feodal-komprador kiriye û xwe sipartiye bermayiyên dînî yên Serdema Navîn û li pêşiya têkoşîna rizgariya neteweyî dibe asteng. Wexta ku di vê mijarê de têkoşîn tê birêvebirin, divê şaşitî neyên kirin.Li dijî dînê têkoşîn meşandin tişteke, ji dînê re dujin kirin û ji bo ku girêdayî dînê ye bi gel

re xwe ecz kirin tiştekî din e; ya yekemîn çiqas rast be, ya duyemîn jî ewqas şaş e.

Mijareke din ku di nav civaka Kurdistanê de divê li ser were nîqaşkirin jî, rewşa kêmahiyên neteweyî (ulusal azinlik) û dînî yên cur bi cur e. Di dîrokê de di pêvajoyên cuda yên dagirî, talan û mêtingeriyê de, bi armanca rêvebirinê, tîcarî û lêbicihbûnê, şeniyênTirk û Ereb li ser erdên Kurdistanê hatine bicihkirin; li gel vê, şêniyên weke Aşûrî û hwd. ji berê de heya roja me ya îro li navendên cur bi cur jiyana xwe domandine. Ji ber ku netewebûneke bihêz a Kurd nehatiye jiyîn, beşeke ji van kêm neteweyan ku heya roja me ya îro hebûna xwe dane domandin, bûne ajanên burjuwaziya Tirk; beşa din jî feqîr bûne û di bin zexta sîstema mêtinger û feodal-komprador de tevî gelê Kurd tên çewisandin. Şoreşa Kurdistanê, wê zext û kedxwariya li ser gelê Kurd ji holê rake û ji bo bi azadî pêş bikevin şert û merc amade bike.

Di mercên mêtingeriya kapîtalîst de yekane riya dijî derketina li tinebûna neteweyî, pêşxistina têkoşîna rizgariya neteweyî ye. Bêyî ku bermayiyên Serdema Navîn û bi her şiklê mêtingeriya van bermayiyan li ser lingan digire ji holê werin rakirin, pêşketina neteweyî nayê çêkirin. Hem û nêrînên ku pirsgirêka netewe û netewebûnê ya Kurdistanê di çarçoveya “mîsaq-ı milî” de digirin dest, îdîa dikin ku di nav sîstema mêtingeriyê de bi pêkanîna hin reforman wêpirsgirêk çareser bibeûnikarin bibînin ku çareseriya pirsgirêkê di şoreş û serxwebûna neteweyî de ye, xwe dispêrin neteweperestiya hakim an jî neteweperestiya bindest û xizmeta meşrû kirina mêtingeriyê dikin. Bêyî ku ev nêrînên şaş ên derbara pirsgirêka neteweyî de werin teşhîr û tecrîdkirin, têkoşîna rizgariya neteweyî nikare pêş bikeve û xurt bibe.

## Pêkhateya (yapı) Siyasî:

Li Kurdistanê, mêtingeriyeke siyasî ya Tirk ya bihêz ku hem sedem û hem jî encama mêtingeriya ekonomîk, civakî û çandî ye hatiye avakirin. Bi heman şiklî ku li qadên din mêtingerî pêş ketiye, pêşketina mêtingeriya li qada siyasî jî, li ser esasê dagiriya leşkerî çêbûye.

Hegomonyaya Tirkan, li Kurdistanê li ser bingeha dagiriya leşkerî dest pê kiriye. Êl û eşîrên Oğuz ku ne komcivakeke hilberînker bû û

debara xwe bi talan û xenîmetê dikirin, hê di sedsala XI. de dest bi êrîş û seferên xwe yên li ser Kurdistanê kiribûn. Eşîr û begên feodal ên ku di vê pêvajoyê de bihêz bûn, karîbûn pêşî li van êrîşan bigirin û rêveberiyên xwe bidomînin. Êl û eşîrên Tirkên Oğuz têvî ku di xenîmet komkirinê de serkeftî bûn, nekarîbûn di qada leşkerî û siyasî de hakîmiyeteke timî ava bikin. Mîritiyên Tirkan ên ku hatibûn avakirin jî, di nav pêkhateya civakî ya Kurdistanê de heliyan û Tirkitiya xwe wenda kirin.

Têkîliyên di navbera Tirkên Osmanî û begên Kurdan de ku di destpêkê de bi feraseta (anlayış) îtifaqê pêş ketibûn, her ku çûyî li dijî berjewendiyên begên Kurdan têkçûye û veguherîye hegomonyaya Tirkên Osmanî. Begên Kurdan di dema Osmanî de hêza xwe ya siyasî ji nişkan ve wenda nekirin; i demeke dîrokî ya dûr û dirêj de, ji bo ku xweseriya xwe ya hundirîn biparêzin, her ku têkoşînên li dijî Osmaniyan xwe digihandin asteke merkezî hêza xwe ya siyasî jî wenda kirin. Li aliyê din, rêveberiya Tirkên Osmanîdi qada leşkerî û siyasîde her ku çûyîbû xwediyêhêz û quwet. Her ku hegomonyaya leşkerî û siyasî pêş ket, ketxwariya ekonomîk jî zêde bû. HakîmiyetaTirk a leşkerî û siyasî, –wekî encameke xwezayî- bi destdanîna ser beşeke nirxa zêde ya di destê begên Kurdan ên feodal de û bi vergî sitandina ji amûrên ku gel pê debara xwe dike, bi mêtingeriya ekonomîk re hate yekirin.

Di pêvajoya komarê de, bi tepisandina berxwedanan, bermayiyên (kalıntı) hêza siyasî ya herî dawî jî hat tinekirin. Di dest çînên hegemon ên Kurdan de ti hêza siyasî û leşkerî nema. Eger gotîn di cih de be çînên hegomon (hakim) ên Kurdan hatin xesandin. Êdî jê pêde, ji hem û qedera xwe bi burjuwaziya Tirk ve girêdanê û di bin hegemonyaya Tirk de mal û milkê xwe li dijî gel parastinê cudatir ti pirsgirêkên wan neman. Çînên hakimên Kurd di roja me ya îro de, ji boku li dijî gel werin bikaranîn û armanca mêtingeriya Tirk a bi şiklê ‘parçe parçe bike-bi rêve bibe’ pêk bînin, ji derveyê hêzeke eşqiya bi xwedî kirinê, ne mumkîn e ku bibin xwediyêhêz û quweteke leşkerî û siyasî:-ji ber mercên dîrokî, navdewletî û ber bi çav-.

Wexta hat fêmkirin ku ji ber ku hêza siyasî li begên eşîrperest-feodal hatiye qedexekirin, Kurdên di hembêza burjuwaziya Tirk de burjuwabûn bi xwe re pêş xistine jîjixwe wêti car nikaribin xwe bigihînin hêzeke bi vî şiklî, di qada siyasî de rêveberiya Tirkbûhêza

hakim. Tirkên ku di dema Osmaniyan de di çend eyaletan de li ser rêveberiyê bûn, di demeke dur û dirêj a dîrokî de, hem û rêveberiyên ku di encama dabeşbûna (parçalanma) Kurdistanê de bi şiklê bajar, bajarok û navçeyan çêbibûn bi dest xistin. Saziyên dewletê yên li Kurdistanê, îro bi temamî di bin hegomonyaya burjuwaziya Tirk de ye. Di qada leşkerî de jî bi heman şiklî bûye.

Heya bi salên 1830'an, li Kurdistanê, kontrola leşkerî ya Tirk hê jîpir zeîf bû. Dîsa, heya van salan Kurdan ji bo Sultanên Osmanî leşkerî nedikirin. Lê, ji ber ku li pêşberê Ewrûpayê timî binkeftin dihat bidestxistin û tevgerên rizgariyê yên neteweyî yên gelên Xiristiyan pêş diketin, Osmanî neçar man artêşa Yeni Çeri'yan belav bike û ji gelên Misilman artêşeke nû ava bike; li ser vî esasî ji bo Kurdan pêvajoya bi darê zorê girtina leşkeriyê dest pê kir. Bi vê armancê, ji 1830'an pêde, li ser Kurdistanê seferên leşkerî yên xurthatin çêkirin. Bi van êrîşên talankirinê, li aliyekî hewl hat dayin ku li ser Kurdanbi şiklekî bi sîstem vergiyê ferz bikin û li aliyê din jî fêrî leşkeriya mecbûrî werin kirin. Ev leşkeriya mecbûrî û vergiya timî, di sedsala XIX. de bû yek ji sedemên herî girîng ên serhildanên mezin. Bi têkbirina serhildanan, di asteke girîng de ji destê feodalan xweseriya hundirîn hate girtin û hegomonyaya Tirk a ku li şunê bi cih bûye jî, bi darê zorê bi gelê Kurd leşkerî û vergiya timî da qebûlkirin. Dema ku li gel çewisîn û kedxwariya feodalan, çewisîn û kedxwariya hegomonyaya Tirk jî zêde bû, ji bo gelê Kurd rojên herî zehmet dest pê kirin.

Êdî dikarîbû li ser Kurdên di pêvajoya komarê de îradeya wan hatiye şikênandin polîtîkayên ku bihata xwestinwere pêkanîn.Ji van polîtîkayan yek jî, leşkeriya mecbûrî ya di navbera 2-4 salan de dihate guherîn ku li ser her Kurdê bîst saliya xwe derbas dike hatibû ferzkirin bû.Kurd, ji bo artêşaTirk tenê dikarin bibin leşkerên ku weke koleyan wezîfeyên herî giran pêk tînin. Di asta fermandariyan de, ji derveyêKurdên xayin û ajan, tenê yek Kurd jî tineye.Burjuwaziya Tirk bi şiklekî bê nîqaş li ser artêşêhakim e. Gundiyên Kurdên ku ji bo leşkeriyê tên girtin artêşê, piştî ku li dayikbûna xwe tên poşmankirin û "dersekî welat" ê baş distînin tên şandin cihên jê hatine. Gundiyên Kurdên weke robotan lê hatine, ji leşkeriyê dizivrin û jiyana xwe ya li welat bi parvekirina 'bîranînên ji leşkeriyê' bi derdora xwe re, jehra şovenîzma Tirk li derdorê belav dikin.Kurd, bi vî şiklî li ber sîstemê tên stuxwarkirin û tên kirin hêzeke leşkerî ya girîng a artêşa dagirker; bi

vê, ku yek ji rêbazên herî çors (kaba) û herî kujêr e, her Kurdhema bêje tê xistin rewşek ku li xwe îxaneta bike. Di maneyekê de, li ser hesabê mêtingeriya Tirk 'Kurdistan ji aliyê Kurdan ve hat dagirkirin'.Lê belêli pey vê, rêbazên çors, hovane û pir zirav ên mêtingeriya Tirk nedîtin, tenê sûc û kêmasiya Kurdan dîtin, bibe nebe bi bûn xayin û nokerên xizmetkar mumkun e. Îro li Kurdistanê her kes bi dahol û zirneyê tê rêkirin leşkeriyê; ev rewş dubarekirina komedî-drama ku dayikek cenazeyê kurê xwe bi tilîliyan rêbike goristanê ye.

Bi kurtahî hegomonyayaTirk ku di dîrokê de di qada leşkerî û siyasî de bi vî şiklî pêk hatiye, di roja me ya îro de xwe gihandiye bingehekî xurt ê ekonomîk, civakî û çandî û bi temamî veguheriye mêtingeriyekî siyasî. Ev mêtingeriya siyasî ku di dîrokê de bi spartina bingehên xurt xwe ava kiriye, îro jî bi şiklekî diyar, bi şiklê mêtingeriya ekonomîk xwe gihandiye hedefa xwe. Ev mêtingerî li aliyekî jî maske bi kar tîne, li aliyê din hesaba mercên navdewletî û mercên heyî yên li Kurdistanê dike û bi şiklekî ku li cîhanê kêm tê dîtin xwe dimeşîne.

Yên ku dîrokê, şert û mercên ber bi çav nizanin an jî ji ber berjewendiyên xwe yên çînî ji nedîtî ve tên, hewl didin ku rêveberiyeke bi vî awayî kubi parlemento, partiyên siyasî û rast û 'çepa' xwe ve tê meşandin, ne wekîmêtingeriyeke siyasî, wekî 'demokrasiyeke burjuwa' ya temam bibînin û nîşan bidin. Gelek nêrînên sosyal şovenîst jî hewl didin fîl bi mûyê wî tarîf bikin û weke ev gotin belav kirin û rastî çewt nîşan dan ji xwe re kiribin meslek: "waliyê wê (Kurdistanê) yê giştî tineye", Kurd jî dikarin bikevin parlemento û artêşê", Tirkiyê bi xwe mêtingehek e, mêtingeha mêtingehekê nabe", tenê DYE û Rûsya dikare mêtingeriyê bike, ji bo tiştekî bi vî şiklî hêza Tirkiyê têrê nake".

Lê belê, mêtingeriya Tirk ji ber sedemên dîrokî, leşkerî, çandî, civakî, ekonomîk û navdewletî ewqas xwediyê hêz e kumeşandinê parlemento, partiyên siyasî, rast û çepa xwe weke encameke xwezayî ya vê hêza xwe dihesibîne. Jixwe, hê DYE'yê nebû jî, Kurdistan di bin hegomonyaya Tirkan de bû. Demên ku Kurdistan bi destêwaliyên giştî, mufetîşên giştî, fermandariyên giştî yên ku hem û înisiyatîfên siyasî, hiqûqî wergirtine hatiye birêvebirin jî pir çêbûne. Di pêvajoyên ku dewletên emperyalîst ên bihêz hebûne de carna li dijî van dewletan û carna jî bi îtifaqa van dewletan, dîsa jîTirkan hegomonyaya xwe ya li ser Kurdistanê meşandine.Mejiyên nikarin rastiyên evqas aşkere ne bibînin, tenê dibe ku ew kes bin ku Kemalîzmê li ser wan pir zêde tesîr

kiribe. Ji bo ku rastî nîşanî van mejiyan were dayin, divê jehra Kemalîst ji van mejiyan were derxistin û mejiyên ev jehr jê nehatiye derxistin jî werin perçiqandin.

Pêwîst e em careke din li mijara dagiriya leşkerî vegerin. Yên xwediyê quweta leşkerî ne, li gorî asta vê hêza xwe, li ser ekonomî, pêkhatey a (yapı) civakî û siyasî jî, hakîmiyeta xwe ava dikin.E v rastî, alfabeya Marksîzmê ye. Têkîliya di navbera hêza leşkerî û ekonomîk, hêza siyasî û ekonomîk de rasterast û ji sedî sed e. Dîsa hin kes ê bêjin, artêşa li Kurdistanê ne artêşa Tirk e. Em ji van kesan re tenê vê dibêjin, gotinên wekî, ev artêş îro li Rojhilata Navîn berjewendiyên emperyalîzmê diparêze, rast in lêbelê ev jî rastiyek e ku evartêş, li Kurdistanê, li Qibrisê, li Anatoliyê berjewendiyên xweser ên burjuwaziya Tirk diparêze. Di navbera salên 1925-1940’an de kontrola emperalîzmê li ser Tirkiyê lewaz û zeîf e. Di vê pêvajoyê de artêşa Tirk bi şiklekî hovane Kurdistan dagir kiriye, eger sibê Tirkiyê ji kontrola emperyalîzmê derkeve jî, îhtimal heye da ku ev artêş hê zêdetir jî bi destên kemalîstên ku xwe “çepgir” dihesibînin, dîsa li Kurdistanê bimîne û wekî ku layiqê raboriya xwe ya kujêr be û tevkujiyên xwe bidomîne.

Bi kurtahî em dixwazin vê bêjin:

Burjuwaziya Tirk ku di qada leşkerî de li Kurdistanê pir xurt e, weke di qadên ekonomîk, civakî, çandî de bûyî, dikare di qada siyasî de jî birehetî mêtingeriyê pêş bixe. Di sîstema kapîtalîst de, her kes li gorî asta quweta xwe xwediyê mafê axaftinê ye. Hêza û quweta burjuwaziya Tirk jî, têra mêtingehkirina Kurdistanê dike.Îro, nîviya Qibrisê dagirkirina wê jî, piştrast dike ku ew xwediyê vê quwetê ye.

Mêtingeriya siyasî ya Tirk, wekî şikla rêveberiyê li Kurdistanê parlemento û partiyên siyasî bi kar tîne. Ev, ne ji ber lîberalbûna wê ye; weke ku di qada ekonomîk, civakî û çandî de bûyî, di qada siyasî de jîfeodal-kompradorên Kurd di bin kontroleke şidayî de digire. Rê û rêbazên mêtingeriya siyasî ya Tirk in ev in; bi riya feodal-kompradoran di hilbijartinan de di bin navê şerên partiyan de eşîrperestî û qebîleperestî texrîq kirin û gel bi hev dan qirkirin, xwediyên erdên ku di asteke navîn de mezin in bi zext û çewisandina xwediyên erdên mezin û bi zext û çewisandina kompradoran re rû bi rû hiştin, rêveberiya mêtinger ku li cîhanê mînakên wê kêm peyda dibin di bin maskeyê ‘demokrasiyê’ de veşartin. Eger li welatekî, wekî ku

mêtingeriya siyasî bi riya parlemento û partiyên neteweya hakim tê birêvebirin xuya bike, ev tê wateya ku rêveberiya mêtinger li vî welatî dema xwe ya herî rehet dijî. Li mêtingehên Îngilîz û Frensiyan jî bi heman şiklî bûye. Xizmetkarên ji mêtingehan hatibûn ên zer, reş, spî dema bawer dikirin ku di parlementoyên Parîs û Londrayê de siyasetê dikin, piraniya van mêtingehan gihîştibûn serxwebûna xwe. Lê her ku têkoşîna serxwebûna neteweyî bi pêş ket, ev lîstokên "demokrasiyê" hêdî hêdî cihê xwe ji pûtînên bê rehm ên genaralan re, ji êşkence, zindan û bombebaranan re berdaye. Jixwe herî demên rehet ên rêveberiya mêtingehê jî, eger ev xeml û boyaxa demokrasiyê ji ser wêwere rakirin, ji binî despotîzmeke leşkerî û sivîl ku bi xwîn, êşkence, kuştin û êş û jan hatiye honandin derdikeve.

Ev tiştên hatine gotin, hemû, ji bo Kurdistanê sed qatî hê rastir in. Têvî van rastiyan, yên ku gelê me bi hev didin qirkirin, zilm û çewisandina kompradorên feodal her zêde dikin, dixwazin despotîzma wê ya xwîndar wekî 'demokrasî'nîşan bidin, di bin navê mêtingeriya siyasî ya burjuwaziya Tirk de, yên ku dikarin ji têkoşîna ji bo ku'endamên partî', kesên 'bê partî', an jî 'endamên neteweyî' bişînin parlementoyê re bêjin 'têkoşîna demokratîk' û bi ser de jî xwe weke 'demokrat', 'welatparêz' û heta 'sosyalîst' didin naskirin, bila li aliyekî bimîne layiqê van nirxên pîrozbûnê –em dubare dibêjin- herî zêde dikarin bibin tirşikçiyên mêtingeriya Tirk. Heya ku berê xwe nedaye mêtingeriya siyasî û tinekirina bi her şiklê mêtingeriyê nekiriye hedefa xwe, ti ji van têkoşînên li Kurdistanê, dixwaze bila bi şiklê komale be, dixwaze di asta partî de be, dixwaze bila îlegal an jî legal be, ne demokratîk in. Di nav lepên rêveberiyek ku tinekirina gelekî kiriye hedefa xwe û bi vî şiklî pêş dikeve de, bi şiklê rêxistinên meslekî jî be, têkoşîna demokratîk ne mumkîn e. Lê eger em ji çûna meclîsê ya feodal-kompradorên herî mezin re nebêjin demokrasî; dîsa eger em ji Tirkiyeya ku di cewhera xwe de bi qasî misqalekê demokrasiya burjuwa nahewîne re nebêjin demokrat, ev bi vî şiklî ye.

Têkoşîna demokrasiyê, ji bo Şoreşgerên Kurdistanê, li ser esasê serxwebûna neteweyî, li dijî zilm û zora feodal-komprador a li ser gel tê dayin. Yên ku di bin ala welatparêziyê de tên gel hev, ji hêzên demokratîk tên hesibandin. Di navberavan hêzan de jî, rêgezên demokratîk tên pêkanîn. Ji bo yên ku ji derveyê vê alê li cihekî din kom bûne, eger nehatibin xapandin, heqê jiyanê jî tineye.

Bi kurtahî, rêveberiya li Kurdistanê, ew rêveberiya mêtingeriyê ya KT’ê ye ku rêveberiyên herî bê rehm û herî fêlbaz û zirav di zikhev de tên pêkanîn.Vêrêveberiyê, di asta biqasî ku giregirên beşa feodal-komprador karîne bibin kole û xizmetkar de êw girtine bin parastina xwe û li ser gel zilm û zoreke bêsînor ferz kiriye. Li çiya û baniyan bi navgîniya rêxistina jandarmayan timî gundiyan di bin çewisîn û kontrolê de digire; bi sêber (üçlü) ku ji amîrê îdarîm (qeymeqam, walî), giregirên leşkerî û komîserê leşkerîpêk tê bajaran bi rêve dibe û li gel herêmên çiyayî di bin çewisînê de digire. Li gel van aliyên aşkere yên rêveberiya mêtinger, MİT li aliyekî hem û giregirên rêvebir ên mêtingehê bi şiklekî veşartî bi rê dixe, li aliyê din beşeke mezin a ji pêkhateya civakî ya welêt ku bûye xizmetkar û kole jî, ji bo ku gel bi hev bide qirkirin û têkoşîna rizgariya neteweyî asteng bike bi şiklekî veşartî bi rê dixe. Di bingehên hem û van rêveberiyên aşkere û veşartîyên mêtingehê de dagiriya leşkerî heye. Jandarma, polîs, rêveberên mêtingehê yên sivîl, partiyên burjuwa û TBMM’ê,(meclîsa mezin a miletê tirkiyê) li Kurdistanê li ser esasê vê dagiriyê pêş dikevin û mezin dibin. Rastî ev e. Ne hêza sosyal-şovenan û ne jî hêza bi her şiklê burjuwa û burjuwayên biçûk têrê dike da ku ev rastî were guherîn. Têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê, wêher şiklê nêrînên sosyal-şoven, burjuwa û reformîst ên burjuwaziyên biçûk ku mêtingeriya di qada siyasî de vedişêre û meşrû dike bi erdê re bike yek û mezin bibe.

## Beşa Seyemîn

## Şoreşa Kurdistanê:

### Mîrateya Dîrokî Ku Şoreşa Kurdistanê Xwe Dispêrê

Îro li pêşberê şoreşa Kurdistanê bi du şiklî mîrateyên dîrokî hene. Ya yekemîn, dîroka berxwedanê ya gelê Kurde ku di dîrokê de di şert û mercên dewlemend ên çanda mirovahiyê de, di encama têkoşîna li dijî

hakîmiyeta biyanî, dijî çînên hakîm û dijî xwezayê de bi şiklê 'merdî û merxasiya Kurdan' çêbûye; ya duyemîn jî, dîroka çînên hakime ku li ser esasê zilm û zora li ser gel, xizmetkarî û koletiya ji hakîmiyeta biyanî re çêbûye; îro weke oportunîstî, tirsonekî, sextekarî, îxaneta neteweyî û weke pîsatiya mirov a ji hem û nirxên xwe yên mirovatî û welatparêziyê dûrketî û bûye fosîl derdikeve pêşberê me.

Em, bi misogerî ji van her du dîrokan re nêzîkatiyên cuda dikin.Eger em çiqas li dîroka gel xwedî derkevin û bikin bingeha têkoşîna xwe ya şoreşgerî, em dîroka çînên hakim jî ji vê dîrokê ewqas vediqetînin û lanetê lê tînin.

Her çendî bi serxwebûnê bi encam nebûyîbe jî, berxwedana gelan ji heybeta xwe tiştekî wenda nake. Eger îro mirovahî bi pêşengiya sosyalîzmê ber bi civaka bêçîn ve diçe, di vê de, rola berxwedanên gelan ên bêhejmar ku di dîrokê de navên wan jî derbas nabin mezin e.

Gelê Kurd jî, wekî gelên din, kêm li ber xwe neda. Di seransera dîroka civaka çîndar de, li dijî talan, dagirî û nijad kujiya ku pir kêm gel pêre rû bi rû mane berxwedanên mezin li dar xist. Heta ji xwe re herêmên çîyayî yên bilind kirin war jî, ji bo isbata vê rastiyê mînakek ku têrê dike ye. Eşîr û çiyayên xwe, –di berdêla ku ji şaristaniyê bêpar bimînin de- û heya doh li dijî hegomonyayên biyanî serxwebûna xwe parastin.

Her çendî li ber pêşketina siyasî û civakî hatibe rewşeke bûn asteng jî, girêdayîbûna bi malbatê re û ji bo namûsa wê, mirin bi tiştekî nehesibandin, awayekî ji rê derketî yê vê hesta berxwedan û jiyana azad a gelerî ye. Tu dibêjî qey ji biyanîbûna li keda xwe, ji biyanîbûna li mirovahiya xwe, ji biyanîbûna li welatê xwe tolê vedike; dixwaze bi rêbazeke paşver û li malbatê xwedî derbikeve û serxwebûna xwe biparêze. Ev, di heman demê de drama gelê Kurd e. Eger, Kurd vê hesta serxwebûnê ya hatiye berevajîkirin ji nû ve bi ked û welatê xwe, bi mirovahiyêve girêbide ti dozên ku têde nikaribe bi ser bikeve nîne.

Xwîna ku gelê Kurd li dijî dagirî, talan û mêtingeriya civakên koledar, feodal û kapîtalîst rijandiye, pir kêm gelan rijandiye. Ji bo mînak, hin berxwedanên mezin ên ku di du sed salên dawî de çêbûne ev in; 1831-36 Rewanduz, 1842-48 Bedirxan Beg, 1856 Yêzdan Şêr, 1879 Bedirxanî, 1881 Ubeydullah, 1919 Koçgîrî, 1925 Palu-Genç-Xanî, 1930 Agirî, 1930 Simko, 1938 Dêrsim û hwd. ev berxwedan nîşan

didin ku gelê me di oxira azadiya xwe de pir xwîn rijandiye û xespkirina vê azadiyê jî hema wiha bi hêsanî danequrtandiye.

Li pêşberê rêxistinbûnên dewletê yên bi şiklê împaratoriyan, gelê Kurd bi rêxistinbûnên eşîrî ku parçe parçe bûye û di navbera xwe de jî nekariye bibe yek, nedikarî ku bi ser bikeve. Ya din jî wexta ku li ser vê, îxaneta timî ya feodal û reîsên eşîran tê zêdekirin, nikare ku gelê Kurd were sûcdarkirin da ku 'çima ev berxwedan bi ser neketine'. Eger gelê Kurd nekariye serxwebûna ku hin gelan bi rijandina kêm xwînê qezenc kiriye bi dest bixe, ji vê ew encam dernakeve ku gelê Kurd kêm li ber xwe daye an jî kêm xwîn rijandiye; berevajî, encameke wiha derdikeve ku, dijminên wî pir bihêz in û çînên hakimên wî jî, xizmetkarî û ruhê koletiyê ji xwe re kirine hunerekî.

Lê îro, ev gel, weke kadavrayekê li meydanê ye. Em, ji vê şerm dikin. Dîsa, ji ber ku ev dijminên gel, vî welatî gel, weke milkê xwe yê şexsî bi kar tînin û li beranberê vê em jî sekneke 'bêçare' nîşan didin, ev hesta me ya şermê sed qatî hê zêdetir dibe. Ev hem û kêrî çi tên? Kêr tên da ku em kîna xwe zêde bikin û li ser esasê dîroka berxwedana gelê xwe û bi rêberiya sosyalîzma zanistî, riya rizgariyê ya rastîn ji bo xwe diyar bikin.

## II-Şert û Mercên Objektîf û Subjektîf Ên Şoreşa Kurdistanê:

Di serdema emperyalîst de kamilbûn an jî pêşketina şert û mercên objektîf ên şoreşa li welatekî mêtingeh, tê wateya ku ew welat bûye xelekeke zincîra emperyalîst û pêşketina kapîtalîst a li vî welatî, di serî de proletarya wê ji çêbûna çîn û tebeqayên modern re bibe sedem.

Bi bûna sîstemeke cîhanî ya emperyalîzmê re, bi piranîtê qebûlkirin ku li hem û welatan şert û mercên objektîf ên şoreşê pêk hatine. Weke îstisna, hin mêtingehên klasîk ên ku ji aliyê ekonomiyên kapîtalîst ên pêşketîve nehatine mêtingehkirin, ji ber ku ekonomiya kapîtalîst pêş neketiye, nikare ku di aliyê şert û mercên objektîf ên şoreşê de pêşketî werin hesibandin. Ji bo mînak, bi ekonomiyên xwe yên pêşketî Îngilîz û Fransiyan pêşketina kapîtalîst a li mêtingehên xwe, ji z û ve pêk anîne û bûne sedem da ku li van welatan şert û

mercên objektîf ên şoreşê pêş bikevin. Lê, welatên wekeTirkiyê û Portekîz ku xwediyê ekonomiyên paşketî û girêdayî bi emperyalîzmê re ne ji ber nekarîne bibin sedem ku ji z û ve li mêtingehên wan pêşketineke kapîtalîst çêbibe, pêşketina şert û mercên objektîf ên şoreşê asteng kirine. Encax wexta ku bi emperyalîzmê re têkîliyên mêtingeriya nû pêş xistine, pêşketina kapîtalîst a li mêtingehan bilêz kirine û bûne sedem ku şert û mercên objektîf ên şoreşê pêş bikevin.

Pêşketina şert û mercên objektîf ên şoreşê, demeke dirêj li Kurdistanê hatiye asteng kirin. Ji ber ku; civaka Kurdistanê di pêvajoya hakîmiyeta Osmanî de, pêkhateya (yapı) civaka feodal, li gel zilm û zor û kedxwariya zêde zêde, ji tesîrên kapîtalîzma Ewrûpayê dûr hatiye girtin û di pêvajoya komarê de jî, bi taybet heya dawiya salên 1940'an bi pratîkên wekî dagiriya leşkerî, tevkujî û 'herêma qedexe' hema bêje ji cîhanê hatiye îzolekirin û heya salên 1950'an di asteke girîng de ji tesîrên kapîtalîzmê dûr hatiye girtin. Lê belê ji vê dîrokê pêde, weke ku di beşên li ser mijarê de dûr û dirêj hatiye vegotin; di serî de ji ber ku emperyalîzmê berê xwe daye mêtîngeriya nû û di şert û mercên mêtingeriya nû de pêşketina kapîtalîzma Tirkiyêbilez bûye, axayên feodal ên axê yên Kurd jî xwestine ji vê pêşketinê para xwe wergirin û dest pê kirine bibin axayên xwediyê axê yên kapîtalîst û komprador, pêşketina kapîtalîzma mêtinger li Kurdistanê bilez bûye. Mêtingeriya kapîtalîst ku îro li Kurdistanê pêş dikeve, pêkhateya eşîrî-feodal a ku bi sedan sal hatiye îzolekirin û ji tesîrên derve dûr hatiye girtin parçe kiriye û ekonomiyek ku bi temamî xwe dispêre talanê bi rê xistiye, û bivê re pêşketina şert û mercên objektîf ên şoreşê bilêztir kiriye.

Li mêtingehên di bin rejîmên dagiriya leşkerî de tên girtin, eger mêtingeriya ekonomîk jî nehatibe pêşxistin, tê maneya ku şert û mercên objektîf ên şoreşê hene. Weke li welatên kapîtalîst ên pêş ketî, di pêvajoyeke dûr û dirêj a têkoşîna legal de proletarya perwerde kirin û bi rê xistin, di rewşeke şoreşê ku wêpêş bikeve de –di rewşek ku êdî çînên hakim nikarin weke berêbi rêve bibin û çînên bindest' jî êdî nikarin weke berê bijîn û bi xwesteka veguherînê dest bi çalakiyên şoreşgerî kirine de-, ji bo mêtingehan bi serhildaneke topyekûn îqtîdar bi dest xistin, mumkun e. Ji ber ku derfeta xebata legal û rêxistinbûna legal li mêtingehan nîne, şoreşger, ji bo ku xwe biparêzin neçar in gel bi rêxistin bikin û ji bo ku saziyên mêtinger nikaribin bixebitin, şiklên têkoşînê yên wekî îdeolojîk, polîtîk û leşkerî di zikhev de bi kar

bînin.Yên ku dixwazin li welatê me şert û mercên objektîf weke li welatên pêşketî yên kapîtalîst tehlîl bikin, tenê dikarin bibin ew kesên ku naxwazin şoreşê bikin û ji şoreşê direvin.

Şert û mercên subjektîf ên şoreşê, rewşa zanebûn û rêxistinbûna çîn û tebeqeyên ku di şoreşê de berjewendiya wan heye îfade dike. Teoriya şoreşê ku ji analîza şert û mercên objektîf ên li Kurdistanê derketiye û programê vê ku jê (teroriya şoreşê) çavkaniya xwe digire û taybetmendî, hedef, erk û wezîfe, hêzên wê yên esasî, îtifaqên wê yên neteweyî û navnateweyî bi şiklê rêgezên (ilke) kurt û cewherî diyar dike, asta rêxistinbûna herî kêm (asgarî) a vê teorî û programê, tenê xwe dispêre rêxistinbûna sosyalîstan; ev rastî, nîşan dide ku şert û mercên subjektîf ên şoreşê dest bi çêbûnê kirine. Bi çêbûna şert û mercên subjektîf re, riya şoreşên mêtingehan di şerê germ re derbas dibe. Rêxistinek ku li mêtingehan di asta rêxistinbûnê ya herî kêm de be, eger nikaribe ji bo şerê germ cesaret bike, an ji hev dikeve û belav dibe an jî dibe kulubek ku entelektuel tê de demogojî dikin.

Li Kurdistanê, teoriya ku ji tehlîlkirina şert û mercên objektîf ên şoreşêtê pêkanîn û programê wê û têkoşîna wê, nû nû pêş dikeve. Bêqebîliyetbûna rewşenbîrên Kurd ku di tehlîla dîrok û şert û mercên heyî yên welatê xwe de nîşan dane, ji ber di aliyê fikrî de ne bi serê xwe bûn û bêber (verimsiz) bûn, îro hê nû tê derbaskirin. Tevgera weşanê ku heya niha di çarçoveya teorî û programa şoreşê de pêş neketiye, wekî encameke xwezayîya legalîzmê nekariye rastiyên welêt wekî bûyî bide der; ji ber vê yekê bûye sedem ku ciwan û rewşenbîr lidora gelek rêxistin û fikrên sosyal şoven û reformîst-burjuwaziyê biçûk kom bibin û tevgera rewşenbîr-ciwanan bi terzeke şoreşger-welatparêz pêş nekeve. Tevgera me ya ku li ser rastiya Kurdistanê fikirîn û tevgerîn ji xwe re kiriye rêgeza esasî, bi teoriya ku ji şert û mercên şênber (somut) ên welêt çavkaniya xwe digire û bi programê ku xwe dispêrê vê, di qada îdeolojîk û polîtîk de ji gelê me re pêşengî kirinê, wekî erk û wezîfeyeke pîroz û dîrokî dizane.

## lll- Taybetmendî, Hedef û Wezîfeyên Şoreşa Kurdistanê:

Wateya ku pêwîst eji taybetmendiya şoreşekê were derxistin, ‘ew şoreş di çarçoveyeke dîrokî ya çawa de çêdibe û wê kîjan pirsgirêkên esasî çareser bike’ ye.

Şoreşa Kurdistanê, şoreşa welatekî wiha ye ku; zilm û zora neteweyî ti car nehatiye çareserkirin lê timî hatiye pêşxistin û ji ber zilm û zorê, tarîtiya Serdema Navîn hebûna xwe timî domandiye. Ev taybetmendiya şoreşa Kurdistanê, di pêvajoyeke dîrokî ya dûr û dirêj de çêbûye. Zilm û zora milî ku di dîrokê de timî bihêz bûye û di roja me ya îro de wekî mêtingeriya kapîtalîst aTirk de ber bi çav bûye, nîşan dide ku merhaleya destpêkê ya şoreşa Kurdistanê wê di aliyê neteweyî de pêş bikeve. Bêyî ku zilm û zora milî were çareserkirin, nikare ti pirsgirêkên welêt were çareserkirin. Nakokiya sereke ya li welêt xwediyê taybetmendiyeke milî ye û çareserkirina hem û pirsgirkên din jî, girêdayî bi çareseriya vê pirsgirêkê ve ye. Ji pêş neketina hêzên hilberînê yên li welêt û ji pêş nekitina dîrok, ziman û çanda milî, ji berdewamkirina tarîtiya Serdema Navîn ev nakokî berpirsiyar e. Hem û nêrînên ku li ser Kurdistanê, nakokiya milî wekî nakokiya sereke dest nîşan nakinxizmeta mêtingerî û paşverûtiyê dikin.

Girêdayî bi nakokiya milî ve nakokiyeke ku bi wê re were çaserkirin jî, nakokiya di navbera gel û feodal-kompradoran de ye. Taybetmendiyeke din a şoreşa Kurdistanê jî ev e. Çawa ku bi qewisandina di ser re mêtingerî û nakokiya milî nayê çareserkirin, bêyî ku têkoşîna li dijî mêtingeriyê pêş bikeve jî, ev nakokî nayê çareserkirin. Çareseriya vê nakokiyê, balê dikişîne ser aliyê demokratîk ê şoreşê.

Ji ber şert û mercên ber bi çav ên dîrokî yên Kurdistanê zilm û zora milî û feodal ewqas ketiye zikhev ku ev ji hev derxistin û mesafe xistin naveberê ne mumkîn e. Beşeke mezin a feodal-kompradoran bûne ajan û ji berdevkên herî har ên metingeran ti ferqa wan nemaye. Ji ber wê yekê, mesafe xistin navbera aliyên milî û demokratîk ên şoreşa Kurdistanê, çareseriya aliyên milî û demokratîk li demên cuda cuda dabeş kirin şaş e. Ji ber ketina zikhev a zilm û zora neteweyî û çînî, şoreş jî têkoşîna li dijî zilm û zora milî û çînî li gel hevdu bigire dest. Bi taybet têkoşîna li dijî kesên bûne ajan, erka herî acîl û sereke ya ku pêwîst e were kirine û ev, taybetmendiyeke karekterîstîk a şoreşa Kurdistanê ye.Şoreşa Kurdistanê bi van taybetmendiyên xwe, şoreşeke demokratîk a milî ye.

Ji şoreşên bi vî şiklî re, di demên ku burjuwazî li beranberê feodalîzmê xurt bû de şoreşên demokratîk ên burjuwa dihat gotin. Ji Şoreşa Cotmehê şun de, wexta ku dema şoreşên demokratîk ên burjuwazî xelas bû û dema şoreşên proletaryayê dest pê kir, ji şoreşên demokratîk ên burjuwa ku girêdayî bi şoreşên proletaryayê ve pêş diketin re hat gotin şoreşên demokratîk ên burjuwa yên bi şiklê nû, “şoreşên demokratîk ên nû” an jî bi kurtasî hat gotin “şoreşên demokratîk ên milî”. Ji şoreşa demokratîk a milî bi şun de bêyî ku qutbûn bikevê, tê derbasbûn şoreşa sosyalîst. Lê, bêyî ku bi têkoşîneke demdirêj şoreşa demokratîk a milî were lidarxistin, berê têkoşîna welatekî nayê dayin şoreşa sosyalîst.

Şoreşa Kurdistanê, wekî plansaziya herî destpêkê mêtingeriya Tirk di hedefa xwe de bi cih dike. Ya ku serxwebûna siyasî xesp kiriye, li ser ziman, dîrok û çanda Kurdî bi temamî kar û barê tinekirinê meşandiye û talan kiriye mêtingeriya Tirk e. Ji derve emperyalîst û ji hundir ve jî, feodal komprador alîkarî didin vê mêtingeriyê. Ev her sê hêzên ku bi girêdanên pir şidayî yên ekonomîk bi hevre têkîldar in, hedefên Şoreşe Kurdistanê ne. Tevgerek ku di serî de li dijî mêtingereya Tirk, li dijî alîkarên wî yên ji derve û hundir ve pêş nekeve li Kurdistanê nikarê navê şoreşgeriyê hilde. Her feraseta ku bi xwe spartina taybetmendiyeke emperyalîzman jî feodalîzmê, dixwaze hakîmiyeta Tirk a klasîk a li ser Kurdastanê bide paşguh kirin, paşverû ye û di xizmeta mêtingeriya Tirk de ye. Mêtingeriya Tirk ji emperyalîzm û feodalîzmê hêzê digire û berjewendiyên her duyan jî li gel e wê hene. Ji ber vê yekê, riya rast a yekane ya têkoşîna li dijî emperyalîzm û feodalîzmê, di şerkirina li dijî mêtingeriya Tirk re derbas dibe.

Erk û wezîfeyên Şoreşa Kurdistanê ku çavkaniya xwe ji taybetmendî û hedefên şoreşa Kurdistanê digirin, pêş dibînin ku Kurdistaneke serbixwe û demoratîk were afirandin.

Afirandina Kurdistaneke azad, bi tinekirina mêtingeriya ekonomîk ku li ser qada dewlemendiyên ser erd û bin erd, li ser ked, zîraet, malî û qada sanayiya Kurdistanê heye, bi tinekirina mêtingeriya çandî û siyasî ku pêşketina di qada ziman, dîrok, çand, civak û siyasî de asteng dike û bi tinekirina dagiriya leşkerî mumkun e. Pîştî ku di van qadan de mêtingerî tê tasfiyekirin, mumkun dibe da ku Kurdistan di aliyê siyasî,

ekonomîk, çandî û civakî de bikeve ser riya bi şiklekî pêş ketineke serbixwe.

Kurdistaneke demokratîk afirandin jî, girêdayî bi tinebûna zilm û zora feodal-komprador ku li ser civaka Kurdistanê ye. Tinebûna zilm û zora û kedxwariya feodal-komprador ku ji aliyê çîna feodal-komprador ve tê pêkanîn, dihêle ku hem û beşên civakê, jin, gundî û kêmnetewe û kêmahiyên dînî azad bin.

Di van her du qadên girêdayî hev in de erk û wezîfeya xwe ya li dijî zilm û zor û kedxwariyê bicihanîn, tenê bi rêxistineke polîtik ku sosyalîzma zanistî pêşengê wê ye, û bi eniyeke rizgariya neteweyî ku bi pêşengiya vê rêxistinê têkoşînê dimeşîne û rêxistinkirina arteşeke gel a bihêz ku şerker e û girêdayî vê eniyê ye dibe. Ji bo ku birêxistinbûnên partî, enî û artêşê bibin xwediyê naverokekê û pêş bikevin jî, pêwîst e rêxistinên girseyî (kitlesel) yên, karker, esnaf, ciwan û jinan were afirandin.

Li ser esasê ku hem û ev wezîfe werin pêkanîn û li ber ronahiya rêgeza giştî ya navendperestiya demokratîk, demokrasiya gel ku wêdi qada siyasî de bi şiklê komara gel pêş bikeve, di qada ekonomîk de rê dide ku sîstemeke ekonomîk a bi vî şiklî pêş bikeve; sîstemek ku tê de bi pêşengiya rêxistineke plansaziyê ya dewletê ku merkezîye û hakim e û derfetê dide dewletperestî, kooperatîfgerî û milkê taybet, di serî de sanayiya giran xwe dispêre, zîraet, sanayî û gêşedana (kalkınma) serbixwe û giştî (topyekun)... Serxwebûn û pêşketina di qadên siyasî û ekonomîk de, serxwebûn û pêşketina di qadên ziman, civak, çand û perwerdehiyê de li gel xwe tîne.. Tenê dema ku di qadên ekonomîk û siyasî de serxwebûn hat bidestxistin, wê demê dikare ziman, dîrok û hunera neteweyî were lêkolînkirin û were gihandin asteke bisazîbûyî (kurumlaşmış) û hem û gelê li welêt dijî di aliyê şikil û cewherê de bi çandeke demokratîk were gihandin, ji bo her kesî derfet peyda dibe ku li gorî şert û mercên xwe di perwerdeyeke meslekî, teknîkî û zanistî re derbas be.

## lV-Rêbaz û Taktîka Şoreşa Kurdistanê:

Di dîrokê de, darê zorê timî du rol lîstine. Ya yekemîn; zora şoreşgerî ye ku li dijî têkîliyên hilberînê yên paşverûyên li ber pêşketina

quwetên hilberînê dibin asteng û li dijîhakîmiyeta biyanî li ser gelan tê bikaranîn.Ya duyemîn jî, zora paşver û ya ku têkîliyên hilberînê yên paşverû hakim dike û pêşketina quwetên hilberînê asteng dike û dike hedef ku li ser gelan rejîmên xesp û talanê ava bike ye.

Zor, di aliyê qadên ku berê xwe didê de jî cudayê du beşan dibe: ya yekemîn, zora hundirîn ku ji bo çareserkirina nakokiya di navbera quwetên hilberînê û têkîliyên hilberînêde ye tê bikaranîn; ya din jî, zora derve ya li dijî eşîr, gel û neteweyan tê bikaranîne. Zora hundirîn, eger li ser esasê ku têkîliyên hilberînê yên li ber pêşketina quwetên hilberînê bûne asteng tine bike were bikaranîn, roleke şoreşgerî an jî pêşver û dilîze. Na, eger ji bo ku têkîliyên hilberînê yên li ber pêşketina quwetên hilberînê bûne asteng hebûna xwe bidomînin were bikaranîn, roleke dij-şoreşger û paşver û dilîze. Zora derve (biyanî) ya di destên çînên kedxwar de jî, pir kêm roleke pêşver û dilîze û bi piranî paşver û ye. Di demên ku şiklên civakan diguhere û vediguhere de, eger ji welatê ku lê şoreş çêbûye pêlên şoreşê biforin bi piranîbi roleke pêşverûra dibe. Lê eger wiha nebe û bike armanc da ku li ser eşîr, netewe, gelan zilm û zor û kedxwariya xwe çêbike, zorên derve (biyanî) yên bi vî şiklî paşver û ne. Lê belê zora ku gel, eşîr, netewe bi armanca ku ji zilm û zor û kedxwariya biyanî xwe xelas bikin bi kar tînin tîmî şoreşgerî û pêşver û ye. Zora derve (biyanî) ya paşver û gelê ku pêre rû bi rû dimîne an tine dike, an vediguherîne û an jî ew bi xwe li pêşberê wî gelî bi bin dikeve. Dema bi bin dikeve jî, an bi temamî ji aliyê wî gelî ve tê avêtin derve an di nava wî gelî de dihele, vediguhere û an jî bi temamî ji aliyê vî gelî ve tê tinekirin.

Eger li welatekî zora paşver û çiqas giran û rêxistin kirî be, neçar e zora şoreşgerî jî ewqas giran û rêxistin kirî be. Di dîrokê de hem û rêxistinbûnên ku xwe dispêrin darêzorê, tenê bi quweta rêxistinbûnên zorê yên din hatine hilweşandin. Di dîrokê de û di roja me ya îro de ti rêxistinbûnên zorê, bê sedem hema jixweber xwe tine nekirine. Di seransera dîrokê de di navbera zora paşver û û zora şoreşgerî de timî têkoşînek hatiye jiyîn. Ji bo ku têkoşîna di navbera van zoran de ji holê rabe, pêwîst e şert û mercên ku zora paşver û diafirînin û şert û mercên pevçûna di navbera van zoran de diafirînin ji holê rabin.

Kurdistan welatekî wiha ye ku li ser wê, di seranserê dîrokê de timî zora derve ya paşverûhatiye pêk anîn. Zora ku berê xwe daye Kurdistanê, timî roleke talanker û texrîpkar lîstiye. Zora ku li ser

Kurdistanê di seranserê dîroka çîndar de hakim bûye, hema bêje timî xwediyê karektereke biyanî bûye û heya asta dawî rêxistinkirî ye. Ev karektera zorê, bûye sedema esasî da ku li Kurdistanê quwetên hilberînê pêş nekevin û welat di nav feqîrtiyê de bijî. Îro jî, zora li Kurdistanê, xwediyê karektereke biyanî û paşver û ye; bi hem û quweta xwe û di her qada civakî de xwe bi rêxistin kiriye.

Vayê bi giştî li dinê, bi taybet jîev taybetmendiyên giştî yên zora ku li Kurdistanê di seranserê hem û dîroka civaka çîndar de (her du mijar jî di nivîsên heya niha de hatine vegotin) hatine dîtin, di mijara rê û rêbaza Şoreşa Kurdistanê û taktîka wê de riya me ronî dike.

Zora derve (biyanî) madem di vê astê de bi şiklekî giran xwe birêxistin kiriye û her roj, her seat, her deqîqa li ser gelê me tesîra xwe dide derve, wê demê divê zora şoreşgerî ya di berjewendiya gelê me de jî, her roj, her seat û her deqîqe li zora dijşoreşê bide. Em ê li beranberê zora ku di xizmeta dij şoreşê de ye û texrîpkar, talankar û bê maf e, zorek ku di xizmeta gelê me de ye û quweta afirîner a civakeke nû ye û mafdar e biafirînin! Zanistê, hê jî riyeke din a xwe gihandina dinêyeke nû, kifş nekiriye. Lê ji bilî revîzyonîst û reformîstan!. Îdîa dikin ku ew êriyeke nû, ku wê bi şiklê ‘pêşketina civakî ya aştiyane’ gav bi gav bi zora paşver û ya burjuwazî re li hev bikin û cîhaneke nû biafrînin. Dikarin îdîa bikin; lê cîhana ku ew ê biafirînin, cîhana burjuwazî ku ji mej de wexta xwe temam kirî ya ji rê derketîye. Dîsa, ew dibêjin; ‘bêyî ku em li dijî tekdestan şer bikin, bêyî ku li dijî mêtingeriyê têkoşîneke mirin û mayinê were dayîn, em dikarin parçe parçe–bi zêdekirina hejmara parlementer, wezaret, musteşar, mudurên giştî, general-îqtîdarê ji burjuwazî bistînin. Ew, dikarin bistînin; lê bi şerta ku ew êbi xwe jî bibin xizmetkar û bikevinbin xizmeta burjuwaziyê.

Zora ku Şoreşa Kurdistanê pêk bîne, bi cewhera taybetmendiyên zora dij-şoreşê ve girêdayî ye. Bêyî ku em tesbît bikin ku ka cewhera taybetmendiyên zora dij-şoreşê çi ye, ew ê kê bi kar bîne, wê bi çi şiklî were bikaranîn, wê destpêkê bike hedefa xwe; em nikarin rast jî tesbît bikin ku ka taybetmendiyên zora şoreşgerî çi ne, ew ê kîjan amûran bi kar bîne, hedefên wê yên destpêkê çi ne. Lê, qaîdeyeke giştî ya ku têkoşîna rizgariyê ya hem û gelên mêtingehan fêrî me kiriye heye, ew jî ev e: divê, gelek, bêyî ku li hindik an jî pirbûna şêniya xwe bifikire, eger ê şer bike, ji bo şerekî gel ê demdirêj xwe amade bike. Ev şer, wê di merhaleyên cur bi cur re derbas be û wî gelî bigihîne serkeftinê. Ev

rêgez û qaîde ji bo me jî rast e. Gelê Kurdistanê eger ji bo şer cesaret kiribe, divê bi misogerî ji bo şerekî gel ê demdirêj yê ku wê di merhaleyên cur bi cur re derbas be xwe amade bike.

Taktîka şoreşgerî, ji aliyê rêxistina ku hatiye avakirin û şert û mercên şênber (somut) ve tê diyarkirin. Şoreşa welatê me, şoreşeke demdirêj e û pêwîst e di merhaleyên cur bi cur re derbas bibe. Taktîk an jîmerhaleya destpêkê ya rê û rêbaza (metod-yöntem) ku xwe dispêre zora bi şiklê şerê gel a Şoreşa Kurdistanê, dikare çawa be? Taktîka şoreşgerî, li welatekî bi vî şiklî, ji şert û mercên somut, pratîka têkoşînê ya li welêt û tecrubeyên şoreşgerî yên gelên cîhanê derdikeve. Li welatekî ku şebekeyên ajantiyê û rêxistinên îstihbaratê li her qada civakê xwe bi rêxistin kirine, dikare di merhaleya destpêkê de taktîka şoreşgerî bi vî şiklî be: Li dijî derdorên ajan û rêxistinên îstihbaratê têkoşîneke mirin û mayinê meşandin û rêxistinek ku li gorî pêwîstiyên vê têkoşînêye pêşxistin. Şoreşa welatekî bi vî şiklî, eger bi salan bi vê rêxistin û taktîka têkoşînê neyê xwedîkirin û nebe pola nikare pêş bikeve.

Ev axaftin helbet ji bo şoreşgeran in. Naxwe, ne ji bo reformîstên burjuwayên biçûk û burjuwayên ku ji mêj ve xwe firotine. Hem û kul û derdê wan, ne serxwebûn û ji bo vê xwe birêxistinkirin û xwe ji bo têkoşînê xwe amadekirin e; ji mêtingerên ku xizmeta wan dikin çend hestûyên din qezenc kirine. Ji wan e ku şoreşger ew kesên 'macera perestên xeter' in ku hewl didin tiştên berwext bikin.

## V- Quwet û Îtifaqên Esasî Yên Şoreşa Kurdistanê:

Eger, tevgereke şoreşger nekarîbe mutefîk û quweta xwe ya esasî rast tesbît bike, ne mumkîn e ku ew tevger xwe bigihîne serkeftinê.

Dîroka Kurdistanê, ji ber ku quwetên esasî yên şoreşê nekariye baş were bikaranîn û nekariye mutefîkên şoreşê rast werin tesbîtkirin, bi binkeftinên ku gelê me tê de berdêlên giran dane ve tijî ye. Mînaka vê ya herîaşkere û divê jê ders were derxistin, binkeftina 1974'an a tevgera Başûrê Kurdistanê ye.

Divê, tevgereke şoreşger xwe bispêre kîjan quwet û hêza esasî, kîjan mutefîkan sereke bibîne, kîjanan di planê duyemîn de bi cih bike?

Şert û mercek ku tevgereke şoreşger xwe bigihîne serkeftinê jî, di bersîvên erênî yên ku werin dan van pirsan re derbas dibe.

Lêkolîneke hûr û kûr a li ser şert û mercên berbiçav (somut) ên Kurdistanê, quwetên esasî û mutefîkên sereke (birincil) yên şoreşê derdixîne meydanê. Ji ber ku di pêvajoya pêşketina mêtingeriya Tirk de tebaqaya feodal-komprador bi vê quwetê re ket têkîliyên ajantiyê, kapîtalîzm û burjuwaziya milî jî derfeta pêşketinê nedît û burjuwaziya biçûk a bajêr jî bi têkîliyên madî girêdayî tebeqaya komprador-feodal bû, weke quweta esasî tenê dimîne îtifaqa karker û gundiyan. Ji bo şoreşa Kurdistanê, îtifaqa karker û gundiyan îtifaqeke esasî ya girîng e û şert û merca jêneger e (vaz geçilmez) a serkeftina şoreşa demokratîk a milî ye.

Tesbîtkirina quweta esasîgirîng e; lê têrê nake. Quweta esasî ya şoreşê xwediyê mutefîkên din e jî. Divê, evrast werin tesbîtkirin. Ji bilî îtifaqa esasî, pirsgirêka îtifaqên sereke û talî ew e ku hejmara dostên şoreşê, heya ku dikarewerin zêdekirin û hejmara dijminên şoreşêjîheyaku dikare werin kêmkirin, dijminê xeter di hedefa yekemîn dewerin bicihkirin û yên din li gorî asta girîngiya wanwerin rêzkirin. Ji ber vê yekê, ji bo serkeftinê, îtifaqên sereke û talî jî girîng in.

Îtifaqên sereke yên Kurdistanê ji du xelekan pêk tên. Tebeqaya ciwan-rewşenbîran, xeleka destpêkê ye û bi taybet di merhaleya destpêkê ya şoreşê de bi roleke mezin radibe û ji bo pêşketin û serkeftina şoreşê mutefîkeke girîng û sediq e. Burjuwaziya biçûk a bajêr û quwetên din ên milî, xeleka duyemîn e û bi taybet di pêvajoyên ku şoreş pêş dikeve de tevlî têkoşînê dibin.

Îtifaqên talî yên Kurdistanê ji sê xelekan çêdibe. Xeleka destpêkê, îtifaqa bi tevgerên welatparêz ên li parçeyên din ên Kurdistanê re; xeleka duyemîn, îtifaqa bi tevgerên şoreşger ên welatên ku Kurdistan kirine metingeh re; xeleka seyemîn jî îtifaqa bi welatên sosyalîst, tevgerên rizgariya neteweyî û tevgera çîna karker ku li welatên kapîtalîst ên pêşketîye re û îtifaqa bi hem û mirovahiya pêşver û re dihewîne. Ev îtifaqên ku wê bi têkoşîneke bi sebir û bidîqet werin avakirin, wê Şoreşa Kurdistanê bigihîne asteke bi bin nakeve. Lê ji bo ku ev îtifaq bikaribin pratîze bibin û bikevin rojevê, şerta destpêkê ew e ku; divê tevgera rizgariyê bi teorî, program, rêxistin û taktîka xwe, xwe bide naskirin. Bi îtifaq û planên ku wê li ser masê werin çêkirin,

îtifaq pêk nayên. Di dîrokêde û di roja me ya îro de, îtifaqên herî biquwet, ên ku di nav şerê germ de tên pêşxistinin.

Tevgera Rizgariyê ya Kurdistanê, çawa ku wê karibe di nav şerê germ de, li gorî rêza girîngiyê bibîne ku ka kî mutefîkên wê ne; wêbibîne ku ka kî dijminên wê ne jî. Di vê mijarê de nuxteyeke divê neyê jibîrkirin jî ew e ku, timî dibe ku ji çînên hakim hin kes derkevin û bi tevgera şoreşger re dostaniyê bikin.

Tevgera Rizgariyê ya Kurdistanê, girêdayî bi pêkhateya (yapı) îtifaqa ku di nav de ye, alîgirê wê ye ku nakokiyên lihevçêkirî (suni) yên di nav gel de hene, bêyî ku serî li darê zorê bide û bi riya îqnayê hal bike. Pêwîst e, di vê mijarê de, mêyl û tevgerên sosyal-şoven ên ji neteweya hakim ku xizmeta jihevxistina gel û têkoşîna gel dikin û ya rast xizmetkariya mêtingeriyê û çîna feodal-komprador dikin, mêyl û tevgerên reformîst ên burjuwaya biçûk û teslîmkar, ên ji neteweya bindest ji hev werin derxistin.

Tevgera Rizgariyê ya Kurdistanê, pirsgirêka şoreşê ya li parçeyên din ên Kurdistanê, di rastiya xwe de wekî pirsgirêka gelê ku li wî parçeyî ye dibîne. Tevî vê- weke rêgezekê (ilke) qebûl dike ku gelê Kurdistanê û welatê wî yek parçe ye, yekîtiya gelê Kurd ji bilî îradeya gelê Kurd ji aliyê hêz û quwetên emperyalîst-mêtinger ve hatiye parçekirin û ev yêkîtî wê bi rê û rêbazên şoreşgerî li gorî îradeya gelê li wî parçeyê, ji nû ve were avakirin. Ev rêgez, ku baweriya me pêheye wê di encama têkoşîneke dûr û dirêj de pêk were, di slogana **Kurdistana Serbixwe, Yekgirtî û Demokratîk** de şiklê xwe yê ber bi çav (somut) distîne.

Tevgera Rizgariyê ya Kurdistanê, bi gel û quwetên şoreşger ên welatên ku her parçeyekî Kurdistanê kirine mêtingeh re têkîlî pêşxistinê pêwistiyeke xwezayîya polîtakaya îtifaqan dibîne. Rêgeza esasî ya di vê mijarê de, ji bo heqê serxwebûna welatan û azadiya gelan, qada rêxistinî jî di nav de, nêzîkatiyeke birêz û dostanî nîşandane. Bi şert û merca ku ji derve mudexaleya pirsgirêka şoreşê ya ku di eslê xwe de pirsgirêka gelê wî welatî ye û ji şert û mercên dîrokî yên welêt derketiye meydanê ye neke, yanî ‘şoreşêîxrac neke, yekîtiya rêxistinî parçe neke, bi têzên sosyal şoven amadekariya ku bikeve bin xizmeta burjuwaziya neteweya hakim neke, li ser esasê alîkariya dostanîûbi şiklekî aktîf alîkariya hev dayinê, ti mijarên ku bi gelên cîran û bi quwetên şoreşger ên vî gelî re nikaribe were çareserkirin tineye. Di

mijarên esasî de hemfikir bûn, wê bibe sedem ku yekîtiyên piştgiriyê yên pir bi quwet pêş bikevin. Her nêrîna ku di aliyê rêgezî (ilkesel) de parçeyekî Kurdistanê di nav sînorên welatê mêtinger de hiştinê qebûl dike –dixwaze beriya ji şoreşê dixwaze piştî şoreşê-, li pêşavakirina îtifaqên şoreşgerî asteng e. Wê yekîtiyeke bi çi şiklî çêbike, pirsgirêka gelê Kurdistanê bi xwe ye. Ne mumkun e ku ev rêgez bi ti ‘reçeteyên şoreşgerî’ ve werin guherîn. Ji bo Şoreşgerên Kurdistanê mane û wateya yekane ya vê rêgezê, li ser esasê ku welatê me serbixwe be û gelê me azad be û têkiliyên ku di her astê de û di her qadê de wekheviyê diparêzin, xwe tevlî karên navxweyî nakin û çavkaniya xwe ji alîkariya aktîf distînin pêşxistin e. Li gorî fikra me, şîroveya rast a yekane ya enternasyonalîzma proletaryayê jî vê helwestê ferz dike.

Di vê mijarê de hem ji aliyê ‘şoreşgerên’ neteweya hakim ve û hem jî ji aliyê‘şoreşgerên’ neteweya bindest ve tevî ku xwediyê cudahiyên biçûk inlê bi hev re heman tiştî diparêzin, li ser pirsgirêka neteweyî riyên çareseriyê yên wekî, ‘xweseriya herêmî’, ‘yekîtiya federal’, ‘xweseriya ziman û çandî’ tên pêşxistin. Ev riyên çareseriyê yên ku ji aliyê wan ve tên pêşxistin paşver û ne û dijberê têza ‘dewleta serbixwe’ne. Ku di roja me ya îro de şîroveya rast a yekane ya rêgeza (ilke) ku dibêje, ‘heqê her neteweyê heye ku qedera xwe diyar bike’ ev têz e. Têza dewleta serbixwe, di şert û mercên îro de têza rast a yekane ye û ji ber ku rast e jî têzeke şoreşgerî ye; têz û riyên din ên çareseriyê ji ber ku dest nadin sînorên dewletê, reformîst in û ji ber ku reformîst in jî paşver û ne.

Tevgera Rizgariyê ya Kurdistanê ku dike armanc di qadên siyasî, ekonomîk û yên din de welatekî serbixwe biafirîne, di serî de bi cîranan re di têkîliyên xwe yên bi gelên herêm û cîhanê re de berjewendiyên şoreşa proletaryaya cîhanê esas digire. Ev berjewendî hewceyî çi bin, helwesteke li gorî wê nîşan dide.

Tevgera Rizgariyê ya Kurdistanê, ji ber pêkhateya (yapı) îtifaqê ya xwezayî ku di nav de ye, alîgir e ku li gel welatên sosyalîst, li gel dewlet, hikumet, tevgerên rizgariyê û tevgerên çîna karker ên li welatên emperyalîst têkiliyên herî berfireh çêbike. Di vê mijarê de Tevgera Rizgariyê ya Kurdistanê timî vêrêgeza esasî li ber çav digire: bêyî têkoşînên serxwebûn, demokrasî û sosyalîzmê ku gelên cîhanê li dijî emperyalîzmê didin û bêyî ku piştgiriya van têkoşînan were stendin serkeftin çênabe.

Welatên sosyalîst wekî ku 'emperyalîst û faşîst' in îlan kirin, yek ji xirabiyên herî mezin ku li Tevgera Rizgariyê ya Kurdistanê were kirine. Em, Yekîtiya Sovyet û Çîn jî di nav de li gel hem û welatên sosyalîst, pêşxistina têkîliyên li gorî rêgezên enternasyonalîzma proleter, wekî erk û wezîfeyeke şoreşgerî dizanin. Divê, parçebûn û pevçûnên di nav Tevgera Komînîst a Cîhanê de, ji mijara hebûnê ya welatên sosyalîst cuda were girtin dest. Li dijî meylên revîzyonîstên modern û meylên revîzyonîstên super bûn, nayê maneya dijberê welatên sosyalîst bûnê. Divê, di derbara welatên sosyalîst de, serasera, li her derê û çep û rast neyê axifîn; seknek di cih de û bi pîvan were nîşandan. Ev sekn, li ber têkoşîna me ya li dijî revîzyonîzmê astengî çênake; berevajî, me ber bi feraseteke têkoşînê ya hê manîdar û encamgir (sonuç alıcı) ve dibe.

Tevgerên rizgariya neteweyî û çîna karkeran ku li dijî emperyalîzmê têkoşînê didin, mutefîkên me yên xwezayî ne. Divê em hewl bidin ku ji hem û tecrubeyên wan ên têkoşînê sûd wergirin û bi van tevgeran re di astên cur bi cur de heya asta dawiyê têkîlî pêş bixin. Ev Tevgerên rizgariya neteweyî û çîna karkeran, bi taybet ji bo ku propagandaya têkoşîna me, ku ev têkoşîna me mafdar e û ji bo mafê neteweyî tê pêşxistin lê hê bi gelên cîhanê nehatiye danasîn, were kirin alîkariyên herî xurt in. Eger di aliyê propagandayê de ev alîkarî were girtin, ev tê maneya ku piştgiriya gelên cîhanê wergirtin zêde hêsan bûye.

Tevgera Rizgariya Kurdistanê, îro, ji ber ku di aliyê teorî û programê de nebûye dengekî biquwet, bi gelek hêz û quwetên ku amade ne alîkariya gelê Kurdistanê bidin re nikare têkîlî were danîn. Rêxistinên paşver û yên ku doza mafdar (haklı) a gelê Kurdîstan tîsmar dikin û ji bo berjewendiya xwe ya eşîrî û feodal, difiroşîn emperyalîstan, bûne sedem ku gelên cîhanê ji bo têkoşîna me di nêrînên xwe yên erênî de bikevin gumanê; vê jî, di asteke bilind de ji tecrîdbûna gelê me re rê vekiriye.

Baweriya me pê heye ku eger Tevgera Rizgariya Kurdistanê bi teoriya xwe ya şoreşgerî, program û rêxistinbûna xwe, xwe ji nû ve bi gelên cîhanê bide naskirin, wê bi misogerî (mutlaka) ji wan piştgiriya herî mezin wergire.

## Vl-Cihê Şoreşa Kurdistanê Di Şoreşa Rojhilata Navîn û Cîhanê De:

Girîngî û cihê şoreşa Kurdistanê di şoreşa Rojhilata Navîn û cîhanê de, bi cih û girîngiya Kurdistan û Rojhilata Navîn ku di nav sîstema emperyalîst de ye re zêde zêde girê dayî ye.

Xarîteya (nexşe) siyasî ya Rojhilata Navîn, li gorî berjewendiyên emperyalîzm, mêtingerî û feodalîzmê hatiye çêkirin û li dijî xwestekên gelan ên wekî rizgariya neteweyî, demokrasî û yekîtiyê ye, pêre li hev nake. Kemalîstên ku di demên borî de bi emperyalîstên Îngilîz û Fransî ve li hev kirine û têkîlî pêş xistine, ev xarîteya siyasî ku ji aliyê monarşiyên Îran û Ereb ve hatiye çêkirin, di rastiyê de armanc û hedefa wan ew e ku gelên Rojhilata Navîn parçe bikin û ji bo zilm û zora neteweyî yên wekî dagirî, talan û mêtingeriyê amade bikin û ji quwetê bixin, herwiha dozên wan ên rizgariya neteweyî, demokrasî û yekîtiyê bi zehmet bixin û asteng bikin; îro jî DYE ku serkêşiya sîstema emperyalîst dike –tê xwestin ku li Rojhilata Navîn bi şiklekî hêsan rejîmeke emperyalîst, siyonîst, kemalîst û zilm û zora monarşîst û rejîmeke kedxweriyê were domandin -hewl dide ku, vê, li dijî têkoşînên rizgariyê, demokrasî û yekîtî û her ku diçê li dijî têkoşînên sosyalîzmê wekî kozeke mezin bi kar bîne.

Eger Siyonîzm, Kemalîzm, monarşîzm û mezhebgeriya kevnare nebe, zehmet e emperyalîzm li Rojhilata Navîn xwe ragire. Emperyalîzm nîviya quweta xwe ji van pêkhateyên (yapı) îdeolojîk û polîtîk ku di navbera gelan de dibin sedema zilm û zora neteweyî, dagirî, qetlîam û nakokiyên çêkirî (sunî), digire. Têkoşîna li dijî emperyalîzmê li Rojhilata Navîn bi şiklekî hêdî hêdî, giran û bijan pêş dikeve. Sedema sereke (başlıca) ya wê jî, ev hêzên îdeolojîk-polîtîk ku mêtinger û paşverû, şovenîst, dagirker in û ji bo emparyalîzmê bi rola 'Hespê Truwa' radibin. Emperyalîzm, bi van hêzan li Rojhilata Navîn ji bo gelan sêdarê çêdike û benê sêdarêdixe sukra gelan.

Kurdistan, di nav vê rewşa tevlîhev û paşver û ya Rojhilata Navîn de li cihekî pir girîng bi cih bûye. Rol û girîngiya şoreşa Kurdistanê di Rojhilata Navîn de jî, çavkaniya xwe ji vir digire. Kurdistan, hema bêje ‘Gordion’a Rojhilata Navîn e. Eger girêka‘Gordion’ê were vekirin, ya mayî jî wê hêsan be. Kurdistan, ji ber ku welatekî bûye çar parçe ye û li her parçeyî çewisandina neteweyî bi şiklekî herî giran tê pêkanîn û hewl tê dayin ku feodalîzm bi darê zorê were jiyîn e; li Rojhilata Navîn bûye çavkaniya paşverûtiyê. Sedemek ku têkoşîna şoreşê, li welatên cîran nikare bi hêsanî pêş bikeve jî, bi taybet ev rewşa li Kurdistanê ye. Eger, ji bo ku ev rewş bi şoreşêwere guherîn hewl were dayin, aşkere ye ku wê têkoşîna gelên cîran derkeve asta herî bilind.

Eger çavkaniya paşverûtiyê neyê zuha kirin, jênerev (kaçınılmaz) e ku herêmên cîran ên ku ji vê çavkaniyê xwe bi xwedî dikin bibin paşverû. Paşverûtî ku çavkaniya xwe ji mêtingeriya li ser Kurdistanê digire, bi şovenîzm û sosyal şovenîzmê têkoşîna gelên cîran jahrî dike, hewl dide bi darê zorê feodalîzmê li ser lingan bigire û bi fikrên burjuwaziya biçûk a reformîst û teslîmkariyê, têkoşîna gelê Kurdistanê jahrî dike. Şikênandina zincîrên mêtingeriyê, ji bo vê qet nebe pêşxistina têkoşînekê, di serî de ji bo gelê Kurdistanê, wê bibe sedem ku têkoşîna gelên cîran jî pêngaveke mezin biavêje. Divê, çavkaniya paşverûtiyê were zuha kirin. Çavkanî, mêtingehbûna Kurdistanê ye. Heya ku ev nebe hedef, zehmet e ku li Rojhilata Navîn, herî kêm li welatên ku cîranên Kurdistanên ne, bi pêşengiya proletaryayê tevgerên rizgariyê yên gel werin pêşxistin. Bi rastî, niha ev zehmetî tê jiyîn jî Kurdistan ji Rojhilata Navîn parçeyek e. Cihê stratejîk ê van her duyan jî girêdayî bi hev re ye. Ev taybetmendî derfetê didin ku, em cih û girîngiya şoreşa Kurdistanê di nav şoreşa cîhanê de fêm bikin.

Em dikarin, di nav şoreşa cîhanê de cih û girîngiya şoreşa Kurdistanê bişibînin cih û girîngiya şoreşa Vîetnamê di Hinda Çînê de. Çawa ku Şoreşa Vîetnamê bi pêşengiya proletaryayê di şoreşên Hinda Çînê de rola miftebûnê lîstiye, wê şoreşa Kurdistanê jî di şert û mercên cuda yên wext û cihên cuda de, ji bo şoreşên gel ên Rojhilata Navîn wê bi rola miftebûnê rabe. Dîsa çawa ku Şoreşa Vîetnamê ji bo ku emperyalîzm ji Hinda Çînê were avêtin û emperyalîzm di asta cîhanê de were paşxistin bi roleke di girîngiya dîrokî de û mezin rabûyîbe, Şoreşa Kurdistanê jî wê ji bo ku emperyalîzm ji Rojhilata Navîn were

avêtin rola sereke (baş) bilîze û ji bo ku di asta cîhanî de were paşxistin bi roleke mezin û dîrokî rabe.

Du faktor hene ku cih û girîngiya şoreşa Kurdistanê di nav şoreşa cîhanê de diyar kirine: ya yekemîn, şoreşa Kurdistanê wekî berhemekê di mercên ku mêylên revîzyonîst ên modern, tevgera komînîst a cîhanê di asteke girîng de texrîb kiriye û yekîtiya wê parçe kiriye de derketiye meydanê; ya duyemîn, Şoreşa Kurdistanê, di nuxteya kilît a herêma Rojhilata Navîn de cih digire ku hêzên sosyalîst û hêzên emperyalîst jî, ji bo têkoşîna mezin a ku li dijî hev dimeşînin bixin berjewendiya xwe, li vê herêmê dest bi amadekariyekê kirine.

Îro, Tevgera Komînîst a Cîhanê derbeyeke mezin xwariye û di asteke mezin de yekîtiya wê parçe bûye. Li milekî ve ji aliyê teoriyên ‘pêşveçûna civakî’ve û li milê din, ji aliyê teoriyên ‘du dewletên super’ û ‘cîhana seyemîn’ ku wekî li dijî van teoriyan pêş dikevin xuya dikin, lê di rastiya xwe de bi van re digihîjin hev, li dijî têzên esasî ku mijarên herî girîng ên analîzên li ser dewlet, şoreş, dîktatoryaya proletaryayê, di nav aştiyê de li gel hev jiyîn, di riya ku ne kapîtalîst e re derbasbûna sosyalîzmê û şer û emperyalîzmêne şerek hatiye destpêkirin. Hewl tê dan ku ev şer bi hem û giraniya xwe were meşandin. Wexta ku serasera lê tê mêzekirin, welê xuya dibe ku ti dibêjî qey ev teorî û meylên ku xwe disperin vê teoriyê, bi hev re şer dikin. Lê ya rast ew e ku, her du alî jî li dijî Marksîzm-Lenînîzmê şer dikin. Tevî ev panzdeh sal in ku li dijî hev şer dikin ji bo ku gelên cîhanê rizgar bin ti rêxistin û tevgerên ku xwe dispêrin van her du meylên revizyonîst, mînakeke herî biçûk ê serkeftî jî nedaye. Ya dikin, nirxên şoreşger ê gelan li dijî hevbikaranîn û berhewa (çarçur) kirin e.

Tevgera Şoreşger a Proletar a Kurdistanê ku hê pir ciwan e, ji vê rewşê pir zerer ditiye. Lê belê tevî vê, eger têkoşîna ku li dijî her du meylên revîzyonîst dimeşîne, bi şiklê kudi nav têkoşîna li dijî mêtingeriyê de rêxistineke proletaryayê ya bihêz û ji pola ava bike bi encam bike, wê proletarya û gelên dinê feydeyeke mezin ji vêbigirin. Îxtimal heye ku şoreşgerên proletar ên Kurdistanê wezîfeyeke dîrokî pêk bînin. Ev her du meylên revîzyonîst jî, welatên sosyalîst wekî ku emperyalîst û faşîst bin bi gelê Kurdistanê didin naskirin û wekî ku bi hev re di pêşbirkê de bin xizmeta emperyalîzmê dikin, herwiha wekî ku ji webayê birevin ji têkoşîna şoreşger direvin. Ji ber vê yekê, li dijî van meylan têkoşîn dan meşandin û karê van temam kirin ji bo şoreşgerên

proletar ên Kurdistanê ne zêde karekî zehmet e. Ji bo karekî bi vî şiklî, Kurdistan, cihekî pir destdayî ye. Li welatên ku ji bo şoreşê şert û merc heya asta dawiyê nehatine asteke destdayî, bihêsanî revîzyonîzm nayê bi bin xistin. Lê welatekî wekî Kurdistanê ku ti ferq û cudahiya jiyîna ji derveyê şoreşê ji jiyana heywanan tineye, revîzyonîzm nikare ti sozan bide. Eger bide jî, dikare bi hêsanî bêmanebûna van sozan were fêm kirin.

Kîjan welat dibe bila bibe, li welatekî ku rûyê derewîn ê her şiklê neteweperestiya burjuwaziya biçûk derketiye meydanê, û van hêz û quwetanji mêj ve amadekariya xwe kirine ku di pêşberê pariyekî herî biçûk de xwe bifiroşin, wezîfeya pîroz a şoreşgerên proleter ên Kurdistanê ew e ku; li aliyekî li dijî revîzyonîzmê, li aliyê din li dijî cewiyê/a revîzyonîzmê û neteweperestiya burjuwa û burjuwaziya biçûk ku bi revîzyonîzmê re heman maskeyê bi kar tîne, ala proleteryayê bilind bike.

Eger, şoreşgerên proleter ên Kurdistanê, li gel serxwebûna welatê xwe, van wezîfeyên xwe pêk bînin, bi rêxistineke komînîst ku ser keftiye pêşkeşê proletar û gelên cîhanê kirinê, wê were hesibandin ku wezîfeya xwe ya dîrokîbi cih anîne û helbet wêji vê serbilind bibin.

Şoreşa Kurdistanê ya ku parçeyek ji şoreşa proletaryaya cîhanê ye, bi Şoreşa Cotmehê dest pê kiriye û bi tevgerên rizgariyê yên neteweyî jî her ku diçe xurt dibe. Tevî ku emperyalîzm şer sor dike, têkoşînên gelên cîhanêyên rizgariya neteweyî, demokrasî û sosyalîzmê, -ne ku qetîxtîmala derketina wê nîne jî-derketina şerekî cîhanî bi zehmet xistiye. Ji ber vê yekê, piştî 1945’an şoreşên welatên cur bi cur ne di navan jî dawiyê pêvejoyeke wiha de, di pêvajoyek ku şerên wiha tinene de tên lidarxistin. Raseriya (üstünlük) misoger a ku gelên cîhanê li dijî emperyalîzmê bi dest xistine, di roja me ya îro de, lidarxistina şoreşan li yek welatî mumkun dike.

Ev faktor (zehmetiya derxistina şerekî nû yê cîhanê û biquwetbûna derfetên lidarxistina şoreşê li yek welatekî tenê) dibin sedem ku, emperyalîst, mewziyên di destên xwe de xurt bikin, nokerên xwe bi kar bînin û têkoşînên gelên cîhanê tasfiye bikin. Emperyalîstan, li Asya û Afrîkayê pir quwet wenda kirine. Emperyalîstên ku nikarin bêyî çavkaniyên petrola zengîn a Rojhilata Navîn sîstema xwe berdewam bikin, ji ber cih û nirxawê ya stratejîk-coxrafîk û siyasîku xwediyê potansiyeleke girîng e giraniya xwe didin ser Rojhilata Navîn û bi hem

û quweta xwe hewl didin da ku xwe li vê herêmê ragirin. Weke ku me di destpêka vê beşê de jî diyar kiribû, hêzên îdeolojîk-polîtîk ên paşverû ku pê re li hev dike û nokerên wê ne bi kar tîne û hewl dide ku têkoşîna gelên Rojhilata Navîn ji quwetê bixe, ji rê derxe û tasfiye bike.

Rola girîng a duyemîn a Şoreşa Kurdistanê, di vê nuxteyê de xwe dide der. Kurdistan, xeleka herî zeîf a zîncîra emperyalîst a li Rojhilata Navîn e ku tê xwestin were xurtkirin. Kûrkirina têkoşîna şoreşgerî li vê xelekê, wê bibe sedem ku xelek qut bibe. Wê li pey vê, têkoşînên şoreşgerî yên gelên Rojhilata Navîn pêş bikevin û bigihîn serkeftinê. Sîstemeke emperyalîst ku ji Rojhilata Navîn hatiye qewitandin, pêvajoya ku ew sîstem bi çend derbeyên dawî di gelaşdanka (çöplük) dîrokê de were binaxkirin wê hê kurtir bibe.

Ev her du nuxte, yanî li aliyekî tevgereke proletaryayê ku di têkoşîna li dijî revîzyonîzma modern û azadiya welêt de serkeftin bi destxistiye û li aliyê din tevgereke rizgariya neteweyî ku emperyalîzm hilweşandina xwe ya dawî dijî de di xeleka sîstemê ya herî zeîf de derbe lêdaye, girîngî û desteka di asta cîhanê de ya şoreşa Kurdistanê nîşan dide.

Wekî encama hem û ev tiştên hatine vegotin; enternasyonalîzma proletaryayê li gorî me, bi têkoşîna "milî" û rizgariya civakî ku tenê li yek welatê tên mêşandin re nakok nakeve. Berevajî, tenê dikare li gorî şert û mercên wan welatan şikil bigire û bimeşe. Ji ber ku tenê yek şîroveya rast a enternasyonalîzma proletaryayê heye. Ev jî ew e ku, şexsek ji bo şoreşa li welatê xwe têkoşîn bike û li cîhanê jî di aliyê madî û manewî de tenê alîkarî bide wê riya rast a şoreşgerî.